**T.C.**
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Cihan KAYNAR**

# MIJABAD, LABÎRENTA CINAN VE GERÎNEKA GUERNÎCAYÊ ÖRNEKLERİYLE KÜRTÇE (KURMANCÎ) ROMANINDA MEKÂN ALGISI

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ-2020**

**T.C.**
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Cihan KAYNAR**

# MIJABAD, LABÎRENTA CINAN VE GERÎNEKA GUERNÎCAYÊ ÖRNEKLERİYLE KÜRTÇE (KURMANCÎ) ROMANINDA MEKÂN ALGISI

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**TEZ YÖNETİCİSİ**
**Doç. Dr. Ayhan TEK**

**MUŞ-2020**

**K.T.**
**ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN**
**ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ**
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Cihan KAYNAR**

# HÊMANA MEKANÊ DI ROMANA KURDÎ (KURMANCÎ) DE: MÎNAKÊN MIJABAD, LABÎRENTA CINAN Û GERÎNEKA GUERNÎCAYÊ

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**
**Doç. Dr. Ayhan TEK**

**MÛŞ-2020**

## SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "*Mijabad*, *Labîrenta Cinan* Ve *Gerîneka Guernicayê* Örnekleriyle Kürtçe (Kurmancî) Romanında Mekân Algısı" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kâğıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

☑ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

☐ Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

☐ Tezimin …… yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

**25.09.2020**

**Cihan KAYNAR**

**NAVEROK**

**NAVEROK** ........ **I**

**ÖZET** ........ **III**

**KURTE** ........ **V**

**ABSTRACT** ........ **VII**

**DESTPÊK** ........ **1**

**BEŞA YEKEMÎN**

**AGAHIYÊN GELEMPER DI DERHEQÊ TÊGEHA MEKANÎ DE**

**1.1. MEKAN ÇI YE?** ........ 5

1.1.1. Dîroka Mekanî ........ 10

1.1.2. Li Ser Têgeha Mekanî ........ 13

1.1.3. Mekan û Beden ........ 16

1.1.4. Mekan û Sînor ........ 18

1.1.5. Yek ji Têgehên Mekanî: Mal ........ 20

1.1.6. Mekan û Hiş ........ 22

1.1.7. Mekan û Hêz ........ 24

1.1.8. Mekan û Nasname ........ 25

**BEŞA DUYEMÎN**

**DI ROMANÊ DE MEKAN**

**2.1. MEKAN Û ROMAN** ........ 27

2.1.1. Di Romanên Kurdî de Mekan ........ 31

2.1.2. Di Romanan de Mekanên Girtî û Vekirî ........ 36

2.1.3. Di Romanan de Mekanên Razber ........ 37

2.1.4. Di Romanan de Teswîrên Mekanî ........ 38

**BEŞA SÊYEMÎN**

**DI SÊ ROMANÊN KURDÎ DE MEKAN**

**3.1. MIJABAD** ........ 43

**3.2. LABÎRENTA CINAN** ........ 61

**3.3. GERÎNEKA GUERNICAYÊ** ........ 70

**ENCAM** ........ **88**

**ÇAVKANÎ** ........ **91**

**ÖZGEÇMİŞ** ........ **96**

**KURTEJIYAN** .......................................................................................................... **97**

## ÖZET

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MIJABAD, LABÎRENTA CINAN VE GERÎNEKA GUERNICAYÊ ÖRNEKLERİYLE KÜRTÇE (KURMANCÎ) ROMANINDA MEKÂN ALGISI**

**Cihan KAYNAR**

**Tez Danışmanı: Doç. Dr. Ayhan TEK**

**2020, 105 sayfa**

İnsanın mekânla olan ilişkisi insanlık tarihi kadar eskidir. İnsan, bedeni mekana bağlı olan bir varlıktır, bir başka deyişle beden ancak mekan içinde varolabilir. Mekan farklı yer ve zamanlarda farklı anlamlara gelmektedir. İnsan mekanı farklı şekillerde kullanmaktadır; yerleşmek için (ev), gereksinimlerini karşılamak ve geçimini sağlamak için. Bununla beraber mekân insan için bir yaşam alanıdır. Böylelikle mekan sadece inşa etmek veya kurgulamaktan ve öte kullanıcının onu kullanması, yani mekanda yaşaması mekanın asıl anlamını ifade eder.

Tarihsel süreç içerisinde sürekli değişen insan ve mekan ilişkilerinin yansımaları sanat dalları ve edebiyat üzerinde de etkili olmuştur. Mekan ve insan ilişkilerinin büyük bir öneme sahip olduğu edebiyat türlerinden biri romandır. Mekan, romanın asli unsurlarından biri olarak karşımıza çıkmaktadır. Romanda mekan unusuru insan ilişkileri sayesinde anlam kazanır. Mekan, kahramanlar ve olaylar üzerinde etkili bir unsurdur. Mekanın yorumlanması üzerinden kahramanlar hakkında psikolojik, sosyal, ekonomik durum vb. konularda çıkarımlar yapılabilir. Öte yandan mekan incelemesi roman kahramanlarından öte romanın ait olduğu toplum hakkında da bize bilgiler sunmaktadır. Bu çalışmada üç Kürtçe romanı mekan unsuru açısından inceleyeceğiz. Kürtçe romanlarda mekan öğesinin tüm olay zincirinin temelinde olduğunu ve diğer öğelerden daha belirgin bir konuma sahip olduğunu düşündüğümüz için yapmaktayız. Başka bir deyişle Kürtçe romanda mekan diğer bütün unsurları kapsamaktadır. Bu çalışmada Hesenê Metê'nin *Labîrenta Cinan*, Yıldız Çakar'ın *Gerîneka Guernîcayê* ve Jan Dost'un *Mijabad* adlı romanlarında mekan unsurunun nasıl kullanıldığını, karakterlerler olan ilgisini ve olay örgüsündeki yerini inceleyeceğiz.

**Anahtar Kelimeler:** Mekan, Yer, Roman, Kahraman, Olay Örgüsü, Kürtçe Roman.

# KURTE

## TEZA MASTIRÊ

## HÊMANA MEKANÊ DI ROMANA KURDÎ (KURMANCÎ) DE: MÎNAKÊN MIJABAD, LABÎRENTA CINAN û GERÎNEKA GUERNICAYÊ

**Cihan KAYNAR**

**Şêwirmend: Doç. Dr. Ayhan TEK**

**2020, 105 Rûpel**

Têkiliya mirov a bi mekanê re bi qasî dîroka mirovahiyê kevn e. Bedena mirov hebûnek girêdayî mekanê ye bi gotinek din beden encax di nav mekanî de xwedî hebûnê ye. Mekan di dem û cihên cuda de ji bo mirovan xwedî wateyên cuda ye. Mirov, mekanî bi awayên cuda bikar tîne; ji bo bicihbûnê (mal), pêkanîna pêdiviyan û ji bo aboriyê. Herwiha mekan ji bikaranîn û istifadekirinan jî wêdetir ji bo mirov qada jiyînê ye. Ji ser vê yekê ve em dikarin bibêjin ku hebûna mekanî tenê bi çêkirin, sêwirandin û înşa kirinê pêk nayê; bi wateya eslî bi saya bikaranîna bikarhêner yanê bi jiyînê mimkun e.

Têkiliya mirov û mekanî ya ku di nav çerxa dîrokî de her tim guheriye, li ser şaxên huner û edebiyatê jî bandor kir. Yek ji van şaxên edebiyatê jî roman e. Mekan di romanê de wek hêmaneke bingehîn dertê ber me. Di romanê de ji bo vegotina bûyer an jî rewşên ku mirov di navendê de ye tê bikaranîn û bi têkiliya mirov re watedar dibe. Awayê bikaranîn û erka mekanî dikare derbarê hêmanên din yê romanê de agahiyan bide me. Mekan, carna wek vebêjerê romanê carna jî wek sînorê derûnî û fîzîkî a lehengan dertê pêş. Di romanan de dema ku mekan tê teswîrkirin bi awayê mecazî leheng jî tê teswîrkirin. Lewra mekan û leheng bi hev ve girêdayî ne.

Mekan li ser lehengan û bûyerên romanê xwedî bandor e. Ji ser mekanî ve em dikarin li ser lehengan ji aliyên wek derûnî, civakî, aborî û takekesî ve analîzan bikin. Di vê xebatê de em dê li ser sê romanên Kurdî rawestin. Em dê van her sê romanan ji aliyê bikaranîna hêmana mekanî ve binirxînin. Li gor me di romanên Kurdî de hêmana mekanî ji hêmanên din bêtir dertê pêş. Bi gotineke din mekan di romanên Kurdî de hêmanên din dipêçe. Ji bo nîşandayîna vê yekê em dê her sê romanan ji aliyê têkiliyên mekanî û bikaranîna wî ve binirxînin.

Em dê di vê xebatê de van her sê romanan; *Labîrenta Cinan* (Hesenê Metê), *Gerîneka Guernîcayê* (Yıldız Çakar) û *Mijabad* (Jan Dost) ji aliyê hêmana mekanî ve binirxînin.

**Peyvên Sereke:** Mekan, Cih, Roman, Leheng, Bûyer, Romana Kurdî.

# ABSTRACT

**MASTER'S THESIS**

**THE CONCEPT OF SPACE IN KURDISH (KURMANJI) NOVELS: MIJABAD, LABÎRENTA CINAN AND GERÎNEKA GUERNICAYÊ**

**Cihan KAYNAR**

**Advisor: Assoc. Prof. Ayhan TEK**

**2020, Page: 105**

The connection between humans and space (place) is as ancient as the history of humanity. A human being's body is an entity connected to space, in other words, the body does only exist within the space. People make use of the space for various purposes: to settle in ( housing), to fulfill their needs and for the economy. Similarly, the space, for human beings, is a habitat other than just being an entity to be utilized. In this regard, we can say that space can exist not only through making, building, and imagining the space but in its original sense, it also exists through the utilization of the space by a utilizer, which means to live or to experience the space.

The relationship between humans and space, which has always been subject to change throughout history, has had an impact on the branches of art and literature. One of the branches of the literature is novel. Space is a prominent component in the novel. Space exists in novel to narrate the events and/or situations in the center of which human characters take part, and the space becomes meaningful with human involvement. In the novel, the role of the space and the way it is utilized can give us information about the other components within the novel. Sometimes, space steps forth as the narrator of the novel and sometimes as the psychological and physical borders of the characters. In the novel, if space is depicted, the characters are as well figuratively depicted because space and character are connected.

Space has an impact on the characters and plot of the novel. Through space, we can make psychological, social, economic, and personality analyses on the characters. In this study, we will focus on the three novels of Kurdish Literature. We will assess the three novels in terms of spatiality. According to me, in Kurdish novels, space as a concept covers larger area than the others. In other words, space accommodates all other

components of the novel. In order to indicate this, we will assess the three novels focusing on their spatial relationship and the way it is handled.

In this study, we will assess the following three novels: *Labîrenta Cinan* by Hesenê Metê, *Gerîneka Guernîcayê* by Yıldız Çakar and *Mijabad* by Jan Dost.

**Key Words:** Space, Place, Novel, Characters, Plot, Kurdish Novel.

## DESTPÊK

Mekan wek têgeh xwedî wateyek berfireh e lewra hemû tecrubeyên me yê jiyanê li ser mekanê pêk tê. Em mekanê wek hêmaneke fizîkî û bi gelemperî wek sînorên diyar dikarin binirxînin. Mirov şahid e ku sînorê her tiştî diguhere, her tişt ji qalibê xwe dertê û her tişt dikeve nav qalibekî. Her roj rewşa hewayê diguhere tişt ji cihekî diçin cihekê din, cihî her tiştî diguherê û her tişt wek xwe dimîne. Ev hevokên ku ji pênaseya mekanî dûr in ne bi wê wateyê ye ku em nikarin mekanî terîf bikin, wek gelek têgehan em dikarin terîfa mekanî bikin lê li gor me mekan têgehek şilû/mubhem e. Em di wê qenaetê de ne ku em li ser mekanî çiqas pênaseyên nêzê teqezê bikin em ê ewqas ji fehmkirina wî dûr bikevin.

Hebûn li ser mekanî pêk tê. Mirov dikarin li ser mekanî bifikirin û hebûna xwe jî li ser mekanî tecrube bikin. Mekan ji ber vê xwedî wateyek ontolojîk e. Mirov dema ku hebûna xwe difikire an jî li ser hebûna xwe pirsan dike gelek caran pirsên bi mekanî re têkildar dike wek; “ez li vir, li vê dinyayê, li vê cihî, li kaînatê û hwd. çi dikim?” dipirse. Ev û pirsên wek van derheqê mekan û hebûnê de elbet nêzikahiyek datîne ber me û me sewqê fikirîna li ser mekanî dike. Li gor zanînên me yên îro diyar e ku dinya/feza/gerdûn ji berê heta niha wek niha nebûye û ihtimal e dê di pêşerojê de jî wek îro nebe.

Mekan, ji berê heta bi awayê xwezayî wek ku parzemîn ji hev dûr dikevin an nêzikê hev dibin an jî wek deverên ku di demên kevnar de av bûye û îro çiya ne di nav guherînê de ye. Em dikarin bibêjin ku mirov û candarên din jî ji ber ku di nav mekanî de ne elbet pê re têkilî datînin û ev yek jî dibe sedemê guherîna mekanî. Guherîna mirovan dibe ku bi xwe re guherîna mekanî jî bîne yan jî bereksê vê guherîna mekanî jî dikare ê mirovan ji aliyê civakî ve biguherîne. Em dikarin vê ji bo ajalan jî bêjin dema ku ajalek ji cihê xwe yê sabit yan jî derdora hînbûyî û tecrubekirî dûr bikeve ew ji bo wî dibe ku nîşaneya xetereyan yan jî derfetên baştir be. Mekan elbet têgeheke wusa ye ku tenê bi van mînakan nayê fehmkirin. Lê hindik be jî ji bo fehmkirina vê qadê dibe ku çirûskek be.

Di qada xebatên mekanî de hinek pirs hene ku ji bo fehmkirina wî girîng in. Mekan di nav pêvajoya dîroka hebûnê de çawa bi têgehên wek hêz, hikûmdarî, aîdiyet, nasname, netew, hebûn, tunebûn, temsîl, aborî, polîtîka û civakê re hat îfadekirin; yan jî

ev têgehên rêzkirî çawa tev –li gor me- rasterast bi mekanî re têkildar bûn. Zelalkirina têkiliya mekanî a bi van têgehan re ji bo watedayîna mekanî dikare alîkariya me bike. Mekan ji ber ku her tim di nav guherînê de ye wek qadek tevlêhev dertê ber me. Eger tişteke sabît bûya dê têrîfkirin û fehmkirina wî hêsantir bûya; lê belkî jî ya herî zehmet ew e ku dualî ye, yanê hem sabît e hem diguhere. "Mirovî ji berê ve di nav mekanî de hebûna xwe ne tenê bi hereketkirinê pêk aniye li gel vê ji bo xwe mekanên ku bikare xwe têde îfade bike herwiha jê re nûnertiyê bike jî çêkiriye (Uçar, 2005: 20)." Hemû tecrubeyên jiyana me a rojane, kar û barên me, xeyalên me paşeroj û pêşeroja me, têkçûyîn û serkeftinên me bi kurtasî her tiştê me li ser mekanî pêk tên. Herwiha ne tenê ji bo mirovan ji bo her cure zindî û nezindiyan jî mekan heye, heta em li heman mekanê ne. Fehmkirin û tehlîlkirina qadeke evqas berfireh bêguman dijwar e.

Mekan bi gelek têgehên din yê jiyana me re têkildar e wek siyaset, polîtîka, felsefe, aborî, zanist, civak, edebiyat, dîrok û erdnîgarî. Mekan di binbeşên van qadan de jî xwedî gelek wateyên din e. Mînak, ji bo zanista felsefeyê mekan çi îfade dike; ligel vê mekan ji bo felsefeya hebûnê çi îfade dike, fîlozofan mekan çawa nirxandine yan jî ji bo ekola naturalîzmê û binbeşek din ya felsefê mekan tê çi wateyê? Li aliyê din mekan û bikaranîna wî di qada civaknasiyê de jî girîng e. Ji bo tehlîlkirina rewşa çandî, civakî û aboriyê pêşî lazim e ku mekan bê fehmkirin. Civak ji aliyê mekanên gundewar û bajarî ve wek du beş e. Ev herdu beş ji aliyê çînî, çandî, perwerdehî û aboriyê ve xwedî cudatiyan in.

Di edebiyatê de û bi taybetî jî di romanê de mekan xwedî wateyên berfireh e û qadeke girîng digire. Lewra edebiyat jî bingeha xwe ji jiyana tecrubekirî yanê ji jiyana ku bi mekanî ve girêdayîye digire. Herwiha nivîskar jî li mekanekî diyar dijî û hem tesîr dike li ser mekanî hem jî jê tesîr digire; bi vê awayê di honandina berhemên edebî de mekan wek hêmaneke bingehîn dertê ber me.

Em dê di vê xebatê de lêbikolin ku di romanên Kurdî yên mînak de mekan çawa hatiye bikaranîn. Ji ber ku nemimkun e em li ser hemû romanan bisekinin -lewra di her berhemê de mekan bi awayên cuda hatine bikaranîn- em dê di romanên diyarkirî de li ser hêmana mekanî bisekinin. Em dê li ser romanên bi navê *Gerîneka Guernicayê, Labîrenta Cinan* û *Mijabad* li ser têgeha mekanî rawestin. Ev her sê roman tenê ji aliyê bikaranîna hêmana mekanî ve bûne mijara vê xebatê. Li gor xwendina me di van her sê

romanan de mekan ji hêmanên din pêşdetir e. Bi gotineke din mekan û pirsgirêkên mekanî bi xwe mijara van romanan e. Xeyn ji vê yekê krîterên din di bijartina van romanan de nebûye meqsed.

Dema ku em li ser romana Kurdî dixebitin lazim e em rewşa civakî a Kurdan jî bizanin, lewra roman ji aliyekî ve nûnerê civakê ye. Kurd wek netew îro di navbera çar dewletan de dijîn. Ev yek di jiyana wan ya rojane de pirsgirêkên derûnî, zimanî, aborî, civakî, polîtîk û hwd. bi xwe re tîne. Kurdên ku li çar perçeyê belav bûne di nav pergala dewletên serdest de dijîn. Ev yek hema hema di her qadê de ji bo wan dubendiyê derdixe pêş. Pevçûn û pirsgirêkên Kurdan yên bi dewletên serdest re xwe di şaxên hunera Kurdî de jî nîşan dide. Kurd jî wek netewên din yê ku di heman rewşê de ne huner û şaxên hunerê di rêya fikrên netewî de bikartînin. Di vê nuqteyê de edebiyata nivîskî ji bo nîşandayîna armancên netewî wek amûreke kêrhatî ye. Lefebvre li ser vê mijarê girîngiya mekanî wiha diyar dike: “Her fikir, her nirx di nav mekanî de bi nirx û fikrên din re di nav pevçûnê de cudatiya xwe bi dest dixe an jî winda dike (Lefebvre, 2014: 413).” Têkiliya Kurdan a bi netewên din re jî li ser bingeha afirandina mekanî ye.

Dewlet, netewbûn û netew diyardeyên rasterast bi mekanî re têkildar in. Dewlet li ser bingeha netewê tê hilberandin. Bi gotina Joost Jongerden: “Dewlet girêdana otorîteya polîtîk a bi mekanî re ye (Jongerden, 2015: 17).” Di edebiyatê de pirsgirêkên netewbûn û nasnameyê ji bo milletên bindest yek ji mijarên sereke ye. Pirsgirêk û nîqaşên li ser vê yekê yên civakî û polîtîk, elbet xwe di edebiyata Kurdî de bi awayek xurt nîşan dide. Bi taybet di cureyên modern de yên wek helbest, çîrok û romanê de mijarên netewbûnê ku rasterast bi ax û welatê re têkildar e dertên ber me. Haşim Ahmedzade derheqê vê rewşê de wiha dinivîse:

> Romana Kurdî, wek neteweperweriya Kurdan, bi gelemperî bi armanc û hedefên siyaset û nasnameya Kurdan ya perçebûyî hatiye dagirkirin (…) Dinyaya romanên kurdî bere bere bi balkişandina wan a li ser rewşa kurdan wek gelekî ku ji bêdewletbûnê muzdarîb in, tê karakterîzekirin. Şerê kurdan ê ji bo mafên wan î netewî û lêgerîna wan a welatekî serbixwe bi awayekî zelal di hemû romanan de rû dide. (Ahmedzade, 2011: 59)

Di edebiyata Kurdî ya modern de girêdayî mijarên netewbûnê têgehên wek; dagirkerî, ax, welat, Kurdistan, serdest, bindest, kolonyalîzm, parçebûn, yekîtî, tekoşîn, serhildan, berxwedan, işkence, zilm, heps, çiya, şer, feodalîzm, gund(î), bajar(î) û hwd. gelek tên bikaranîn. Ev têgeh hemû bi erdnîgarî û mekanî ve têkildar in. Di romanên Kurdî de ev têgehên rêzkirî di nav honaka netewperwer de tên honandin. Wek ku Ahmedzade diyar dike: "Derçûn û pêşketin û babetên romana kurdî bi neteweperweriya kurd re bi awayekî xurt pêwendîdar e (Ahmedzade, 2011: 64)." Di vê nuqteyê de li gor me di romana Kurdî de wek hêman mekan zêdetir dertê pêş. Di romanên Kurdî de em wusa bawer dikin ku mekan problemek e û di bingeha problemên din yê romanê de jî mekan heye. Ji bo nîşandayîna vê yekê em ê di vê xebatê de di sê romanên Kurdî de li ser mijara mekanê bisekinin. Em dê van her sê romanan ji aliyê bikaranîna mekanî ve binirxînin.

# BEŞA YEKEMÎN

# AGAHIYÊN GELEMPER DI DERHEQÊ TÊGEHA MEKANÎ DE

## 1.1. MEKAN ÇI YE?

Di têkiliya mirov û mekanî de pirsa girîng ew e ku mirov çima xwe hewceyî cihekî diyar dibîne û vî cihî çawa çêdike. Mirov her tim bilindahî û cihên rast yê xwezayê bi cihên ku bi xwe çêkiriye ve girêdide. Mirov di çêkirina avahî ango sitargehan de xwe ji asta xweliyê cuda dike û bi vê awayî xwe di nav ewlehiyê de hîs dike. Di nav demê de çêkirina cihên taybet jî wateya malê digirin ser xwe. Em dikarin bibêjin ku sitargehên herî kevin jî di wateya malê de ne.

Mirov ji bo berdewamiya hebûna xwe bi hewceyiyên wek xwarin, vexwarin, hewa, cil û lixwekirinê heye. Lê beriya van mirov hewceyî mekanê ye. Lewra hebûn girêdayê mekanê ye (Purçak, 2019: 25). Mekan wek cihê ku mirov hebûna xwe lê bicih dike di nav demê de ketiye nav dîsîplînên wek ontolojî, kozmolojî û epîstemolojiyê, bi vê awayî jî bûye têgeheke navdîsîplînî.

Di vê xebatê de em peyva “mekan”î ji peyva “cih”î cuda digirin; peyva mekanî bi awayê ku peyva cihî jî dihundirîne bikartînin. Ji bo deverên piçûktir em dê peyva cihî bikarbînin lê peyva mekanî em dê wek têgeheke berfirehtir bibînin.

Mekan û cih wek peyvên ku carna di cihê hev de tên bikaranîn dertên beriya me. Cih, wateya xwe ya dawî an jî rastî di encama têkiliyên mirovan de digire. Li gor vî ji bo ku cihekî bê pênasekirin divê xwedî bingehek têkiliyan be. Özlem Berber di xebata xwe de li ser vê nuqteyê disekine:

> (…) Eger cihek bi saya têkiliyên xwe, têkiliyên dîrokî û têkiliyên nasnameyî re bê pênasekirin cihên ku xwedî van têkiliyan nebin wek “non-place” (cihê ku tune-yok yer) tên kirin. Cihên modern yên roja îro ku rastiya xwe bi xwe diafirînin wek; rawestgehên metroyê, navendên danûstendinê, otoban, bankamatik ku li van cihan gelek têkilî û ragihandin pêk tê mînak in ji bo non-place. Li van cihên ku têkiliyên civakî di astekê gelek kêm de ne nasnameya takekes xwedî giringiyê

nîne; li wan cihan her kes wek hev e, her kes perçeyek ji girseyê ye. (Berber, 2011: 149)

"Têgeha mekanî (space) ji peyva "spatium" ku Latînî ye û tê wateya "mesafe"yê derketiye holê. Rewşenbirên serdema navîn vê têgehê wek konteynir an jî qab bi kar anîne (ji Elden neqil Kaya, 2013: 2)." Ji aliyê din ve em dikarin bêjin ku mekan ne tenê ji formûlên matematikê û teknîkî pêk tên herwiha di nav mekanî de nesne hene û tekilî hene. Fehmkirin yan jî hîskirina mekanî li gor rewşên cuda diguhere. Dibe ku di nav heman mekanî de ji aliyê fîzîkî ve kesên nêzê me ji aliyê hestî ve ji bo me dûr bin û bi heman awayî bereksê vê jî mimkûn e. Ji vir diyar e ku mekan ji pîvanên dûr û nêzik zêdetir tişt îfade dike. Em dikarin vê yekî wek aliyê psikloljik a mekanî binirxînin. Pîvanên teknîkî a derbarê mekanî de û hîskirin ango fehmkirin ji hev cudatir dixuyên.

Em dikarin bibêjin ku cih bêhtir ji aliyê kesan ve rasterast di asta têkiliyan de tê tecrûbekirin. Cih zêdetir bi wateya qadeke diyar ango derdora naskirî dertê pêş. Ji vê aliyî ve cih şexsî û taybet e lê mekan berfireh û ji şexsîbûnê dûr e. Mînak dema ku yek li cihê meriv rûniştibe em dibêjin "ew cihê min e, li cihê min rûniştî, ji cihê min rabe û hwd" ev yek belkî ji bo nîşandana ferqa navbera cih û mekanê alîkarî me be. Bi vê awayî em fehm dikin ku cih "li vir e, ev der e, vira ye" lê mekan "ew der e wêde ye.

Cih lazim e ji tevlêheviyên fîzîkî, koordînat, bilindahî û dûrahiyê wêdetir xwedî taybetiyeke din be. Di vê rewşê de cih çi ye? Tim Cresswell wiha bersiv dide vê pirsê: "cih" deverên watedar in ku mirov bi awayek pê re têkilî çêdikin û bi awayek pê ve tên girêdan. Pişt re Cresswell mekan û cihî ji hev cuda dike. Li gor wî mekan têgehek ji cihê razbertir e. Mekanê wek "mekanê derve", "mekanên geometrîk" û xwedî hecm pênase dike; "cih hêmana di navbera van mekanan de ye". Di encamê de mekan ji cihê cudatir wek qadeke ku wateya wî tunebe tê dîtin. Mirov dema ku li mekanan wate barkirin û bi awayek bi wan re ketin nav têkiliyê û temas kirin, mekan wê demê dibe cih. Ev fikir bêhtir di salên 1970î de di qada erdnîgariya beşerî de dihat dîtin herwiha ev yek bi fikra "mekanê civakî an jî mekanê ku ji aliyî civakê ve hatiye afirandin" (Lefebvre) di nav nêzikahiyê de ye (Gürkaş û Barkul, 2012: 3).

Herkes di hişê xwe de xwedî tesewirek 'cih'î ye. Ji dema jidayikbûnê ve her mirov dibe xwedî cihekî. Xwedîbûna cihî ji aliyê giyanî ve mirovan rihet dike. Li gel vê çêbûna takekesî û nasnameyê de jî xwedî rol e.

Mekan têgeheke qedîm e. Di dîroka mirovahiyê de bikaranîna mekanê jî guheriye, lê mekan beriya her tiştî ji bo parastin, bicîhbûn û niştecihbûnê hatiye bikaranîn. Bi vê awayî têgeha mekanî pêşî xwedî wateyeke fîzîkî ye. Li gel fîzîkîbûna mekanê ya ku bi salan wateya xwe parastiye, tê dîtin ku ji aliyeke ve jî ontolojîk û civakî ye. “Têgeha mekanî ji peyva “kewn” ya Erebî tê û bi wateya cih, mehel, mal û cihê niştecihbûnê ye. Ev peyv di heman demê de bi wateyên derdor, dinya û kaînatê de ye (Korkmaz û Şahin, 2017: 7).” Em dikarin têgeha mekanî wek mezinahiya bêser û şûn ya cihê hebûnê pênase bikin. Terîfa mekanî bi gelemperî bi bêsînorî û bêdawîbûnê dertê beriya me. Mekan wek hecim xwedî sê rehendan e; firehî, dirêjahî û kûrbûn.

Têkiliya mekan û hebûnê îmkaneke nû dide ji bo terîfa mekanî; mekan ew cih e ku hebûn bi form û awayekî têde mewcûd e (Özpınar, 2014: 7). Herçend mekan ji aliyê gelek kesan ve bi awayekî berfireh hatibe terîfkirin jî ji aliyê fehmkirin û watedayînê ve têgehekî dijwar e. Ev dijwarî ji ber van sedeman e ku bûye mijara dîsîplînên cuda û di nav dîrokê de bûye xwedî wateyên curbecur. Li gel van dijwariyan aliyê mekanî yê ontolojîk û eqlî jî di tevlêheviya terîfkirina mekanî de xwedî rol in.

Mekan bi gelemperî wek cihê ku lê tê “bicihbûn” tê îfadekirin, li gel vê xwedî wateyên wek “derdor, cihana ku lê tê jiyîn û kaînat” e jî (Göka, 1998: 7). Bi vê awayî mirov li ser mekanî her cure kirin û hewceyiyên xwe pêk tîne. Herwiha mirov ji aliyê mekanî ve dibe xwedî cihekî diyar (pozîsyon) ku hem şekil dide wî cihî û hem jî ji aliyê cihî ve şekil digire. Ji vê yekê jî ev wate dertê ku mekan bêyî bikarhênerekî tenê kategoriyeke fîzîkî ye, lê dema ku ji aliyê kes an kesan ve hate emilandin ew çax bi wateya xwe ya bingehî dibe mekan. Di vir de eşkere ye ku mekan di nav têkiliyeke dualî de digihêje wateya xwe ya rastî. Di derheqê vê têkiliyê de Frederick Jameson wiha dibêje; “kategoriyên ku jiyana me ya rojane û ceribînên me yên ruhî diyar dikin kategoriyên demê nîn in, yên mekanî ne (Ayman, 2006: 7).” Li ser vê esasî ji bo hebûnê mekan şerta ewil e. Aliyeke din a mekanî jî feza ye. “Mekan ew derdor e ku ji xwelî, hewa û avê pêk tê (Keleş, 1998: 128)” û mirov dikare tê de kirinên xwe pêk bîne û jiyana xwe dewam bike, lê feza jî wek awayê gelemperî yê hebûna maddeyê tê terîfkirin. “Li derveyê fezayê ne madde dikare hebûna xwe bide dewamkirin û ne jî bê madde feza dikare hebûna xwe bide dewamkirin (Hançerlioğlu, 2016: 330-331).” Mekan lihevkirin û aloziyên jiyanê yê dema niha dihundirîne. Mekan bi hemû

tecrubeyên rojane re bi awayek gelemper derdora ku ji kuçe, bajar, erdnîgariya beşerî pêk tê îfade dike.

Li ser mekanî fîlozof û rewşenbir xwedî fikrên cihê ne. Henri Lefebvre, di berhema xwe ya *Mekanın Üretimi* de mekanê wek berhemeke siyasî dinirxîne (Hess, 2014: 15). Li gor Lefebvre mekan bi hêzên hilberîner û dîrokê re di nav têkiliyeke nêzik de ye. Lewra mekan hem encameke hilberînê hem jî sedemê wê ye û bi vê awayî mekan li gor hilberînê diguhere. Lefevbre di qada mekanê de rêyeke ku ji sê şaxan pêk tê dide ber xwe. Ji van rêyan ya ewil "pratîkên mekanî" ne. Li gor vê, pratîkên civakê yê li ser mekanî, mekanekî taybet ya wê civakê diafirîne. Ev cure mekan xwedî hebûneke fîzîkî ne. Rêya diduyan ya Lefebvre "mekanên temsîlê" ango "mekanên sêwirandî" ne. Ev cure mekan mekanê zanyar, bajarvan, teknokrat, hunermendan in. Yanê ev mekan di nav civakê de mekanên serdest in. Rêya sisêyan ya Lefebvre "temsîlên mekanî" ye yanê mekanên ku lê tê jiyîn. Li gor mekanên (civakî) Lefebvre "avakirina mekanên civakî, xwe avakirina me ye (ji Schick neqil Erol, 2016: 33)." Fikirîna li ser mekanî fikirîna mirov a li ser xwe ye jî di heman demê de. Tesnîfkirina mekanan a Lefebvre ji aliyê nîşandayîna têkiliya nêz a mirovan û mekanî girîng e. Di vê cudatiyê dixuyê ku her çiqas mirov mekanê temsîl dike bi heman awayî mekan jî mirovan temsîl dike.

Rewşenbîrekî din yê ku li ser mekanî xebitiyê David Harvey e. Harvey jî mekanê wek Lefebvre bi awayî civakî dinirxîne lê mekanê ontolojîk nabîne. Li gor wî di bingeha pêvajoyên civakî de mekan heye. Li gor Harvey xwezaya mekanî ji bo lêkolînên beşerî dê her tim wek razeke bimîne. Harvey wusa difikire ku eger xwezaya mekanî bê fehmkirin ew çax tevgerên mirovan jî dikare bê şîrovekirin (Harvey, 2009: 18-19).

Heta demeke nêz jî mekan wek valahî, mutleq û a priori dihat nirxandin. Lê bi gotina Michel Foucault (1988: 7) ku ji sedsala nozdemîn re digot serdema mekanî û vir de mekan bi awayek civakî; yanê bi mirovan re têkildar û girêdayî tê nirxandin. Wek ku John Urry jî dibêje (2015: 97) "mekan ji civakê naqete lewra bi serê xwe wateyeke mekanê tune." Ji sedsala ku Foucault behs dike û vir de têkiliya mekan û mirovan ji berê zûtir diguhere, herwiha bêhtir di bin bandora hev de ne. Têkiliya guherbariyê mecbûriyeta mekanî a li ser mirov zêdetir dike. Mirov, îro bêhtir li pey mekanên bi

konfor in lewra mekan xwedî temsîlê ne. Ev têkiliya temsîlê a mekanî ji bo takekes parçeyeke ji nasnameyê ye.

Gaston Bachelard ku bi berhema xwe ya *Mekanın Poetikası* navdar e, wiha dinivîse; "cihê ku ez lê me ez mekanê wir im (2017: 155)." Bachelard di vir de diyar dike ku mekan ne ji valahiyeke bêwate lê ji bîranîn û serpêhatiyên mirovan pêk tê. Em dikarin bibêjin ku mekan û mirov di heman demê de heman tiştê dijîn. Di navbera mirov û mekanî de têkiliya hêvpêçan û hevtemamkirinê heye. Devera ku mirov lê dijî bi esasî vala ye lê belê mirov dikare vê valahiyê tijî bike û terîf bike. Aktiviteyên mirovan di nav vê qada vala de pêk tê. Wek ku Ulrich Mai dibêje: "Derdora maddî û civakî ku mirov lê dijî bi saya watedayînê tê pejirandin. Ev yek têkiliyên civakî pêk tîne. Wate, dibe ku şexsî yan jî kolektîf be (Mai, 2016: 107)."

Valahî herçend şêweyeke mekanî be jî mirov valahiyê bi tiştan li gor xwe tijî dike an jî di navbera valahiyan de bi saya tiştan sînoran çêdike. Dema ku di navbera mirov, valahî û mekanî de ev têkilî pêk hat ji aliyek ve jî têkiliya tiştan û ya mekanî dest pê dike. Lewra ji aliyê mirovekî ve ku pêşî bi çav û xeyalkirinê şekil daye mekanê, pişt re tiştan di wir de bi cih kiriye êdî mekan rastî mudaxeleyeke hatiye û di encamê de bi saya tiştan guherî ye. Tişt dema di nav mekanî de hatin bicih kirin bivênevê parçeyek ji mekanê ne. Mekan taybetiyan li tiştan zêde dike mînak; dema ku em di derheqê pîvanên tiştekî de wek dîrêjahî, kûrbûn û berfirehiyê diaxifin ev yek li gor mekanî tên diyarkirin.

Mirov di nav derdoreke civakî de dijî bi vê awayî çand, civak û mekan di nav senkronizasyoneke de şekil didin jiyana mirov. Derdora ku mirov tê de dijî ji bo mirov qad ango mekanê hebûnê ye. Di vê derdorê de mirov her tim di nav çalakiyan de ye, derdora wî carna di demên kurt de carna di demên dirêj de diguhere û formên nû digire. Bi vê awayî mekanê ku mirov jiyana xwe lê saz dike ji bo mirov ne tenê tiştekî derveyî/ji derve lê belê ne tenê têgeheke jiyîna hundirîn/psikolojîk e jî; van her du aliyan jî dihewîne. Di encama têkiliyên mirov yê bi derve re mekanekî ku mirov têde hebûna xwe îspat dike pêk tê. Ev mekan ji bo mirov di asta sembolê de ye ku hebûna wî a li dinyayê sabît dike. Em dikarin bibêjin ku cihê mirov lê dijî ji aliyê amûrên wî yên şexsî ve jî girîng e. Eger di nav wî cihî ku ji bo xwe wek qadeke jiyanê diyar kiriye de xwe ji aliyê amûran ve aîd hîs neke ew dem dîsa dijberî û aloziyeke mekan, aîdiyet û biyanîbûnê peyda dibe. Em dikarin bi têgehên Martin Heidegger nêzê meselê bibin.

Arslan Topakkaya di xebata xwe de fikrên Heidegger a derbarê bicihbûnê de wiha dibêje:

> Ji bo Heidegger ji aliyê mekan û îskanê ve girêdayîna bi kok û rihan ve girîng e. Li gor Heidegger girêdayîna bi kok re (wek mekan) di wateya "înşa" û "îskanê" de ye. Herwiha niştecihbûnê jî bi du awayan îfade dike; yek bi wateya ewil wek maleke ku têde bihewe û adreseke diyar. Wateya duduyan jî ew e ku mirov xwe bi cihê ku dijî re ji aliyê kokan ve girêdayî hîs bike û herwiha ji wî cihê jî hez bike (Topakkaya, 2018: 68).

Girêdayîna ku Heidegger behs dike li gor me xaleke girîng e ji bo meseleyên mekanî. Eger em li ser vê xalê bisekinin em ê xwe bigihêjînin xala ewlehiyê. Ji bo ku mirov bikare li cihekî bijî û a girîngtir bikare kokên xwe li wir kûr berde erdê divê xwe li wir ewle be. Mirov li cihê ku xwe ewle hîs bike herwiha jê hez bike dikare ji xwe re nasnameyeke çêbike.

### 1.1.1. Dîroka Mekanî

Mekan û serpêhatiyên mekanî di hişê mirov de tên qeydkirin. Hiş (hafize) di navbera tiştên ku em dibînin de têkiliyan datîne. Ev yek hêzeke şîroveyê dide me ku em bikaribin di navbera tiştan de şîrove bikin û mantiqê bixebitînin. Bi saya hafizeyê em dikarin tecrubeyên xwe yên mekanî bi bîr bînin. Herwiha hafize rê nîşan dide ku em li ser mekanê şîroveyan bikin. Mirovên ku di mekanî de hereket dikin xwediyê wê derfetê ne ku ji xwe re serpêhatiyek xweser ava bikin û vê bi saya hafizeyê qeyd bikin. Di encama vê yekê de takekes dikare bi çîroka xwe ya mekanî û bi alîkariya hafizeya xwe ji xwe re nasnameyek çêbike. Dîroka mirov û mekanî ku bi saya hiş tê qeydkirin ji dema hebûna mirov û vir ve dest pê dike.

Mekan tenê yêkîneya materyalên ku wî pêk tîne nîne, di heman demê de wate û armancên ku mirov lê bar dike jî îfade dike (Dönmez, 2010: 14). Mekan di pêvajoya dîrokî de bi naskirina mirov a derdorê re watedar dibe. Di serdemên qedîm de mecbûriyetên xwezayî nehiştiye ku mirov li ser mekanî guherîn û mudaxeleyen pêk bîne. Mirov di wan deman de tenê li gor pêdiviyên xwe yên bingehî tevdigere. Handan Demirkaya di xebata xwe de wiha behsa vê rewşê dike:

> Mirov 10.000 sal berî niha ji diyardeya mekanê bêhay/dûr jiya ne, bi gelemperî ji bo hemû lazimahiyên xwe ji xwezayê îstifade kirine. Bi gotinekê rasttir nebûne xwedî mekanekê ku li gor fikir û daxwaza xwe ava kiribin. Di demên pêşdîrokî de ew fikra mirov ya (xwe)parastinê û mecburiyeta avakirina şertên guncav ji bo derdorekî jiyînê, ê mirov ji derdora fîzîkî dûr kiriye. Di encama vê mecbûriyetê de mekanekê nû a bi konsepta parastinê derketiye holê. Dema ku jiyana girêdayî axê dest pê kiriye ew çax mekanên cuda hatine ava kirin. (Sitargeh, xanî, depoyên nêçîrê û hwd.) Mekanên ewil bi pêşketina civakan re pêş ketine. Bi vê pêşketinê re mekan ji qad û bikaranîna şexsî ber bi mekanên hevpar ve guheriye. Bi zêdebûna nifûsê re civak ji cihekê ber bi cihekê din ve çûne û ev cihên nû li gel xwe kolan, cadde û peyarêyan anîne. Encama van hemûyan de jî bajarên mezin derketine holê (Demirkaya, 1991: 26-27).

Xweza di diyarkirina taybetiyên mirov de wek hebûneke çandî roleke sereke ye. Mirov ji bo ku bikare xwe ji her cure bandorên xwezayî dûr bigire lazim e ku ji xwe re sitargeheke ava bike. Mirov bi îstîfadekirina mekanî çanda xwe ya bicihbûnê û niştecihbûnê ava dike. Em dikarin bibêjin ku çanda mekanî awayê jiyînê diguherîne, lewra mirov dema ku fêrbû mekanê biguherîne êdî hizra wî a derheqê dinyayê de diguhere. Di bingeha vê guherînê de aîdbûn û hakimiyet a li ser mekanî xwedî bandor e.

Li gor me mirov çiqas li ser mekanî mudaxele kiribe (ev ne bi wateyeke neyênî ye) û ew guherandibe bi xwe jî ewqas guheriye. Pêvajoya şaristaniyan li ser esasê dîzaynkirina mekanî pêk tê. Mirovan herçend pêşî tenê deverên gelek piçûk ji bo jiyana xwe parastibin jî li gor têgihiştina xwe ya jiyanê û fehmkirina derdorê xwe vê “sînorê” berfirehtir kirine. Ev yek di encamê de bûye bingeha fikra bajar, şaristanî û metropolan. Ev pêvajoya ku seriyekî wê digihê jiyana hov û seriyê din jî digihêje şaristaniya sedsala 21emîn elbet ji aliyê mekanî ve guhertinên gelek radîkal pêk anîn.

Giedion mekanê vediqetîne sê serdeman. Serdema ewil ji Misirê heta Yewnanê, ya duyem ji Romayê heta nîvê duyemîn a qirna sedsala 19mîn û ya sêyem jî heta serdema îro. Serdema ewil ji wan şaristaniyên ewil yên pêşketî Mezopotamya û Misirê

dest pê dike û heta serdema Yewnanan dewam dike. Mîmariya serdema Yewnanan ji bo serdema ewil a mekanî serdema dawiyê temsîl dike. Herwiha ev yek, bingeha jiyan û mîmariya Ewropayî a demokratîk û şexsî saz kiriye. Serdema duyem a mekanî li Romayê derketiye holê û ji wir ber bi Ewropayê belav bûye. Hêmanên ku di vê serdemê de dertên pêş Ronesans û Barok e. Li gor Giedion serdema sêyem a mekanî di sedasala 19mîn de bi pêkanîna yekîtiya fikir û hestan ku berê ji hev cuda dihatin dîtin dest pê kiriye. Diyar e ku mirov di her serdemê de bikaranîna mekanê pêşdetir dibe. Di van serdeman de jî mekan bêguman li gor berjewendî û hewceyiyan hatiye bikaranîn. Ligel vê yekê di van serdeman de a ku dertê pêş awayê mîmariyê ye. Ev şaristaniyên ku di cotkariyê û teknîka dema xwe de pêşketîne bi awayî pratîk ji mekanî îstifade kirine. Dabeşkirin, hilberîn û çandina mekanî ji taybetiyên van şaristaniyan e.

Şûnwarên herî kevin ya jiyana beşerî a beriya dîrokê di serdemên kevirîn de (taş devri) tên dîtin. Mirov di vê serdemê de ji şikeftan -ku sitargehên xwezayî ne- derketine û li gor derfetên xwe û jiyana derve sitargehan çêkirine. Şekildayîna mekanî a ewil di vê serdemê de hatiye dîtin. Di vê serdemê de a herî berviçav ew e ku hemû mekanên ku lê bicih bûne li pey hev in û hemû sitargehên wê demê li ser palan û deverên avê hatine avakirin (Demirkaya, 1991: 27). Di nav pêvajoya guherîna mekanî de ji kom û civînên kevnar ber bi şaristaniyê ve mekan hem ji aliyê wateyê ve û hem ji aliyê formê ve guherînên mezin derbas dike. Di encama van guherînan de fikirîna mirovan a li ser mekanî zêdetir dibe, bi vê awayî mekan di navbera qadên felsefî, civakî û dîsîplînên din de tê nîqaşkirin. Di serdemên koloniyê û modernîzmê de bikaranîna mekanî a ji aliyê fîzîkî û fikrî ve em dikarin bêjin ku digihêje lûtkeyê.

Di dîroka têkiliya mirov û xwezayê de yek ji qonaxên girîng jî "dewlet" e. Dewlet di encama peyman û lihevkirinên civakî de derketiye holê. Li gor vê beriya niştecihbûnê mirov bi xwezayê re bi awayek yekbûyî dijiya. "Piştê çanda niştecihbûnê mirov digihêje asta civakî. Derbasbûyîna çanda civakî bi peymana civakî pêk hatiye. Mirov, bi peymana duyem a civakî re derbasê asta dewletê bûye (Karabağ, 2006: 16)." Dewlet ji bo endamên xwe di qada bikaranîna mekanî de bi saya qanûn û qaîdeyan pergalan ava dike. Li gel vê dîsa endamên dewletê bi gelemperî wê qadê wek cihê parastî, ewle û malzaroka hestên netewî texeyul dikin.

Çand, dîtin û bîr û bawerî li ser hişmendiya milletan a li ser mekanî bandorê çêdike. Di encama van cudahiyên asayî de fehmkirin, şikildayîn û şîrovekirina mekanî û mîmariyê jî di navbera çandan de diguhere. Yek ji van hêmanên cuda elbet dîn e. Mîmariya dînî a miletan hem li ser mîmariya civakî bandor çêdike. Dêr û mizgeftên gelek mezin ku carna bajêr li dor wan kom dibin û berfireh dibin yek ji cudahiyên berbiçav e li ser şikilgirtina mekanî. Erka mekanî a li Rojhilat û Rojava diguhere. Mehmet Bakır Şengül di xebata xwe de cudatiya mekanî a di navbera herdu şaristaniyan de wiha diyar dike:

> Li Rojhilatê mekan ji aliyê fonksiyonî ve girîng e lê li Rojava beranberiya sembolîk a mekanî hêz e. Mezinahiya mekanan divê li ser mirovan bandor çêke û wan mecbûrê îtaetê bike. Mekan li gor vê yekê şikil digirin û guherîna xwe berdewam dikin (Şengül, 2010: 536).

Mekan ligel hewceyiyên civakî a bikarhêner herwiha mecbûr e ku hewceyiyên fizyolojîk û derûnî jî pêk bîne. Winston Churchill li ser vê yekê wiha dibêjê: “Em şikil didin avahiyan, piştre ew şikil didin me (Erez, 2003: 36).”

### 1.1.2. Li Ser Têgeha Mekanî

Mekan ji qadeke ku mirov tê de tenê hereket dike û têkiliyên xwe pêk tîne wêdetir bi hêmanên psîkolojîk û hestiyarî watedar dibe. Hesta aîdiyeta mekanî ji çanda wî ya maddî wêdetir bi têdayiyên sosyal û psîkolojîk ve girêdayî ye.

Mekan wek qada têkiliyan ji aliyê wateyê û fonksiyonê ve diyardeyeke girîng e. Ev têgeh di nav hemû pêvajoyên dîroka mirovahiyê de derketiye pêş û xwedî roleke çalak e. Mekan di ferhenga Ahmet Cevizci de wek: “Mezinahiya ku hemû hebûn tê de ne û tişta ku hemû mezinahiyên bisînor û bêsînor dihundirîne (Cevizci, 1999: 583)” tê terîfkirin.

Wateyên mekanî li gor ferhenga Duden, (i) aliyê bi dîwarê rapêçayî a avahiyeke, (ii) qad ango meydana ku ji bo bikaranîna armancek hatiye cudakirin, (iii) qada erdnîgarî û polîtîk, û (iv) gerdûn e. Bi qasî sî cure bikaranînên cuda hene (Tepebaşılı, 2012: 65). Di pênaseyên mekanî de em dibînin ku xalên hevpar wek armanc, polîtîkbûn û sînor dertên pêş.

Divê em bibêjin ku “cih” û “mekan” ji hev cuda ne. Cih zêdetir şênber e û diyar e. Mekan qadeke berfireh e û têde îmkana hereketkirinê zêdetir e. Lê cih qadeke biçûk e û xwedî “sînorên sor” e. Wek bingeh her “cih” pêşî “mekan” e lê pişt re vediguhere û dibe cih. Dema ku li mekanekî niştecihbûn pêk hat û derdoreke bi înşa û mîmariyê ew mekane dîzayn kir ewçax ew der dibe cih. Dînamîkên cih û mekanî ji vî aliyê ve cuda ne. Mekan li ser sembolan ve tê îdraqkirin. Em dikarin bibêjin ku cih zêdetir xwedî sembolan in lewra sembolên çandî ewil li cihên sînordar pêk tên û ber bi mekanî ve belav dibin. Aslı Uzunkaya di xebata xwe de têkiliya “cih” û “mekanî” wiha diyar dike: “Mekan wek têgeheke razber û hundirê wî vala tê dîtin, lê cih di encama tecrubeyan de bîranînan pêk tîne. Li gor vê yekê em dikarin bêjin ku hêmana herî girîng a ku mekanî dike cih mirov e (Uzunkaya, 2014: 9).” Her diyardeyeke ku girêdayî mirov û demê be, di nav sînorên mekanî de pêk tê. Fikirîn, razan, axivîn û hemû çalakî û rewşên me eger bi awayek mecbûrî di nav du tiştan de pêk bên û ya ewil dem be ya din jî mekan e. Li gor vê yekê mekan herçend bi derdora fîzîkî bê pênasekirin jî ji aliyê din ve xwedî rehendeke ramanî ye. Hebûn bi du şêweyan mimkun e; ya yekem bi vê awayî ku ji hişmendiya takekesan xweser e fîzîkî û şênber e yanê rastî ye wek kevir, dar û nesneyên din. Rêya hebûnê a duyem jî girêdayî hişmendiya takekes e yanê razber e, xeyalî û ramanî ye wek hêmanên mîtolojîk.

Têkiliya mirov û mekanî dema ku mirov tê rûyê dinyayê dest pê dike. Li gel vê yekê mekan her tim di nav afirandinê de ye. “Mekan herçend wek qad ango amûr li ser şexsan bandor, guhertin, neguherîn, îmkan û mehrûmiyetan ferz bike jî, dema ku mekan ji aliyê şexsan ve tê tecrubekirin ew çax ji nû ve tê afirandin (Ertürk, 2013: 8).” Mirov li cihê ku lê dijî bi hîskirina mekanî re dest bi hebûnê dike. Hemû kêliyên ku mirov li jiyanê ye û di nav hemû bîranînên mirovî de mekan cihekî girîng digire. Heidegger derheqê bicihbûna mekanî de li ser têgeha tecrûbeyê disekine:

> Heidegger mekanî wek cihekî têkilî û tecrubeyan qebûl dike. Têgeha Heidegger a “Di-nav-dinyayê-de-bûn” têkiliya mirov a bi cih re nîşan dide. Li gor Heidegger mirov derdora xwe pêşî bi awayê bicihbûn û nîşandayîna bertekên hestiyar watedar dikin. Ji bo Heidegger jiyana rojane girîng e. Lewra temasa mirovan a bi amûrên ku bi kêrî jiyînê tên re -ji aliyê

> fîzîkî û fikrî ve- pêşî di nav pratîkên jiyana rojane de pêk tê (Solak, 2017: 27).

Em dikarin bibêjin ku jiyana rojane bi navê xwe yê din tecrube ye. Gaston Bachelard li hember fikra valabûna mekanî ye. Ew balê dikişîne ser bîranînan. Bi gotineke din têkiliya mirov û mekanî derdixe pêş. Mekan bi destê mirovan û xwezayê her tim di nav guherînê de ye û bi vê awayî jî heyîneke zindî ye. Li gor Gaston Bachelard: "Valahiya di nav mekanî de heyîneke gelek tîr e ji ber ku ji raman, hêza ramanê û şopan pêk tê (Bachelard, 2017: 135)." Ev fikir ji aliyê nîşandayina têkiliya mekan û ramanê (xeyal) ve girîng e. Mirov xeyn ji mekanên fîzîkî mekanên din jî ava dike. Wek têgehên dinyaya din, axiret û hwd. Ev têgeh herçend di rastiyê de tunebin jî mirov wan wek mekanên rastî difikirin, xeyal dikin û bawer dikin. Mekan têgeheke bi qasî fezayê berfireh e û hêza xeyalê a mirovan jî di heman berfirehiyê de mekanan saz dike. Mekan dema ku di kêliyên jiyana mirov de cih girt û ji aliyê hiş ve jî hat qeydkirin mirov êdî dikare mekanî hîs bike herwiha şîrove bike. Ji bo ku mekan bê fehmkirin divê mirov di ji cihên cuda lê binêre, bi awayên cuda tecrube bike û di demên cuda de bi dubareyan li ser bifikire.

Di lîteratura sosyolojiya mekanî de nivîskarên wek Henri Lefebvre, David Harvey, Manuel Castells, Edward Soja, Michael Foucault, Doreen Massey, Martina Löw û John Urry ji pêşengên vê qadê ne. Mijarên problema mekanî bi nivîskarên wek Henri Lefebvre, David Harvey, Manuel Castells û Edward Soja dest pê dike. Ev rewşenbîr têgeha mekanî ji aliyê pêvajoyên dîrokî, aborî, polîtîk, civakî û çandî ve dinirxînin. Pênase û nirxandinên mekanî cuda bin jî li ser hêmanên hevpar li hev dikin. Li gor Lawton jî pergala mekanî ji pênc hêmanan pêk tê;

> *Mirov
>
> *Derdora Fîzîkî: erdnîgarî, îqlim hwd.
>
> *Mirov derdor: pergala mekanî a ku bi heval û malbatê re pêk tê.
>
> *Derdora civakî: derdora qaîde û saziyên civakî (Ji Gür Öymen neqil, Erez, 2003: 29).

Mekan bi saya hinek sazkirinan awayên desthilatiyan pêk tîne ango bi gotina Lefebvre “hildiberîne”. Dîsa bi heman sazkirinan dikare desthilatiyên mewcûd û organîzasyonên wan hêzdartir bike. Mekan bi afirîner an jî hilberînerê xwe re di nav lihevkirinê de ye. Di encama van pênaseyan de em dikarin li gor xwe têgeha mekanî pênase bikin. Mekan diyardeyeke sabît û guherbar e ku ji bo hebûn û jiyanê şertê ewil herwiha a teqez e. Li gor vê yekê em dikarin bejin ku fikra hebûna bêmekan nemimkun e. Têkiliya mirov û mekanî ji heyînên din a xwezayê cudatir e. Mirov li ser wateya mekanî difikire û dixwaze wateya heyî fehm bike. Em dikarin bibêjin ku di encama vê lêgerînê de li ser mekanî dibe xwedî hêza guhertinê. Mirov bi saya bi dest xistina mekanî sitargeh, avahî, mal, bajar, şaristanî û dewletan ava kiriye. Ji ber vê yekê di dîroka mirovahiyê de yek ji hêmanên herî girîng heta a sereke mekan e. Mirov wek zindîyekî afirîner xwedî çand û huner e, em dibînin ku têgeha mekanî di nav hunerê de carna wek teqlîda rastiyê carna jî xeyalî dertê ber me. Mirov bi vê şiklî bi awayekî piralî ji mekanî îstifade dike.

### 1.1.3. Mekan û Beden

Têkiliya mecbûrî a mekan û bedenê dibe sedem ku mirov têgeha mekanî bi bedenê re şîrove bike. “Têkiliya “takekes” a bi mekanî re têkiliya bi bedena xwe re dihundirîne (Lefebvre, 2014: 69).” Têkiliyên mekanî a bi bedena mirov re li ser mirov tecrubeyan çêdike. Tecrube hem bi awayî fîzîkî hem jî bi awayî fikrî ye. Ev yek têkiliya beden û mekanî tîrtir dike. Li ser têkiliya mekan û bedenê Merleau-Ponty wiha dibêje: “Mekan heyînî ye heyîn jî mekanî ye (Durmaz, 2017: 10).” Merleau-Ponty bi vê gotina xwe mekan û bedenê rasterast bi hev ve girêdide û pêşiya şîroveyên muxalif digire. Di vir de aşkera ye mimkun nîne ku takekes têkiliya xwe û derdora fîzîkî qut bike. Li ser yekîtî û mecburiyeta mekan û bedenê Merleau-Ponty wiha dewam dike:

> Bedena min wek tiştekî ku tê dîtin û tevger dike ji tiştan e, yek ji tiştan e, xwe bi dinyayê ve girêdaye. Lê madem ku bedena min tiştan dibîne û hereket dike wê demê tiştan wek çember li dora xwe digire, ew yan perçeyek ji bedenê ne yan jî pêvek in, derbasê bedenê bûne. Dinya ji qumaşa bedenê çêbûye. (11)

Merleau-Ponty di vê fikra xwe de bedenê wek qadeke tecrubeyê dibîne. Li gor wî beden hêmaneke sabît a mekanî nîne di navbera takekes û tiştan de xwedî roleke

navbeynî ye. Di têkiliya beden û mekanî de aliyê bi hereket beden e, bi vê awayî hem diafirîne hem diguherîne û hildiberîne. Li gel van beden bi mekanî re di nav lihevkirin û pêvçûnê de ye. Beden çanda mekanî li xwe dipêçe û heyîna xwe pêk tîne. Lefebvre vê têkiliya nêzik wiha îfade dike: "Her bedenek zindî mekanekî ye û mekanekî aîdê xwe ye: li wir hem xwe û hem jî mekanê hildiberîne (Lefebvre, 2014: 188)." Mirov mekanê bi bedena xwe tecrube dike û di encama vê yekê de di hişê xwe de dikare mekanên ku qet nedîtiye xeyal bike ango di derheqê wan de texmînan bike. Dema cihekî ku meriv qet nedîtibe bê vegotin meriv dikare di hişê xwe de li gor xwe wî cihî xeyal bike. Tecrubeya bedenê di vir de kêrhatî ye, em di karin bêjin ku beden agahiyên berê û hêza xeyalê bi hev re dixebitîne. Merleau Ponty li cihekî din têkiliya beden û mekanî wiha aşkera dike; "eger bedena min nebûya ji bo min mekan jî çênedibû (neqil Özbek û Ertürk, 2017: 81)." Di mekanî de em bi saya bedena xwe dijîn. Têkiliya me a bi derve re her tim ji ser bedenê ve ye. Her çawa em mecbûr û girêdayî bedena xwe ne bi heman awayê em girêdayê mekanî ne. Mekan bi saya hebûna bedenan şikil digire. Dema di mekanan de mirov tunebin jî mekan "li wir in", "li cihê xwe ne" û hebûna xwe didomînin. Lê ji bo jiyînê mekan, hewceyê hereket û dînamîzma mirovan in.

Beden derheqê mekanên fîzîkî de li gor dîtin û hişmendiya xwe agahiyan berhev dike û bi vê awayî bi mekanî re dîyalog datîne. Ev pêvajoya diyalojîk di derdora fîzîkî de bi temas, dîtîn, têkilbûn û tevlîbûnê pêk tê. Di mekanê xeyalî ango razber de jî bi saya hêmanên hişî pêk tên. Mirov di encama van pêvajoyan de mekanên fîzîkî di bedena xwe de bi cih dike. Beden bi hereketê re, hereket bi bihîstinan re û bihîstin jî bi mekanî re têkildar in û di encamê de ev hemû bi hev re tecrubeyên di derheqê mekanî de pêk tînin. Bîranînên derheqê cihêkî de ne tenê ji nesne û mekanê pêk tê li gel vê aliyê hişmendî û hîssiyatê ve jî xwedî arşîvê ye. Hiş, arşîveke wêneyên mekanî ye.

Em dikarin têkiliya hêmanên cih, mekan û bedenê ku her sê bi hev re rewşa bicihbûnê pêk tînin wiha pênase bikin; rewşa "li-cihek-bûn"a bedenê ji aliyê mekanî ve "bicihbûyînê" îfade dike. Beden dema ku mekanî bi çanda jiyînê tijîkir "cih" çêdibe. Li gel vê cihê ku li wir rewşa bicihbûnê pêk hatiye ji mekanê wêdetir diçe, di wir de bi saya bedenan têkilî tên danîn. Ji ber vê yekê em dikarin bibêjin ku wek têgeh "cih" bi saya têkiliya bedenan dertê holê herwiha temambûyî û sekinandî nîne her tim di nav bûyînê de ye.

### 1.1.4. Mekan û Sînor

Di qada xebatên mekanî de “sînor” yek ji mijarên girîng e. Lewra di xwezayê de mekan û nesne xwedî sînoran in. Di nav sînorên xwezayê de mirov jî sînorên xwe diyar dike. Di xwezayê de her tişt bi sînoran hatiye pêçandin. Topografya jî di nav vê de ye. Çiya, behir, deşt, çem... hemû bi sînor in. Di nav xwezayê de sînor li cihê ku hêmanên xwezayî dest pê dikin, diqedin û digihêjin hev dixuyên. Mirov hêj ji demên berê de xwezayê ji xwe re wek model dîtiye û di rêça xwezayê de qadên jiyînê saz kiriye. Li gor sînorên xwezayê wî jî ji xwe re mekanên xwe afirandiye. Sînor di navbera tiştan de xwedî roleke diyarker e: “Hemû sînorên ku ji navendê ber bi derdorê ve fireh dibin di nav hemû hebûnan de wek peymanekê bênivîs e ku di têkiliya bi ‘yên din’ re diyar dike (Korkmaz ve Şahin, 2017: 16).” Sînorên ku dawî û destpêkê diyar dikin di nav hev de ne. “Nuqte ango xêza ku qedandina tiştekî nîşan dide wek dawî tê pênasekirin. Lê belê sînor wek noqteya destpêka tiştekî din jî dikare bê qebûlkirin. Sînor û bêsînorî du têgehên bi hev re girêdayî ne herwiha hev temam dikin (Hançerlioğlu, 2016: 371-72).”

Têgeha sînorê bi taybet di serdema modern de yek ji têgehên herî girîng e. Bi awayê erdnîgariyê ku em lê binêrin di navbera dewletan de sînor hene û ev tên parastin, eger em di qadeke piçûktir de lê binêrin di nav malan de sînorên odeyan û kesan hene. Di vê serdemê hem di jiyana fîzîkî de hem jî di jiyana ramanî de her tişt xwedî sînor in û îxlalkirina her cure sînorê xwedî cezayek e. Ji ber vê yekê sînor têgeheke berfireh e, ji aliyê fîzîkî wêdetir xwedî wateyên fikrî ye jî. Wateyek din ya sînorê jî ew e ku bi kêrî wê yekê tê ku di navbera ‘em’ û ‘yên din’ de cudatî çêdike. Bi taybet serdema modern sînorên fîzîkî û yê fikrî diyartir û tûjtir kiriye di nav civakê de. Em dikarin bibêjin ku di civakê de di navbera tebeqeyên civakî de jî sînor hatine xêzkirin. Di serdema modern de civak, netew, dîn û fikr bi saya sînoran ji hev vediqetin. Funda Kurak Açıcı di xebata xwe de behsa pênaseyên Hegel û Spînoza a di derbarê sînoran de dike:

> Li gor Hegel ji bo ku em sînorê îdraq bikin divê em bizanin ku li pişt wê sînorê çi heye. Dema ku cihê dawî a xêzê em bizanin ev bi wê wateyê ye ku em valahiya li pişt wê xêzê jî dizanin. Li gor Spînoza jî pênase kirin sînor kirin e, dema ku em ji gulekê re dibêjin rengê vê sor e, em wê li hember rengên din bisînor dikin. (Açıcı, 2013: 24)

Di pênasekirina mekanî de mimkun nîne ku sînor tevlî pênaseyê nebe. Mekan bi pênaseya xwe ya herî sade qadeke bisînor e. Sînor herçend wek têgeheke ku bi kêrî cudakirin û veqetandinê bê jî li gel vê xwedî erka yekîtiyê ye jî. Sînor, di navbera du tiştan de hem cudahî hem jî yekîtiyê pêk tîne. “Di nav pêvajoya dîrokî de sînorê herî kevin a ku bi destê mirov hatiye çêkirin “dîwar” e. Ji bo vê mînaka herî baş “Sûra Çînê” ye. Ev sûr ji aliyeke ve cudaker be jî ji aliyê din ve jî yekîtiyê û bihevrebûnê diparêze (Açıcı, 2013: 24).” Di sînorkirina mekanan de mehremiyet hêmaneke girîng e. Mirov bi xwe sînorên xwe diyar dike. Mirov di qada xwe ya sosyal û fîzîkî de ji xwe re cihekî mehrem çêdike û vê qadê ji derve diparêze. Dereceya nêzikbûna mirovên din a vê qadê tenê bi daxwaza takekes tê diyar kirin. Ev ne tenê bi awayê şênber lê bi sînorkirina razber jî mimkun e.

Mirov mekanê bi du awayan difikire, hem ji aliyê xwe ve yanê şexsî hem jî ji aliyê kesên din ve yanê kolektîf. Mirov di nav mekanê xwe a şexsî de hebûna xwe pêk tîne û di nav têkiliyên mekanên kolektîf de jî jiyana xwe dide dewam kirin. Ji bo pêkanîna lazimiyên xwe yên bingehîn mirov ji bo xwe qadên şexsî ava dikin. Ji bo ku van lazimiyan û nirxên xwe yên jiyanê pêk bînin divê sînorên xwe yên şexsî baş diyar bikin. Qada şexsî ne tenê bi sînorên fîzîkî û sembolan çêdibe herwiha ew bi awayê razber, yanê bi fikir û ramanê jî çêdibe. Ev qad çi razber çi şênber be şexs aîdê wê qadê ye û pê re eleqedar dibe. Ji aliyê din ve xwedîcihbûn îmkanên wek ewlehî, azadî û xwedîlêderketina aîdiyetan dide mirov.

Sînor û sînorkirin tenê di wateyên neyênî de nînin. Sînor ji bo armancên erênî jî tê bikar anîn. Di tunebûna sînoran de dibe ku dinya bikeve nav tevlêheviyê, herwiha tirs û nerehetî jî zêde dibin. Her hebûn bi saya sînoran pêk tê û ji yên din cuda dibe. Sînor têkiliyên di navbera mirovan de dikare asteng bike, dikare pêş ve bibe û dikare birêkûpêk bike. Pêdiviya mirov bi hemû sînoran heye. Ji ber vê yekê sînoran diparêzin, êriş dikin, li ber xwe didin; ji aliyek ve dixwazin xwedî sînoran bin ji aliyek ve jî bêsînoriyê dixwazin.

Cihên derve û hundir tecrubeyên cuda çêdikin ji mirovan re. Di hundir de tevgerên me ji aliyê sînorên mekanî ve tên astengkirin, em di hundir de girêdayî hêzên mekanî ne. Li der ve ji bo ku ev hêz tunene tevgerên me wek yê hundir nayên

astengkirin. Hundir êdî veşartî, êdî taybet û ji bo keşifkirinê ye. Derve jî aşkera ye û gelemperî ye, ji bo dîtinê ye.

Sînor tenê ji bo dîyarkirina sînorên netew dewletan nayên bikar anîn. Sînor hem wek astengên maddî hem jî di qadên aborî, siyasî û teknolojiyê de di wateya pêşketinê de bi awayê derbasbûna sînoran û rakirina sînoran tê bikaranîn (Dönmez, 2010: 3). Di civakên pîşesaziyê de ku netew-dewlet wek aktorên sereke dertên beriya me, sînor ne tenê wek astengên ji bo ewlehiyê herwiha ji aliyê ziman û etnîkî ve jî civakên homojen ava dike. Guherînên iqtîsadî û siyasî ku di encama şoreşa pîşesazî û şoreşa Frensî de derket holê li ser sînoran wate û erkên nû bar kir. Ji ber vê ev herdu şoreş li ser guherîna têgeha sînor xwedî roleke girîng in.

### 1.1.5. Yek ji Têgehên Mekanî: Mal

Di nav diyardeya mekanî de yek ji têgehên herî girîng "mal" e. Mal, ji demên qedîm heta îro parçeyek jiyana mirovan e. Em dikarin bêjin ku têgeha mal ango xanî (ev) ji têgeha sitargehê (barınak) cudatir e. Ji aliyê wateya bingehî ve (parastin, xwedîbûn, sitarbûn) herdu jî yek in. Mal rihetî, aramî û bextewariyê dide şexsan. Ji bo ku ev yek pêk bên jî ji aliyê mîmariyê ve tê organîzekirin. Li gel vê yekê taybetiyên malê cihê xwediyê wê jî di nav civakê de diyar dike. Mal ji aliyê aborî, mîmarî û fîzîkî ve xwedî sembolên taybet e. Li gel mîmariyê aliyên çandî, civakî û ramanî jî di nav têgeha malê de dertê ber me. Mal di nav pêvajoya hebûna mirov de cihê herî navendî ye. Bûyer û qewimînên girîng û taybet li mal pêk tên. Herwiha mal ji bo mirov ew cih e ku ji derve re girti ye û di nav xwe de xwedî taybetiyan e. Li derdora malê têkiliyên cînartiyê û civakî pêk tên. Li gor vê yekê mal hem şexsî hem jî civakî ye. Qewimînên li derveyê malê yên derdorê, malên din, civak û çandî li ser malê jî bandor çêdike. Guherîn û dînamîkên jiyana derve li ser mirov bandor çêdikin. Di vê nuqteyê de mal wateya "sipartinê" jî digire ser xwe; mirov ji problemên derve xwe dispêre malê. Ji aliyê din ve ji jiyana derve dûrketin jî heye di nav vê wateyê de.

Gaston Bachelard derheqê têgeha malê de xwedî fikrên resen e. Li gor wî: "Mal, koşeya me ya li dinyayê ye, wek ku bi gelemperî tê gotin gerdûna me ya ewil e (Bachelard, 2017: 34)." Di çêkirina malan de çand xwedî roleke girîng e. Li gel çandê rewşa erdnîgariyê jî di çêkirin û mîmariya malan de dertê pêş. Dema ku em li malên cihekî diyar binêrin em dibînin ku li wir li gor erdnîgariyê mal hatine çêkirin. Mal ji

çandê û derdora ku lê ye cudatir nayê fikirîn. Herwiha mal bi têkiliyên xwe yên derve re mewcûd e û li wê derdorê bi cih dibe. Di têkiliya mal û çandê de hêmanên wek dîn, ziman, eqrebatî, kevneşopî, sembol, têkiliyên aborî û şertên fîzîkî dertên pêş. Pelin Melisa Somer di xebata xwe de wiha behsa mal û bicihbûnê dike:

> Yek ji mekanên aîdiyetê yê herî girîng mal e. Mal ew cih e ku ‘em li wir in, tê de bi cih in’. “Di zimanê Almanî de peyva ‘dasein’ ku tê wateya hebûnê di heman demê de tê wateya li-cihek-bûn, li-wir-bûnê jî. Ev, yek ji mînakên balkêş e ku têkiliya hebûnê bi rêya ziman îfade dike. Mîmarî jî zimanê cihê ku mirov lê dijî ye, ku mirov xwe aîdê wir hîs dike û li wir xwedî derdikeve (Somer, 2006: 7).

Divê bê zanîn ku di navbera mal û nasnameyê de jî têkilî heye. Nasnameya mirov di encama hemû kirinên mirov de pêk tê. Di nav jiyanê de nasnameya mirov diguhere carna tiştên nû lê zêde dibin carna jî jê kêm dibe. Mal di gelek çandan de ji bo avakirina nasnameyê û prestîjê bi awayên cuda tê çêkirin. Mal bi awayek ê mirovan hem nêzikê hev dike hem jî nêzikê çanda xwe dike. Nasnameya mirov bi nasnameya malê re rasterast di nav têkiliyê de ye. Têkiliya mirov a bi xwe re, bi hest û ramanên xwe re bi derdora xwe ya fîzîkî re hemû rasterast bi nasnameya malê re girêdayî ye (Açıcı, 2013: 49). Mirov terza jiyîna xwe di nav mekanî de nîşan didin. Ev nîşandayîn di nav sînorkirinên fîzîkî û sembolîk de pêk tê. Mal ji bo karûbarên rojanê ew nuqteya sabît e ku tê tercihkirin û kakilê hikumraniyê ye. Mal wek qeleya hikûmraniya mirov e û tenê kesên ku destûra wan hebe dikarin têkevinê (Uçar, 2005: 50). Wek berfirehbûna dinyaya şexsî “mal” ne tenê cih e; di heman demê de xwedî referans û wateyên derûnî û civakî ye. Mal tenê ji bo hinek armancan nehatiye sazkirin. Lewra form û organîzasyona malê ji çanda ku girêdayê wê ye bandor digire. Pênaseya malê ya berê wek sitargeh bû lê armanca wê ya îro sazkirina derdora herî guncav e bo jiyîna mirovan. Mal, yekîneya civakî a mekanê ye.

Dinyaya derve û hundir ji aliyê tecrube û têkiliyan ve ji hev cuda ye. Gaston Bachelard vê yekê ji ser bîranînan ve diyar dike: “Bîranînên dinyaya derve û yên malê tu wext nikarin bibin wek hev (Bachelard, 2017: 36).” Wate û erka mal li gund û bajaran bi heman awayî nîne. Mal li gor çand û civakan wateyên cuda digire ser xwe. Bi

gelemperî mal wek berdewamiya nifş û malbatê, yekeya herî piçûk a civakî ye. Cudahiya wateya malê a di navbera gund û bajaran de Joost Jongerden wiha diyar dike:

> Wek diyarde mal, li deverên gundewar (kırsal) bêhtir xwedî giringiyê ye. "Gund her çend wek yekeyek vekolînê be jî li deverên gundewar yekeya bingehîn a civakî gund nîne bi gelemperî 'mal' e. (…) Mal yekeyek bavsalar û hîyerarşîk e ku li dor navê mêrekî bi rêxistin dibe (Jongerden, 2015: 38-39).

Yek ji hêmanên ku bi malê re tê bikaranîn û xwedî giringiyeke sembolîk e "dîwar" e. Dîwar hêmaneke mîmarî ye. Bi taybetiya xwe ya ku tiştan ji hev cuda dike yanê du mekan ava dike. Alkaya di xebata xwe de wiha li ser dîwar radiweste:

> Di hiş de dîwar wek têgeh bi wateyên neyênî qedexe, asteng, desthilat, ceza û li-derve-mayînê dertê pêş. Li aliyê din em dibînin wateyên erênî wek vekiribûn, azadî huner û berxwedanê jî bi dîwarê re tê şîrovekirin. Bi vê awayî dîwar hem bi wateyên erênî hem jî neyênî di hiş de cih digire (Alkaya, 2015: 2).

Dîwar ji aliyê civakî ve bi rolên wek avakarî, parastin, veşartin cudaker û yekîtiyê dertê ber me. Di qada huner û edebiyatê de jî em dibînin ku dîwar wek metafor tê bikaranîn. Em dikarin bibêjin ku dîwar di roman û cureyên din a edebiyata modern de bi wateyên tenêtî, astengên curbicur û nîşaneya rewşa derûnî dertê pêş.

### 1.1.6. Mekan û Hiş

Ji bo ku mekan di hişê mirov de cih bigire divê ji aliyê kesan ve bê tecrubekirin yanê lazim e li ser serpêhatî hebe. Piştê ku mekan ji aliyê kesên ku li ser dijîn ango bikartînin ve hat tecrubekirin êdî ew mekan dibe hêmaneke bîr û hişê mirov. "Mekanê ku êdî di hiş cih girtiye hem ji bo şexsan hem ji bo civakê dibe îmge (Çakır, 2015: 3)."

Em dikarin bibêjin takekes û civak xwedî îmgeyên mekanî ne. Em dikarin têgeha îmgeyê hem wek xeyal hem jî wek dîmenên dinyaya rastiyê ku di hiş de cih digire pênase bikin. Mirov xwediyê wê qabiliyetê ye ku ji rastiyê îlham bigire û biafirîne. Mirov li ser diyardeya mekanî jî bi saya îmgeyan afirîneriyê pêk tîne. Wek ku Uysal diyar dike:

> Mekan îmge ye. Îmge hêmaneke razber e ku di hişê mirov de cih digire û ji sêrpehatî, bîranîn û tecrubeyên mirov pêk tê. Îmge temsîla rastiyê ye. Tişta ku rast be mirov îdraq dike û wate didiyê. “Sitargeh”, “mal”, “ode” ji bo mirovan tenê mîmariyên ku ji dîwaran, giraniyeke û derî û paceyan pêk tê nînin, ew tişteke din in. (Uysal, 2009: 1)

Mekan ji awayê rêvebirîn, aborî û îdeolojiya civakî cuda nayê fikirîn û afirandin. Di afirandina mekanan de îmgeyên hevpar armanc e. Di encama tecrube û têkiliyên bi mekanî re di hiş de îmgeyên mekanî çêdibin. Ji bo ku di hiş de îmgeyên mekanî çêbin tecrubeyên mekanî şert in. Hişmendiya mekanî îro êdî wek qadeke vala a geometrîk nayê pênasekirin lê wek têgeheke civakî û ku ji nû ve tê afirandin e. Îmgeya mekanî di encama tecrubeyan de di hiş de cih digire û pişt re jî dibe parçeyek ji pêvajoya hişê. Takekesa ku xwedî îmgeya mekanê ye, têkiliya xwe û mekanê bi şiklên cuda dide dewam kirin. Di nav vê pêvajoyê de hem bi dubareyan mekanê dîsa tecrube dike hem jî temsîlên nû yê mekanî di hişê xwe de wek îmge çêdike. Parastina dîmenên mekanî bi têgeha “hiş” re rasterast têkildar e. Di esasê de îmgeyên di hişê me de jî parastina dîmenan e.

Hîskirina mekanê bi awayê tehm, bêhn, têkilbûn û dîtinê mimkun e. Herwiha bi van hêmanan mekan di bîra mirov de tê qeydkirin. Hêmanên derheqê mekanî de ku di hişê mirov de dimînin li gor kesan guherbar e. Taybetiyên şexsan yê fizyolojîk wek derûnî, xûy, tecrubeyên rabirdûyê û civakî-çandî di çêbûna bîra şexsî ya girêdayê mekanê de xwedî rol in. Aîdiyeta mekan û nasnameyê ji ser nîşanderan (gösterge) ve tên xwendin. Di nav pêvajoya dîrokê de mirov, mekanên ku lê jiyane bi nasnameya xwe re têkildar kirine û şopên xwe li wir hiştine.

> Ji serdemên pêşdîrokî heta îro herçend tecrubeyên mekanî û bikaranîna amûran guherîbe û pêşketibe jî taybetiya şophiştin û aîdiyetê neguherî ye. Ji ber ku şophiştin û hesta aîdiyetê qerekterê mekanan diyar dike ev yek ji bo çêbûna bîra mekanê jî girîng e. (Çakır, 2015: 9)

Di demên pêşdîrokî de mirov di şikeftan de dijiyan. Îro tê zanîn mirovên ku li şikeftan dijiyan li dîwarên şikeftan resim çêdikirin ango tiştan xêz dikirin. Bi gotineke

din hesta aîdiyet û şophiştinê diyar e ku heta jiyana şikeftî diçe. Em dikarin vê rewşê wek xwedîderketinê şîrove bikin, bi xêzkirin û şophiştinê ji aliyek ve diyar dikirin ku ew şikeft ya wan e û ew jî aîdê wê cihê ne. Ji demên pêşdîrokî heta îro şertên jiyanê guherîbin jî hesta xwedîderketina wê cihê neguheriye. Mirov herçend li cihekî bijî û wê cihê li gor jiyana xwe rast bike ango biguherîne ew qas di navbera mirov û wê cihê de têkiliyek pêk tê. Mekan di nav herikîna jiyanê de dibe parçeyek ji nasnameya mirov.

Civak li ser mekanî hevpar bîra hevpar saz dike. Bûyerên civakî yên wek ceng, qewimînên xwezayî, nexweşî û komkujî li ser mirov û civakan bandorên zêde dihêlin. Civakên ku rastî trajediyên mezin tên li ser mekanî bîreke hevpar diafirînin. Bîra civakî, ji bo malbat û netewan xwedî berjewendî û motîvasyonên cuda ne. Em dikarin bibêjin ku bîra civakî ev keşifkirina nasnameya hevpar e. Ji bo hişyarkirina bîra civakî bijartina bûyereke rabirdûyê bes e. Bîra kolektîf di her qadên jiyana civakî de xwe dide der. Bîra hevpar ji bo civakan xwedî hinek wateyan e. Ji van a girîng bi nasnameya civakî û hevpar ve girêdayîye. Nasnameya ku bi saya mekanî û bîra hevpar pêk tên bi kêrî meşrûkirina çalakiyên civakî pêk tên. Bi saya bîra hevpar di demên felaketan de ango demên xetere û man û nemanê de civak motîve dibe. Bi saya bîra hevpar endamên civakê li hember hebûna xwe; “yên din ango neyaran” bi cih dikin. Endamên civakê di rewşên xeternak de ji bo parastina bîra hevpar pêşî mekanê diparêzin.

### 1.1.7. Mekan û Hêz

Mekan diyardeyeke hêzê ye ku ji hêmanên siyasî, aborî, leşkerî, demokratîk, çandî û teknolojîk pêk tê. “Mekan hem di afirandina hêzê de rasterast xwedî bandor e hem ji hêza ku hatiye afirandin rasterast bandor digire (Hacısalihoğlu, 2006: 2).”

Mekan bi pênaseya eslî cihê ku lê tê jiyîn e. Cihê jiyînê di nav demê de bi cudatî û guherînan şikil digire. Mirov û xweza hêmanên sereke a mekanî ne. Herdu hêman jî li gor xwe xwedî dînamîzmê ne. Mirov xwedî taybetiyên aborî, siyasî, civakî û çandî ye. Sehneya van hemû pêvajoyan mekan e. Mirov ji dema hebûna xwe ve li gor qabiliyetên xwe li ser mekanî guherînan pêkaniye û bi vê awayî jî şop hiştiye. Ji aliyê din ve xweza ji av, hewa û axê pêk tê. Ev hêman jî bi awayek xwezayî cihên jiyînê diguherînin. Hem tevgerên mirov hem jî yên xwezayê mekanê diguherîne. Mekan sehneya herî razber e ku hêz xwe li serê nîşan dide û piştgirî an jî pêvçûnan jî derdixe holê. Mekan nirxên wek,

aborî, çandî û polîtîk hildide ser xwe û gelek caran sedemê tekoşîna hêzê ye. Eser Yağçı û Nesrin Dengiz di xebata xwe de têkiliya mekan û hêzê wiha diyar dikin:

> Hakimiyeta mirov a li ser mekanî di dema watedayîna mekanî de dest pê dike. Nûnerên civakê ji bo ku mirov kontrol bikin li ser şiklên mekanan xebitîn. Bi vê awayî hakimiyeta girêdayî mekanê pêşket. Deverên niştecihbûnê yê ewil di nav demê de ber ber bi bajaran ve guherîn, ev yek jî ji ber cudabûna di navbera mekanên kesên hêzdar û bêhêzan de pêk hat (Yağçı û Dengiz, 2014: 92).

Em dikarin bêjin ku di navbera mekan û hêzê de têgeha şiddetê heye. Lefebvre bi awayek gelek zelal wiha dibêje: "Hikumdarî "mekan" e; a rasterast mekanê ku li ser şiddet tê bikaranîn, yanê mekanê ku şidet lê bicih bûye û ji aliyê wê ve hatiye afirandin e (Lefebvre, 2014: 288)."

Desthilatî bi xêzkirina herêmên taybet qadên hêzê diyar dike. Bi gotineke din desthilatî mintiqeyên taybet diyar dike. Wateya mintiqeyê ji aliyê desthilatiyê ve cudakirina mekanê ye. Bi vê awayê desthilatî du mekanan ji hev cuda dike û di nav sînorê van mintiqeyên cuda de qaîdeyên taybet dide bicihkirin. Di serdemên neteweyan de polîtîka û stratejiyên li ser hikumraniya mekanî yek ji mijarên herî girîng e. Gelemperiya şerên mezin yên dîroka nêz deeheqê hikumdarî, kolonîkirin û bidestxistina jor û jêrê mekanan bû.

### 1.1.8. Mekan û Nasname

Mekanên ku jiyana rojane lê derbas dibin ji aliyê pêvajoyên subjektîv û derûniyê ve bîranînan pêk tînin, hişmendiyê çêdikin û bi nasnameyên cuda şikil digirin. Em dikarin bibêjin ku bajar wek mekan hem nasnameya gelemper saz dike hem jî şikil dide nasnameya şexsan û wek tezahura şaristaniyan ku dertê ber me.

Fehmkirin, şîrovekirin û têkiliya mekanî di serenavên wek sembolîk, binyadger, psikolojîk, fenomenolojî, hermeneutik, çandî û ampîrist de pêk tê. Sedemê zêdebûna van qadan ku li ser têkiliya mirov û mekanî disekinin ew e ku kirpandina her dîsîplînê cuda ye. Wek mînak qada sembolîk û binyadger wusa qebûl dikin ku mekan di nav hilberînek sembolîk de pêk hatiye û wateya mekanî di nav vê dinyaya sembolîk de digerin. Qada psîkolojîk têgeha mekanî di çêbûna nasnameyê de wek hêmaneke qebûl

dike û aliyê wî yê çandî-civakî derdixe pêş. Xebatên fenomenolojîk ji îdealîzekirina mekanî dûr disekinin û têgeha mekanî bi hebûnê re dinirxînin (Solak, 2017: 15).

Wateyên ku bi saya sembolan tên veguhastin, çand û nirxên hevpar a civaka ku takekes têde dijî nîşan dide. Her cure tevgerê mirov yê hestiyar di encama tecrubeyên jiyanê de dertê holê û li ser pêvajoya îdraqkirinê bandor çêdike. Îdraqa mekanî asta agahiyên mirov li ser taybetiyên fîzîkî a mekanî diyar dike. Bi vê awayî îdraqa mekanî li ser nirxandina nasnameyê xwedî rol e. Bi awayê gelemper aîdiyet bi wê wateyê ye ku nîşan dide mirov ji ku tê, ji ku ye, ji kî ye û hwd. Aîdiyet ew tişt e ku mirov xwe di nav civakê de çawa bi cih dike. Her çiqas civak ji bo takekes nasnameyek diyar bike jî dema ku takekes xwe aîdê wê nasnameyê hîs nekir nabe xwediyê wê nasnameyê. Hesta aîdiyetê, bi girêdayîna cih û mekanî û di encama hêman û yekîtiyên dem, bîranîn, serpêhatî, têkiliyên civakî, hewceyiyên psiko-sosyal, nasname, sîmge û sembolan pêk tê. Mekanên ku bi hesta xwedîderketinê li hember xetereyên fîzîkî û psîkolojîk tên parastin ji aliyê aîdiyeta şexsî ve mekanên parastî ne. Mirov hem cihên xwe yên şexsî wek mal û derdor hem jî bi wateya xwe a berfireh mekanên ku van cihan dihewîne diparêzin. Nasname ji bo pêkanîna takekesiyê yek ji hêmanên girîng e. Avakirina mekanên ewle an jî guncav wê derfetê dide takekes ku ji xwe re nasnameyê biafirîne. “Mekan ji aliyê ontolojîk ve di çêkirina nirxên civakî û çandî de hêmaneke girîng e, herwiha mekan rêkûpêkiya jiyana hundirîn a mirov pêk tîne (Korkmaz ve Şahin, 2017: 7).” Yek ji hêmanên bi bandor di derbarê pêvajoya çêbûna nasnameyê de tevgerek berxwedanê yan jî bi awayek îhlalkirina mekanî ye. Mekan dema ku ji aliyê “yên din” ve rastî êrişê hat, nasname û çand jî di bin vê xetereyê de dimîne. Li ser mekanê her tim rewşa bûyînê dewam dike, hilberînên civakî û îdeolojîk hem tên afirandin hem tên xirabkirin. Em dikarin bibêjin ku wek dem mekanên berê, niha û dema bê di nav hev de dijîn. Mudaxeleyên me a li ser van mekanan mudaxeleya li rabirdûyê ye, gelek caran em bi xirabkirina mekanên berê çand û nasnameyên berê jî ji holê radikin û di cihê wan de nasnameyên nû datînin.

# BEŞA DUYEMÎN

# DI ROMANÊ DE MEKAN

## 2.1. MEKAN Û ROMAN

Mekan di berhemên edebî de yek ji hêmanên eslî ye. Mekanên berhemên edebî ji mekanên jiyana rastî bandor bigirin jî ew sêwirandî ne. Ji ber vê yekê di berhemên edebî de hêmana mekanî jî wek hêmanên din li gor daxwaza nivîskar şikil digire. Wek ku Murat Lüleci diyar dike: “Mekanê romanê û mekanên dinyaya derve bêguman yek nîne (Lüleci, 2017: 21).” Di berheman de em dibînin ku li gor cure û naverokê mekan erkên cuda digirin ser xwe. Li gor niyeta nivîskar mekanên girtî û vekirî tên bikaranîn. Li gel romanê divê em berê xwe bidin cureyên din jî. Dema em li çîrok û destanan dinêrin em baştir vê zimanê mîmariyê dibînin ku nivîskar ango vebêjer çawa roleke mîmariyê digirin ser xwe. Di van cure berheman de ew mekanên ecêb, tirsnak, xeternak, muphem, tevlêhev li gor xeyala kesê di rola vebêjer de tê honandin. Di gelemperiya berhemên pêş-romanê de mekan dibe qada îmtihanê ji bo serleheng; lazim e ku ew ji wan mekanên xeternak derbas be ango xilas be û bigihêje mekanê armanckirî. Li gor me di cureyên honakê de bi qasî bûyer û têkiliyên lehengan mekan bi xwe jî xwedî roleke girîng e. Elbet di hemû berheman de mekan bi heman fonksiyonê nîne, di destan û çîrokan de zêde xeyalî bi gotineke din razber; lê di cureyên modern de zêdetir nêzikê rastiyê ye. Cudatiya herî berbiçav a di navbera mekanên çîrokan û cureyên modern de ew e ku di berhemên modern de mekan xwedî psîkolojiyê ye û leheng ji vê yekê tesîr digirin. Ramazan Korkmaz û Veysel Şahin di xebata xwe de li ser vê yekê wiha dibêjin:

> Di cureyên vegotinê de mekan honakî ye û li gor dîtin, fehmkirin û rewşa derûnî a kesên ku têde dijîn şikil digire; her tim ji nû ve tê afirandin, şêwe digire û wek hêmaneke sereke li wan kesên ku li ser dijîn bandor dihêle û wan ji bo rewşên psîkolojîk amade dike (Korkmaz û Şahin, 2017: 10).

Mekanên di romanan de li ser rûyê dinyayê tu wext çênebûne. Nivîskar wan mekanan bi awayekî xeyalî bi hêza ziman dihone. Ji vê şîroveyê em digihêjin xaleke girîng, herçend mekanên di berhemên edebî de ji me re gelek nas bin jî ew di encamê de bi peyvan hatine avakirin û yê ku wan mekanan afirandiye xeyalên nivîskar e. Fatih Tepebaşılı di xebata xwe ya li ser romanê de balê dikêşe mekanên berhemên edebî:

“Mekanên ku di berhemên edebî de tên afirandin modeleke dinyayê ne ku bi derfetên ziman hatine sêwirandin (Tepebaşılı, 2012: 70).” Li gor me di vir de xetereyeke heye ji bo xwendevan. Dema ku xwendevan mekanên ku jê re nas tê wek rastî qebûl bike û xeyalîbûna wan ji bîr bike ewçax taybetiya eslî a berhem û edebiyatê wenda dike. Bi gotineke din ji bîr dike ku metin di encama xeyalkirinê de û bi derfetên ziman tê honandin. Dema ku xwendevan hêmana mekanî wek rastî qebûl bike êdî nikare bikeve nav atmosfera xeyalî a berhemê. Bikaranîna mekanî di romanan de ji cureyên din pêşdetir e. Herwiha armanc û erkên mekanî li gor bûyerên romanê diguhere. Afirandina mekanan hem hesta rastîbûnê dide berhemê hem jî dikare rastî û xeyalê di nav hev de bihone. Mehmet Tekin di romanan de armancên bikaranîna hêmana mekanî wiha diyar dike:

> Romannivîs hêmana mekanî;
>
> a) Ji bo danasîna derdora ku bûyer lê pêk tê
> b) Ji bo xêzkirina lehengên romanê
> c) Ji bo nîşandayîna civakê
> d) Ji bo çêkirina atmosferê
>
> bikar tîne. Di vegotinê de ji van taybetiyan ji yek yan jî çend heban bi hev re dikare îstifade bike. Di bingeha van hemûyan de endîşeya ‘rastî nîşandana’ bûyeran heye (Tekin, 2010: 143).

Roman ji aliyê kesekî ve tê afirandin lê mekan ji aliyê gelek kesên ku li ser dijîn ve tê afirandin. Şîroveya mekanên romanê li gel wî kesê ku dinivîse veşartî ye. Ji aliyê din ve ew mekanên fîzîkî ku mirov li ser dijîn ji bo her şexsekî şop û şîroveyên kesên beriya xwe îfade dike. Hemû nivîskar ji çîrokê heta helbestê, ji helbestê heta romanê di hemû cureyên nivîsê de bi saya peyvê mekanan saz dikin. Di çîrokek yan jî romaneke de dema ku mekanekî bi taybetiyên xwe yên hundirîn yan jî derve ve tê vegotin em dikarin bêjin ku ev metin êdî berhemeke mîmarî û xeyalî ye. Tenê armanca hebûna wî mekanî bikaranîna peyvên nivîskar e. Xwendekar, di rûpelên ku dixwîne de dizane ku ew qesr, koşk û odeyên ku tên vegotin di rastiyê de tunene. Xwendekar lazim e hayîdar be ku ew mekan tenê bi saya nivîskar û zimanî hene. Lê dîsa jî eger ku em behsa nivîskar û berhemeke baş bikin, xwendekar nikare xwe ji bin bandora wan mekanên

xeyalî xilas bike. Nivîskar bi saya ziman mîmariyek diafirîne. Li ser vê têkiliyê Gürhan Tümer wiha dibêje:

> Eger ku em wusa qebûl bikin ku her cure berhemên nivîskî mirov û têkiliyên mirov yê derdora wî vedibêje, ewçax em dikarin bibêjin ku nivîskar li kêleka nivîskariya xwe heta asteke karê mîmariyê jî dike. Ev, mîmariyeke zimanî-xeyalî ye ku tekane amûrê wê ziman e (Tümer, 1995. neqil, Demirkaya, 1991: 55).

Di berhemên edebî de xwendevan guherîn û hîssiyata mekanî dijî û di hişê xwe de diparêze; lê mekanên mîmarî yên jiyana rastî ne tenê di hiş de herwiha bi awayê fîzîkî jî diguherin. Di cureyên beriya romanê de em dibînin ku leheng û bûyer di navenda metnê de ne, lê belê di romanan de em dibînin ku mekan û hêmanên mekanî li ser leheng û bûyeran bandor çêdikin. Ji bo nîşandayîna cudahiyên navbera van cureyan de em dikarin li ser mekanên destan û çîrokan rawestin.

Em dikarin bibêjin di destanan de a girîng tenê bûyer û qewimîna wê ye. Di destanan de mekan tenê bi wateya sehneyê ye. Ligel vê mekan, tenê di formên derasayî yê bûyeran de derdikeve holê. Mekanên di destanan de yekawe ye û bêsînor e. Di çîrokan de jî mekan tenê wek hêmaneke xeyalî dertê pêşiya me û wek destanan tenê di erka sehneyê de ye. Di van cureyan de derbasbûna di navbera mekanan de girêdayî bûyeran seyr, zehf zû pêk tê. Di çîrokan de tenê bûyer û leheng li pêş in û wek hêmanên din mekan jî hûrgiliyeke negirîng e. Wek cure di metnên beriya romanê de mekan di jiyana lehengan de cihekî girîng nagire. Mekan di van cureyan de tenê wek qadeke ku li ser tê jiyîn û carna jî wek asteng tê dîtin dertê pêş. Ji bo çîrok û destanan mekan wek hêman piştgiriyeke xurt nade honakê. Cureyên pêşiya romanê ku zêdetir wek bûyer-navendî ne û bêyî xema hunerî tenê bi armanca bandorkirinê dertên pêş, em di wan de têkiliya di navbera nesne û mirovan de nabînin. Ev têkilî û hûrgiliyên di navbera mekan, nesne û mirovan de wek cure di romanê de tên bikaranîn.

Roman diyardeyeke bajarî ye. Bajarîbûn xwedî şêweyeke diyar a jiyanê ye. Mînak di hişmendiya bajariyan de mekan parçe parçe ye lê di jiyana gundan de wek blok e (Şengül, 2010: 531). Dema ku em li jiyana gund û bajêr dinhêrin dixuyê ku ji hev tesîr digirin. Wek mînak koçkirin çûyîneke fîzîkî ji gund ber bi bajêr ve îfade dike. Bereksê

vê ji bajêr ber bi gund ve jî hesteke nostaljîk tê dîtin. Di navbera van de tevgereke domdar û bihereket heye. Bajar her tim di nav liv û tevgerê, herwiha guherînê de ye. Mekan wek nûnerê qada civakî di romanê de bûyer û geşedanan pêş dixe. Leheng ligel têkiliyên xwe yên derdor û civakê dertên pêş. Di romanan de mekanên bajêr û gundan ji aliyê taybetiyên civakî ve bi gelemperî bereksê hev in.

Mekanên di romanan de rasterast nikarin mekanên jiyana rastî nîşan bidin, tenê dikarin nûnertiya vê yekê bikin. Heta îro romaneke bê hêmanên mekanî hatibe nivîsîn tunene, ev jî giringiya mekanê a di romanê de nîşan dide. Roman guherîna mekanan a di nav demê de hem ji aliyê fîzîkî hem jî ji aliyê fikrî ve nîşan dide. Mekan hem rewşa serdemê hem jî rewşa civakî a wê demê nîşan dide, herwiha hem jiyana rastî hem jî jiyana sêwirandî radipêçê.

Romannivîs dixwaze hêmana mekanî zêdetir nêzikê rastiyê bike. Di honakê de mekan hêmana bingehîn e ku bala xwîneran dikêşe ser dinyaya rasteqîn. Bi saya hêmana mekanî dinyaya honakî şênber dibe. Mekanên şênber di romanê de wek mekanên jiyana rastî ne. Leheng jiyaneke asayî li ser van mekanan dijîn. Heman mekan dibe ku ji aliyê nivîskaran ve bi şikil û wateyên cuda bêne bikaranîn. Wate û nirxandina mekanî bi heman awayî li ser nivîskar cuda û li ser xwîneran jî cuda pêk tê. Hêmana mekanî nivîskarekî bi wateya bextewariyê bi kar bîne nivîskarekî din jî dikare bi wateya tirs û xofê an jî xemgîniyê bikar bîne.

Di romanên bûyer-navendî de mekan xwedî berfirehiyê ye. Bi awayên cuda berfireh dibe û bi vê yekê re bûyer û têkiliyên cuda pêk tên. Hêmana mekanî di beş ango romanên ku xwedî giraniyeke psîkolojîk in de teng dibe. Bi qasî ku teng dibe ewqas jî dibe xwedî kûrahiyê. Carna jî li gor rewşa derûnî a lehengan mekanên sabît dertên ber me. Di van mekanan de leheng di tenêtiyê de ye.

Nivîskar di hinek cihan de dikare mekanê wek nasnameyek sembolîk derxe pêş. Mekanên di romanan de ji aliyê tesîrkirina li ser xwendevan ve jî xwedî wate û bingehên sembolîk in. Şengül di xebata xwe de vê sembolîzmê wiha diyar dike:

> (…) hêmanên wek çiya û behr sîmgeyê cudatiyê ne. Mekan hem ji bo cudabûn hem jî ji bo gihiştinê yek ji hêmanên bingehîn e. Çi tesadûfî çi bi zanatî rasthatin ango hevnaskirina lehengên

romanan hemû li ser hêmana mekanî pêk tên (Şengül, 2010: 531).

Di romanê de mekan bi şiklên cuda dertê holê û heta wateya berhemê bê fehmkirin jî wateyên cuda digire ser xwe. Di romanê de jî mekan hem lehengan diguherîne hem jî leheng li ser mekanî xwedî bandora guherandinê ne. Bikaranîna hêmana mekanî a di berhemên edebî de mekanên alternatîf diafirîne. Xwendevan mekanên sêwirandî a romanan di xeyalê xwe de ji nû ve disêwirînin.

### 2.1.1. Di Romanên Kurdî de Mekan

Edebiyata Kurdî a modern xwedî dîrokeke nêz e. Em dikarin bêjin ku cureyên edebiyata modern a Kurdî di nav pêşketinê de ne. Di salên dawî de di edebiyata Kurdî a modern de ji aliyê berhemên wek çîrok, helbest û romanê de hem ji aliyê hêjmarê hem ji aliyê naverokê ve pêşketinek heye. Bi vê pêşketin û kemilînê ve xwînerên Kurdî derfeta muqayeseya berheman peydakirin. Li gor hêjmara berheman û pirdengiya naverokê xebatên rexneyî a li ser berheman jî hêdî hêdî zêde dibe. Di van xebatên rexneyî de roman, helbest û çîrokên Kurdî ji aliyê rêbazên nivîsînê, naverok û hêmanên din ve tên nirxandin.

Em dikarin bibêjin ku roman wek cureyeke edebiyata modern li Rojava dertê holê. Roman di serdemên neteweperweriyê de ji bo vegotin û honakên netewî dibe yek ji amûrên girîng. Bêguman dîroka romanê a her netewê cuda ye. Roman wek cureyeke edebiyata modern ji aliyê dem, mekan, leheng, bûyer, vebêjer û rêbazên nivîsînê ve tê nirxandin. Tehlîlkirina romanan bi awayek piralî derfeta naskirina civakan dide me. Lewra roman di pêvajoya çêbûna neteweyan de wek amûreke ragihandinê hatiye bikaranîn. Em dikarin bibêjin ku di romanan de şîrovekirina her hêmanê fikreke cuda dide me. Em ê di vê beşê de hem li ser romana Kurdî hem li ser bikaranîna hêmana mekanî a di romana Kurdî de rawestin.

Beriya rewşa romanê lazim e derheqê edebiyata Kurdî de em pêşî behsa alfabeyan bikin. Pirsgirêka alfabeyê a edebiyata Kurdî ku ji alfabeyên Latînî, Kirîlî û tîpên Erebî pêk tê, rê li ber pirsgirêka qutbûyînê vekiriye. Edebiyata Kurdî ji ber zêdebûna alfabeyan ji aliyê edebî ve rastî qutbûyînê tê. Di netîceya vê yekê de her alfabeyek di nav xwe de dîroka cureyên edebî diyar dike. Ji ber vê yekê li ser berhemên yekemîn cudatî û nîqaş hene.

Agahiyên di destê me de dîroka romana Kurdî (Kurmancî) ji salên 1935î ve didin dest pê kirin. Romanên Kurdî yên ewil ji aliyê nivîskarên edebiyata Sovyetê ve tên nivîsîn. Romana ewil a Kurdî wek *Şivanê Kurmanca* (1935) tê qebûlkirin ku nivîskarê wê Erebê Şemo ye. Helîm Yûsîv di xebata xwe a li ser romana Kurdî de di qonaxa ewil a romana Kurdî de van navan rêz dike:

> Di navbera salên 1930yî heta 1980'an navên tên beramberî me ev in: Erebê Şemo, Rehîmê Qazî (*Pêşmerge-1960*) û Îbrahîm Ehmed (*Jana Gel-1956*). Her wisa romanên Eliyê Evdirehman, *Xatê* (1959) û *Gundê Mêrxasan* (1958) û romana Heciyê Cindî *Hewarî* (1967) di wan salan de li Yêrîvanê-Ermenistanê hatin weşandin. (Yûsiv, 2011: 10-11)

Romanên Kurdî yên destpêkê nûnerê bizava realîzma civakî ne. Romanên ewil li ser pirsgirêkên civakî bi zimaneke herikbar hatine nivîsîn. Li gel vê bandora sosyalîzmê, îdealên civakî û şoreş jî wek mijar di romanên destpêkê de tên dîtin. Piştî romanên edebiyata sovyetê em romanên nivîskarên diyasporayê dibînin. Ji qonaxa edebiyata Sovyetê cudatir em dikarin bibêjin ku berhemên nivîskarên diyasporayê ji aliyê rêbazên nivîsînê ve cudatir e. Li gel vê ji aliyê mijarên berheman ve jî em nêzikahiyek dibînin. Di her du qonaxan de jî mijarên li ser rewşa welat, pirsgirêkên civakî, feodalî, modernbûn, hest û îdealên netewî derdikevin pêş.

Helîm Yûsiv di xebata xwe ya li ser romana Kurdî de romannivîsên salên navbera 1980 û 1990î wek "pir" îfade dike. Di navbera van salan de navê van romannivîsan rêz dike: "Sihîdê Îbo, Birîndar, Xemgînê Temê, Mahmûd Baksî, Mehmed Uzun, Egîdê Xudo, Bavê Nazê, Şahînê Soreklî, Nûrî Şemdîn û Nacî Kutlay (Yûsiv, 2011: 15)." Di tarîxên ku romanên Kurdî yên ewil dihatin nivîsandin de li seranserê dinyayê şer û şoreş diqewimîn. Ji ber vê yekê di van romanan de bandora fikrên îdeolojîk dertê pêş. Li gel vê roman wek amûreke propagandayê dihat dîtin. Di navbera gel û îdeolojiyan de roman wek "pir" dihat bikaranîn.

Piştî salên nodî hêjmara nivîskaran û romanên Kurdî zêdetir bû. Ji salên nodî û heta îro em navên wek; Medenî Ferho, Lokman Polat, Xurşîd Mîrzengî, Silêman Demîr, Bûbê Eser, Mistefa Aydogan, Laleş Qaso, Helîm Yûsiv, Îbrahîm Seydo Aydogan, Remezan Alan, Adil Zozanî, Bextiyar Elî, Ciwanmerd Kulek, Hesenê Metê, Bextiyar

Elî, Lokman Ayebe, Jan Dost, Şener Özmen, Newaf Mîro, Dilawer Zeraq, Cîhan Roj û gelek nivîskarên din dibînin. Ji salên 2000î û vir de bi naskirina romana dinyayê re di romana Kurdî de pêşketin pêk tê.

Ji destpêkê heta îro jî bi gelemperî edebiyata Kurdî a modern bi taybet jî romana Kurdî di xizmeta siyaseta Kurdan de bû. Herçend di salên dawî de mijarên xeyn ji netew û siyasetê bi rêbaz û honakên nû hatibin nivîsîn jî nivîskarên Kurd bi gelemperî li ser heman şopê roman nivîsîne. Di edebiyata Kurdî de nivîsîna mijarên netewî -ji ber rewşa mewcûd-wek berpirsiyariya nivîskar a li hember civakê dertê pêş. Mihemed Dehsuwar di hevpeyvîna xwe de li ser vê mijarê wiha dibêje:

> (…) Her netewe li gorî rewşa xwe di gelek periyod û merheleyan de derbas dibe û kalîteya edebiyata wê demê jî, li gora wê periyodê ye. Romana Kurdî jî li gora neteweyê Kurd û pêşveçûna gelê Kurd şikil dide xwe. Tevî vê jî dê gelek xetên romana Kurdî hebin. Dê xeta realîst, surrealîst, modernîst, post-modernîst û ya "rastiya civakî" hebin. Edebiyata kurdî wê roj bi roj ji hev veqete û xetên xwe eşkeretir bike. Lê wusan xuya ye ku xeta "Rastiya Civakî", ji ber ku rewşa welatê me û ya civaka me pê ve girêdayî ye, dê mohra xwe li vê periyodê bixe. (Polat, 1996: 67).

Rewşa civakî a Kurdan bû sedem ku gelek nivîskar û rewşenbîr sirgûn bibin. Di encama vê rewşê de nivîskariya sirgûnê (diyaspora) wek qonaxeke edebiyata Kurdî derket holê. Nivîskarên sirgûn li ser rewşa welat, hesreta welat, şerê azadiyê, hişyarbûn, derûniya welat, bajarîbûn û gundewariyê roman û berhemên din honandin. Nivîskarên sirgûnê ango diyasporayê di qada çand, huner û edebiyatê de bêhtir afirîner in. Bi gotina Calhoun ku di hevpeyvîna xwe ya bi Barzoo Eliassi de dibêje: "Mirovên diyasporayê ji yên li welêt bêtir muhafezekar in derbarê çanda neteweyî de (Eliassi, 2014: 21)." Ji bo Kurdî em vê afirandin û muhafezekariyê di qada cureyên edebî de dibînin.

Li Tirkiyê salên 1990î wek salên alozî, şer û pevçûnê tê zanîn. Di van salan de xebitîn û pêşvebirina karên rewşenbirî li welat mimkun nebû, an jî ev derfet kêm bû. Nivîskarên sirgûn rewşa xwe a sirgûniyê wek avantaj bikaranîn û li xerîbiyê li ser cureyên edebiyata Kurdî a modern xebitîn. Nivîskarên Kurd di boxçika xwe de ziman û

çandeke birin welatê xerîbiyê û bingeha edebiyata modern a Kurdî avakirin. Remezan Alan rewşa diyasporaya Kurdî wiha diyar dike:

> Piştî darbeya 12ê Îlona 1980an vê carê Awrûpa, xasma Swêd mîna mekanekî dîyasporayê ji edebîyata kurdî re bûye dergûş. Mehmed Uzun, Hesenê Metê, Laleş Qaso, Firat Ceweri, Mahmut Baksî, Rojen Barnas mînakên wê dewrê ne. Van salên dawîn du kurdên Kurdistana Sûrîyê, Jan Dost û Helîm Yûsiv jî berê xwe dane Almanyayê. Dema mirov dibîne ku bi îltîcayê re ev nivîskar, bi awayekî seqamgîr û rêkûpêk di warê romanê de hûr û kûr dibin, mirov çêtir fêm dike ku dîyaspora ne tenê rê dide nivîskaran ku bi hafizeyeka zindî ya kolektîf binivîsin an ji bo nasnameyeka pêpeskirî warên derbirînê vekin, di heman demê de dîyaspora ji bo wan şertên guncav ên romannûsînê jî (wekî "derdoreka ewle" û "wextekî berfireh") dabîn dikin. (Alan, 2019: 13)

Em dibînin ku di salên dawî de romanên Kurdî zêdetir bûne. Lê belê dîsa jî li gor romana Ewropî û yên cînar em dikarin bibêjin ku romana Kurdî hêj di destpêkê de ye.

Roman û edebiyata Kurdî bi tekoşîna şerê welat re yek dihat dîtin. Ji ber vê yekê armanca ewil a nivîsînê danasîna şer û rizgariyê bû. Bi gotina Nuri Fırat: "Edebiyata Kurdî bi tekoşîna polîtîk a Kurdan re bi awayek "mecbûrî" têkildar e, herwiha li hember pratîkên tepisandinê jî di nav tekoşîna "rizgariya netewî" de rola "îspata hebûnê" û "înşaya netewî" digire ser xwe (Fırat, 2012: 440)." Îro bi saya kovar, gotar û xebatên din rexneya li ser edebiyata Kurdî zêdetir e. Ev yek di qelîteya berheman de bêguman pêşketinê pêk tîne. Ligel vê asta xwendina Kurdî zêdetir e, di heman demê de asta xwendina edebiyatên cînar û a dinyayê jî zêdetir e. Bi vê yekê re romana Kurdî heta astek ji çerxa siyasetê dûr ket. Herwiha bi dûrketina siyasetê re di romana Kurdî de endîşeyên estetîk bêhtir derketin pêş.

Roman li dinyayê bi gelemperî li ser destan, mîtolojî, bawerî çandên devkî pêş dikeve û bi vê awayê netewîbûna xwe bidest dixe. Divê em diyar bikin ku romana Kurdî jî ji edebiyata Kurdî a devkî bandor bigire. Destan, mît û çîrokên Kurdî ji aliyê romannivîsan ve di forma romanê de bi hest û fikrên netewî ji nû ve hatin nivîsîn. Em

dikarin destanên wek “Kela Dimdimê”, “Kerr û Kulîlk” (Di romana *Bilîcan* a Perwîz Cîhanî de ev destan hatiye bikaranîn) ku îro di formên romanê de hatine nivîsîn mînak bidin. Ligel vê ji aliyê vegotinê ve jî em rastî şêweya edebiyata devkî tên. Em dikarin romana Mehmed Uzun a bi navê *Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê* mînak nîşan bidin. Ev roman ji aliyê vegotin û ahengê ve di bin bandora edebiyata devkî de ye. Ligel vê yêke di roman ango edebiyata modern a Kurdî de em bi gelemperî çend mijarên sereke dibînin. Murad Celalî di xebata xwe de van mijarên sereke wiha diyar dike:

> Eger edebîyata kurdî ji hêla naveroka xwe ve bê dabeşkirin, meriv dikare bibêje ku beşa herî dewlemend ew qonax e ku di nav xwe de van mijaran dihewîne: Koç, sirgûn, şer, dîaspora û bûyerên ku ji ber wan qewimîne. Loma edebîyata kurdî ya modern wekî dîlgirtîyê bûyerên rojane û dîrokî ku ew jî ji şer, serîhildan, koç, sirgûn, dubendî û nakokîyên navxweyî pêk tên, ketîye ber pêleke dijwar ya jîyana rojane û rastîn (Celalî, 2018: 78).

Ev mijarên romana Kurdî bikaranîna hêmanên romanê jî diyar dikin. Di romanên Kurdî de em dibînin ku “welat” mekanê sereke ye. Li dû vê mekanên sirgûnê dertên pêş, bi taybet Stenbol û rojavayê Tirkiyê. Romana “*Bîra Qederê*” a Mehmed Uzun de em Stenbolê wek mekanê sirgûnê dibînin. Xeyn ji van welatên Ewropa jî wek mekanên sirgûn û diyasporayê ne di romanên Kurdî de. Herwiha Kurdên Sovyetê jî bi gelemperî li Ermenistanê ne û ev jî mekanê sirgûnê ye.

Di romanên Kurdî de mekanekî din gund û gundewarî ye. Di gelemperiya romanên Kurdî de têkiliyên civakî a gundan, paşdemayî, çand û bîr û baweriyên wan tên vegotin. Di van romanan de jiyana rojane bi zimanekî hêsan û sade tê vegotin. Romanên ku wek mekan gund dibijêrin de em dibînin lehengên îdealîst bi fikrên xwe li ser gundiyan bandor çêdikin û li ser mekanî (gund) guherînan pêk tînin. Carna em dibînin ku lehengên sereke gundiyan ji baweriyên pûç dûr dixin, carna wan îkna dikin ku tevlî tevgera azadiyê bin û lê xwedî derkevin. Em dikarin bibêjin ku di gelemperiya van romanan de gund bi awayê rexneyî tê nirxandin. Ligel van zilma dewletê a li ser gundiyan jî di van romanan de wek mijareke mekanî dertê pêş. Di romanên Kurdî de wek mekan bajar jî dîsa di peywenda xerîbî, zilm, biyanîbûn, sirgûn û dûrketinê de

dixuyê. Di romanên Kurdî de bajar cihê sazî û dezgehên dewletê ye, lehengên romanan bi wan re di nav dijberî û pevçûnê de ne.

Welatê parçebûyî a Kurdan jî dîsa di romanan de bi têgeha mekanî re têkildar e. Têkiliya bajar û lehengan bi parçeyên din a welat re di vegotina romanên Kurdî de dertê pêş. Di romanên Kurdî de welat bi wateya nasnameyê re yek tê dîtin. Ji ber vê yekê her tim li hember hêzên dijber tê parastin. Ligel vê em dibînin rewşa mewcûd a welatê Kurdan jî bi awayek netewperwer tê vegotin.

### 2.1.2. Di Romanan de Mekanên Girtî û Vekirî

Mekanên vekirî ango berfireh di romanên bûyerî de dertên ber me. Di van romanan de ji bo ku bûyer bikemilin ji bo lehengan divê qadeke hereketê a berfireh bê sazkirin. Di mekanî berfireh de di navbera lehengan de têkiliyên piralî pêk tên. Em dibînin ku di van romanan de hêjmara leheng, bûyer û mekanan zêde ne. Di romanên macera û polîsiyeyê de aksîyon hêmaneke girîng e. Ji bo çêbûn û pêşketina aksiyonê mekanên berfireh hewce ne. Em dikarin bibêjin ku mekanên vekirî bêhtir di romanên dîrokî de dertên ber me. Şengül di derheqê mekanên berfireh de wiha dibêje;

> Rihetî û derfetên ku leheng di mekanên berfireh de bidest dixe ji aliyek ve jî rê li ber vedike ku bûyer ber bi qadeke berfireh ve belav bibe. Di romanên dîrokî de honak bi gelemperî di mekanên vekirî de pêş dikeve. Di romanên dîrokî de bûyer li mekanekî dest pê dike û ber bi mekanên din ve berfireh dibe. Bûyera dîrokî a ku tê vegotin, serdem û rewşa civakî, hewceyiya erdnîgariyeke berfireh e. (Şengül, 2010: 533)

Mekanên berfireh wê derfetê dide leheng ku di nav civakê de çalak be û hebûna xwe nîşan bide. Di rewşa bereks de jî, lehengên ku ji mekanên fireh hez nekin dema ku derketin derve tevgerên şermoke û tirsonek nîşan didin û ev yek jî bi zimanê mekanî tê îfadekirin. Dijberî û tevlêheviya ku leheng di hundirê xwe de dijî eger rastê mekanekî guncav neyê ewçax dijberî kûrtir dibe. Di romanê de pêşkeşkirina mekanî li gor taybetiyên şexsî a lehengan diguhere. Dijberî an jî lihevkirina mekan û lehengan hêza romanê û bala xwîneran zindî digire. Eger pîvana dijberî û lihevkirinê di navbera mekan û lehengan de li hev neyê di nuqteya vegotina mekanî de ligel xwîner têkçûyînek pêk tîne û hêza romanê qels dike.

Ligel mekanên berfireh em mekanên girtî jî di romanan de dibînin. Mekanên girtî bêhtir di romanên derûnî de dertên ber me. Mekanên girtî bi awayekî şexsî bi takekes ve girêdayî ye. Lehengên ku bi mekanên girtî re tên teswîrkirin bi gelemperî di hundirê xwe de dijîn û di têkiliyên civakî de xwedî pirsgirêk in. Herçend mekanên vekirî tenê wek qadeke ku bûyer li ser diqewimin be û bandora wê li ser şexsiyeta lehengan zêde nebe jî mekanên girtî bereksê vê ne. Mekanên girtî di romanê de vediguherin û dibin yek ji hêmana bingehîn a honakê. Di mekanên girtî de her perçeyek, quncikek û bikaranîna wan li ser bûyer û lehengan xwedî bandor e. Di vê cureyê de em têkiliya hestiyariya lehengan û mekanî dibînin. Mekanên girtî ji bo lehengan wek labîrentê ne hem ji aliyê fîzîkî hem ji aliyê hîssiyatê ve her tim teng, girtî û piçûk in. Vekirîbûn, firehbûn, girtîbûn û tengbûna mekanî li gor rewşa hestên lehengan diguhere. Ramazan Korkmaz û Veysel Şahin di xebata xwe de vê rewşê wiha diyar dikin:

> (…) Bi wateya fîzîkî daristan, çol, yan jî behr her tim ji bo mekanên vekirî û fireh nabin mînak. Daristan, ji bo zarokek ku winda bûye, çol ji bo seyyahek ku ji komê qetiyaye, qada şer ji bo serbazek têkçûyî; ji aliye îdraqê ve mekanên fireh û vekirî nîne, ev mekan êdî ji bo wan wek labîrent in. (Korkmaz ve Şahin, 2017: 14)

Leheng di mekanên girtî de bêhtir tenê û hestiyar in. Di romanan de em ji ser vê yekê ve dikarin di derheqê lehengan û jiyana wan a hundirîn de şîroveyan bikin. Rewşa giyanî a lehengan, fikir û hestên wan yê li hember kes û bûyeran di teswîrên romanê de xwe nîşan dide. Di romanên Kurdî de em welatên sirgûnê ji aliyê hestiyarî û giyanî ve wek mekanên teng/girtî dibînin. Lewra leheng her tim di nav hesreta welat de ne û çanda xerîbiyê ji aliyê fikrî ve li ser takekesiya lehengan bandoreke neyênî çêdike. Ligel vê di romanên Kurdî de wek mekan "welat" berfireh e û leheng dixwaze xwe bigihîne wir. Welat ji bo lehengên romana Kurdî, ji ber rewşa polîtîk hem teng e, ji ber ku mekanê nasnameyê ye jî berfireh û vekirî ye.

### 2.1.3. Di Romanan de Mekanên Razber

Mekanên razber di romanan de bi xeyal, bêrikirin, hêvî û baweriyên dînî yê leheng re dertên holê. Ev mekan bi pîvanên ûtopîk, fantastîk û metafîzîk têne nirxandin. Problemên ku leheng rastî wan tê ê leheng dikin nav bêçaretiyê. Di vê nuqteyê de

leheng ‘welatekî xeyalî’ a bêpirsgirêk xeyal dike. Leheng di wê dinyayê de rastê wan dijberî û pirsgirêkên dinyaya rastî nayên. Di wê mekanê xeyalî de her tişt wek ku xeyal dike pêk tê. Ev cih ûtopîk e. Eger xwîner jî di jiyana xwe de rastê heman pirsgirêkên ku leheng jiyaye hatibe, di wê dinyaya xeyalî de ew jî xwe bextewar hîs dike. Em dikarin bêjin ku xwîner jî xeyalên xwe tevlî wê dinyaya honakî dike. Ev mekanên ku gelemperî bi mirovên baş û tiştên baş ve tijî ne di jiyana rastî de cih nagirin. Ev mekanên ûtopîk bi gelemperî mekanên ku mirov xwe têde pêk tînin îfade dikin.

Yek ji mekanên din ku di romanan de dertên ber me mekanên metafîzîkê ne. Ev mekan bi têgeha dînî re girêdayî ye. Mekanên wek bihuşt û dojeh ji van mekanên dînî ne ku wusa tê bawerkirin mirov piştî mirinê diçine wan mekanan. Ev mekan bi awayek mubalexeyî tên teswîrkirin. Mekanên bi vê şiklî bi gelemperî di cureyên pêş-romanê de dertên ber me. Ligel vê yekê em di romanan de jî dibînin ku nivîskar dikarin mekanên tenê xeyalî û efsûnî saz bikin.

### 2.1.4. Di Romanan de Teswîrên Mekanî

Di romanan de em bi saya teswîran nexşeya bûyeran û naverokê çêdikin. Li gor Edward Hall, “Edebiyat wek nifteyê ye ku di fêrbûna bikaranîna mekanî de alikariya me dike (Gürsel, 2010: 14).” Ziman û mekan du diyardeyên kevn in ku ji aliyê îlankirina mewcudiyeta mirov ve rabêja ‘ez ev im, li vir im’ îfade dikin. Ziman bi dema niha, dema borî û dema bê re têkilî çêdike. Mekan jî sehneya jiyînê ye. Herdu jî çanda mirovahiyê saz dikin. Nivîs jî mîmarî jî honakî ne. Nivîs û mîmarî di encama xeyal û fikran de tê sazkirin. Herdu jî wateyê neqil dikin bo bikarhêner.

Di romaneke de agahiyên derheqê leheng û mekanan de bi rêya teswîran tên vegotin. Dema ku em li gelemperiya romanan dinhêrin em dibînên ku destpêk bi teswîrên mekanî dest pê dikin. Ev yek di destpêkê de wê derfetê dide me ku em derdora ku roman lê derbas dibe û atmosfera romanê de bibin xwedî fikir. Teswîrên mekanî di derheqê tevgerên ku leheng di dahatûyê de bikin de agahiyan dide me.

Di nav bizavên edebî de teswîr û vegotinên mekanî jî diguherin. Mînak, bizava Romantîzmê gelek giringî dide hestên mirovan û hewl dide ku di berheman de mirov bi hemû taybetiyên xwe bi awayek yekgirtî bên nirxandin. Bi vê awayî bikaranîna mekanî di berheman de bûye yek ji pîvan ango cudahiya di navbera bizavên edebî de. Romannivîsên Romantîk lehengên ku di hundirê xwe de dijîn û di nav çîrokê de pasîf in

bi hêmana mekanî re di nav lihevhatinê de teswîr dikin. Ligel vê nivîskar an jî vebêjer rasterast rewşa leheng venabêjin di cihê vê de ji teswîrên mekanî sûd werdigirin. Dixwazin ku di berhemên xwe de ê mirov bi hemû taybetiyên wî nîşan bidin û zêdetir rewşa lehengan bi vegotinên teswîrî nêzîkê rastiyê bikin.

Yek ji bizavên edebî jî Realîzm e ku di sedsala 19an de derketiye holê. Di Realîzmê de mirov bi yekîtiya giyan û bedenê xwe heye, lê di naturalîzmê de mirov bêhtir bi bedena xwe heye. Bi vê awayî mirov bi mekanê ku dijî re rasterast yek tê dîtin û mirov wek berhemeke mekanê tê dîtin. Armanca van bizavên ku hemû hûrgiliyên tiştan vedibêjin ew e ku bi xwendekar re hesta rastiyê peyda bikin.

Di van bizavan de mekanên wek qumarxane, meyxane û kerxane di wateyên neyênî de ne. Ev mekan rastiyên jiyanê ne di nav honakê de gelek tên bi kar anîn. Lewra li gor wan cihên ku leheng lê dijî, tiştên ku dibîne, di derheqê civaka ku têde dijî de wek çavkaniyeke piştrasker tê dîtin. Wek ku Macit Balık jî di xebata xwe de dibêje:

> Di tesewirên li ser mekanî de paşxaneya civakî, şexsî, derûnî û dîrokî li ser awayê bikaranîna mekanî ya di berhema edebî de xwedî girîngiyê ne. Ji ber vê di nirxandina mekanên edebî de li gel aliyê wan yê honakî divê wateyên li derveyê metnê (civakî, şexsî, dîrokî û hwd.) jî bê dîtin. (Balık, 2016: 121)

Di romanên bizava Klasîk de şêweya mekanî a “statîk” bi romantîzmê re şêweyeke din digire. Nêrîna Romantîk mekanî îdealîze dike. Di berhemên wan de mekan wek cihekî ku tenê lê tê jiyîn wêdetir wek cihekî ku taybet hatiye çêkirin tê dîtin. Bi gotina Mehmet Tekin “Mekan ji bo nîşandayina hest û kelecaniyan e (Tekin, 2010: 148).” Di Realîzmê de giringiya derdora fîzîkî zêdetir dertê pêş. Di romanên Realîst de nêrîn û teswîrên li derdorê jî diguhere. Di romanên Klasîk de nêrîna li derdor bi gelemperî ji vegotina nivîskar-vebêjer tê dîtin. Ji ber vê yekê di romanên bizava Klasîk de derdor xwedî taybetiyeke ‘statîk’ e. Yanê derdor biguhere jî yê ku lê dinêre naguhere. Li hember vê yekê bizava Realîzmê rêbazeke cuda pêşxist û bi dîtina lehengên romanê li derdorê nihêrîn. Yanê cihî ku lê tê nihêrîn rewşa derûnî, çandî û civakî ya wî kesê ku dinihêre nîşan dide. Mekan li gor rewşa derûniya lehengan tê teswîrkirin, xwînerên baldar ji teswîrên bi vê rengê dikarin di derbarê bûyerên pêş de

texmînan bikin. İsmail Karaca di xebata xwe de wiha behsa vê yekê dike: “Parêzerên bizava Romantîzmê di navbera mirov û xwezayê de hinek têkiliyên xurt peyda kirine. Li gor wan lehengekî hêrs û tengizî di hewayekî bahoz de dertê derve. Lehengekî bikêf û şên jî ji hewayekî tav hez dike (Karaca, 2012: 75).” Bikaranîna mekanî a di nav romanê de di nav demê de guherî ye. Mekan pêşî herçend tenê wek sehne hatibe bikaranîn jî pişt re ji bo nîşandayîna rastiyên derûniya lehengan hatiye bikaranîn. Êdî mekan ji tewsîrên derdora fîzîkî wêdetir wek nîşaneya hest û rewşên hundirîn a lehengan tê bikaranîn.

Mirovekî bi hereketên xwe, rabûn û rûniştin, axaftin û tevgerên din tê naskirin. Li gel van cihê ku mirov lê dijî hem derve hem hundir, bi taybet awayê hundirê malê, eşya û sererastikirina nav malê jî wê derfeta naskirina kesekî dide mirov. Di navbera vegotinê de carna teswîreke herî kurt a mekanî jî dikare derheqê rewşa lehengan de agahiyan bide me. Em dikarin bêjin ku ev yek bêhtir di romanên derûnî de bi kêrî xwîneran tê. Em dikarin bibêjin ku bikaranîna mekanî li gor cureyên romanan diguhere.

Di navbera romanên dîrokî û yê ku mijara xwe ji serdemên modern digirin de ji aliyê bikaranîna mekanî ve cudahî hene. Nivîskarê romana dîrokî mekanên ku nedîtiye û çavdêriya wan nekiriye, mekanên ku di rabirdûyê de mane an jî yê ku ji rabirdûyê heta îro hatine û di xeyalê xwe de çêkiriye dixwaze li gor dema îro fehm bike. Hinek nivîskarên romanên dîrokî di berhemên xwe de hewil didin ku navên resen yê mekanên dîrokî bikar bînin, bi vê awayê dixwazin atmosfera serdema ku tê vegotin bi xwîner bidin hesandin. Ji ber mijarên ku tên vegotin, şert û mercên serdemê û zêdebûna hêmanên macerayê, ceng û seferên ku pêk hatine di romanên dîrokî de erdnîgariyeke berfireh dertê ber me. Ev yek jî dibe sedem ku nivîskar nikare mekanan li gor dilê xwe bikar bîne û di navbera mekan û lehengan de têkiliyên xurt çêbike.

Di romanên dîrokî de di navbera mekan û erdnîgariyê de jî em dibin xwedî agahiyan. Mirov ango miletên ku serhildanan pêk tînin, tevlî cengan dibin û di nav aloziyan de dijîn bi gelemperî xwedî erdnîgariyên asê ne. Bi vê awayê ew erdnîgariya dijwar li ser kesayeta lehengan û wî milletê bandor çêdike. Herwiha hêmanên erdnîgariyê yên wek çiya, çem, deşt, kanî û hwd. carna di asta lehengan de carna jî wek şahidê bûyeran tên teswîrkirin.

Carna nivîskar di derbarê bajar ango heremên ku bûyer lê diqewime de agahiyan dide. Ev agahî ji sedî sed rastiyê nîşan nedin jî dîsa xwedî bingeheke rastiyê ne. Nivîskar bi vê awayî li ser xwîneran hişmendiyekê dîrokî çêdike.

Di romanên dîrokî de mekan bi awayên diyar tên bikaranîn. Di van romanan de ji bo cengan deşt û meydan, ji bo parastin û berxwedanê kel, ji bo derbasbûna artêşan çemên dijwar an jî çiya û ji bo cihê jiyana padîşah, wezîr û kesên serdest qesr û koşk tên bikaranîn. Gelemperiya romanên dîrokî cih nadin bandora mekanî a li ser derûniya mirovan. Ligel vê di hinek romanan de ji bo pêhesandina xetere an jî tirsê wek mekan "çiya" tên bikaranîn. Li gel vê bi teswîrên koşk û qesran jî hêz û hikumraniya padişahan tê nîşandan. Herwiha bi teswîrên xwezayî jî hestên wek xemgînî, bextewarî û tirs tên vegotin. Lê belê ev teswîr gelek qels û ji rêzê ne. Herçend îstîsnayên van qaîdeyên romanên dîrokî hebin jî gelemperiya wan heman taybetiyan nîşan didin.

Xwîner dema ku romanê dixwîne di navbera mekanan de diçe û tê û her mekan xwedî ahengek cuda ne. Somer di xebata xwe de derheqê rîtma mekanan de wiha dibêje: "Yek ji hêmanên girîng yê romanê mekan, di fehmkirina metnê de alîkariya xwîner dike. Rîtma metnê li ser xwîner bandroeke mekanî dihêle (Somer, 2006: 4)." Nivîskar di romana xwe de dikare ji dinyaya rastî mekanekî bibijêre, dikarê wî biguherîne, herwiha dikare vê mekanê ji dîrokê bigire û di heyamekê ku qet çênebûye de jî bikar bîne. Yan jî dikare rasterast vê pêşniyarê bike ku nivîs an jî roman bi xwe mekan e. Di metnên Kafka de mekan wek deriyên ku di nav hev de vedibin dixuyê. Bi awayê fîzîkî herçend mimkun nebe jî di honaka çîrokên Kafka de tê vegotin.

Yek ji berhemên girîng yê li ser têkiliya mekan û edebiyatê berhema Italo Calvino a bi navê *Görünmez Kentler* e. Di vê berhemê de armanca Calvino ne ew e ku li ser mekanên sêwirandî çîrokên xwe vebêje, ew dixwaze mekanî wek serleheng derxe pêş. Calvino bajarê ku wek 'Bajarê sêyem' bi nav dike ji ûtopyayeke zêdetir e li ber çavê wî. Bajarekî wusa ye ku xwe bi xwe xwe dide înşakirin bi destê wan kesên ku lê dijîn de. Li gor Calvino ev bajêr ji hemû ûtopya û bajaran cudatir dê bibe bajarekî ku bi hemû hûrgiliyan ve bi hêza fikir û xeyalê hatiye afirandin.

Di romanan de herçend hinek bandorên mekanî yê hevpar bê dîtin jî di esasê de li ser her xwînerê bandoreke cuda çêdike. Mekan wek hêmaneke girîng di romanê de, rastiyên jiyanê nîşan dide, wan diguherîne û dide hesandin. Di romanê de mekan û

hêmanên mekanî bi saya teswîrê wek resim tên xêzkirin. Nivîskarê Îrlandî James Joyce, di derheqê berhema xwe ya navdar Ulysses de wiha dibêje: "Dema ku rojek dîmenê bajarê Dublîn ji rûyê dinyayê winda bû, dixwazim wek pirtûkeke rêber li Ulysses binêrin û bêkêmasî ji nû ve wî înşa bikin (Gürsel, 2010: 29)." Roman ji aliyê vegotinê ve giringî dide detayan. Dema ku em teswîrên mekanî dixwînin em dikarin detayên mekanên ku tên behskirin jî peyda bikin. Ev teswîr bajar û mekanên ku xwîner nedîtiye jî di hişê me de zindî dike.

Şert û mercên ku li derdorê serdest in lehengan wek enînivîs dipêçin. Leheng rasterast di bin hakimiyet û bandora derdorê de ye. A ku ji teswîra mekanê tê hêvîkirin ew e ku enînivîsa leheng a di nav civakê de tehlîl bike û vebêje.

# BEŞA SÊYEMÎN

# DI SÊ ROMANÊN KURDÎ DE MEKAN

## 3.1. MIJABAD

Romana yekem ku em dê ji aliyê hêmana mekanî ve binirxînin romana Jan Dost (bûyîn: 1965) a bi navê *Mijabad* (Dost, 2015) e. Ev romane cara ewil di sala 2004an de ji aliyê Weşanên Belkîyê ve hatiye weşandin. Mijabad ji aliyê mijarê ve romaneke dîrokî ye. Di navenda romana *Mijabad* de Komara Mahabadê heye ku di dîroka nêz a Kurdan de xwedî cihekî girîng e. Ligel vê yekê nivîskar mijar û bûyerên dîroka Kurdan ku di demên cuda de qewimîne jî tevlî romanê kiriye. Bi vê awayî roman wek panorameyeke dîrokî ye. Di vê romanê de rewşa komara Mehabadê tê vegotin; şer û pevçûnên wê demê, têkiliyên di navbera Kurdan de û rewşa siyasî a li Mehabadê tê vegotin. *Mijabad* ji pênc beşan pêk tê. Beşên romanê wek “Çira Yekem”, “Çira Duyem”, “Çira Sêyem”, “Çira Çarem” û “Tu” hatiye binavkirin.

Navê romanê rasterast navê mekanî ye. *Mijabad* ji peyvên “Mij” û “Mahabad” pêk hatiye. Ji ser vê navê ku mijê wek sembol bikar tîne meriv dikare derheqê atmosfera nav romanê de şîroveyan bike. Mij rewşeke hewayê ye ku dişibe dûyê û derdor radipêçe. Di nav mijê de derdor baş naxuyê û her tişt di navê de nediyar e. Di vir de nivîskar wek mekan Mehabadê dikêşe ser zemîneke nediyar. Dema ku em agahiyên dîrokî yên derheqê *Mijabad*ê de jî tînin bîra xwe ev agahî şîroveya me piştrast dikin. Komara Kurdistanê a ku li Mahabada Îranê di sala 1946an de hatiye avakirin û di heman salê de têkçûye, di romanê de xwedî nediyarî û aloziyan e.

Di vê romanê de em rastê şer(an) jî tên. Şerên ku bi taybet li ser erdnîgariya Kurdan di demeke nêz de qewimîne bi saya lehengên cuda tên vegotin. Şer, wek taybetiyeke eslî a romana Kurdî di vir de jî ji aliyê nirxandina mekanî a romanê ve girîng e. Wek ku Haşim Ahmedzade diyar dike: “Di romanên kurdî de armanca şer bi realîteya ku mafên kurdan û nasnameya wan, wek komek etnîk an netewî, hatiye înkar kirin, şikil digire. Di hemû romanên kurdî de nîşaneyên şerekî berdewam heye (Ahmedzade, 2011: 60).”

Em dikarin bêjin ku di romanên Kurdî de mijarên dîrokî zêde tên bikaranîn. *Mijabad* wek romaneke dîrokî ji aliyê mekanan ve tenê girêdayî cihekî nîne. Di vê romanê de emê taybetiyên mekanî a romanên dîrokî bibînin. Di vê romanê de herçend

wek mekan navend Mahabad be jî mekanên din yê ku xwedî taybetiyên dîrokî ne têde derbas dibin. Di romana *Mijabad* de mekan ji cihên piçûk yên lehengan bêhtir li ser mekanên mezin rawestiya ye. Di romanê de mekan bi gelemperî li Mahabadê, di hinek beşan de jî li Silêmaniyê û Amêdiyê derbas dibe. Di vê romanê de em rastê mekanên siyasî tên. Deverên ku bûyer lê derbas dibin ji rêzê ne. Ev mekan xwedî paşxaneyeke dîrokî û siyasî ne. Ev mekanên ku di romanê de derbas dibin xwedî taybetiyên hevpar in. Em dibînin ku ev mekan xwedî serpêhatiyên neyênî ne wek kuştin, şer, qirkirin, alozî, serdestî û bindestiyê ne. Di romanê de navê van mekanan derbas dibin.

Daristan, ode, çiya, dibistan, Mahabad, meydana Çarçira, Hekarî, Dêrsim, Amêdiyê, Kerkûk, Hewlêr, Zaxo, Dihok, Akre, Çiyayên Xezayê, Qûlqulax, Daşa Mecîd, Taşlûce, Derbendî Baziyan, Meydana Çarçira, Deşta Bazîdê, Bazîd, Xoy, kolana Kanî Aksan, Mizgewtî Şêx Selam, Miyandewab, Tewrêz Taxa Xirê, Mizgefta Ebbas Ermenistan, Rewandiz, Xarpêt, Qûlqulax, Xezayî, Daşa Mecîd, Lendî Şêxan, Qezwîn, Ormiye, Şino, Mizgefta Ebbasa, zêrzemîn, Çayxaneya Las û Xezal, Meyxaneya Agop, Merkezî Ferhengê.

Li gel Komara Mahabadê çîroka din a di vê romanê de a “Badîn” (vebêjer) e. Badîn bi têkiliyên xwe yên evîniyê di romanê de dixuyê. Lê herwiha ew di derheqê rewşa siyasî a wê demê, rewşa komarê û dinyayê de xwedî fikr e. Çîrok û serpêhatiya Badîn wek komara Mehabadê têk diçe, em dikarin bêjin lehengên vê romanê ji ber sedemên cuda têkçûyî ne. Di romanê de ji ser hêmana mekanî ve her tim hewayeke neyênî heye, lewra bûyer û serpêhatiyên lehengan jî ber bi neyêniyê ve diçin. Di romanê de lehengên serekê yên din “Jale” û “Mujde” ne ku têkiliya wan ya evîndariyê heye bi Badîn re. Xeyn ji van lehengan di romanê de “Kerîm, Emîral Axa, Hisenê Dêrsimî, Agopê Ermen, Ûnis, Remo, Menaf Kerimi, Nûbar Nalbendiyan” hene.

Di romanên dîrokî de mekan zêdetir bi awayê fîzîkî tê teswîrkirin. Sedemê vê yekê ew e ku romanên dîrokî de bûyer-navendî ne. Bûyerên wek ceng û şer di mekanên vekirî de û li ser erdnîgariyeke berfireh diqewimin. Ji ber vê di romanên dîrokî de bi awayê romanên derûnî tesîra mekanî a li ser lehengan yan qet nayê vegotin yan jî gelek kêm tê behskirin. Li gel vê di romanên dîrokî de mekan hêmaneke siyasî ye. Ji şexsan bêhtir têkiliya civak û mekanê heye di van romanan de. Mekanên siyasî bi millet û

serpêhatiya wan a dîrokî re têkildar e. Servet Karabağ jî di xebata xwe ya li ser mekanên siyasî de wiha pênaseya mekanên siyasî dike:

> Bi taybet dewleta modern, yanê netew-dewlet her cihê kiriye xwedî parsel. Bi vê awayê mirov bi armanca siyasî derdora xwezayî parsel kiriye û girêdayî vê yekê rêxistinên li ser mekanî wek dewlet derketine holê. Em dikarin vê pêvajoyê wek "siyasîbûna mekanî" binirxînin. (Karabağ, 2006: 3).

Di romanên dîrokî de mekanên xwezayî û mekanên niştecihbûnê wek du cure dertên pêş. Mekanên xwezayî wek çiya, deşt, zozan, çol, çem, girav û hwd. dixuyên. Mekanên niştecihbûnê jî em dikarin di nav xwe de wek mekanên vekirî û girtî veqetînin. "Mekanên vekirî wek kel, meydan, baxçe û pir in. Mekanên girtî jî wek qesir, koşk, mizgeft, medrese, goristan, dêr, meyxane, qehwexane, zindan, aş tên dîtin (Karaca, 2012: 79)." Ev mekan di romanan de bi gelemperî di heman erk û wateyan de tên bikaranîn. Roman bi gelemperî bi teswîr an jî danasîna mekanekî dest pê dikin. Di romana *Mijabad* de jî di destpêkê de behsa jidayikbûna Badîn tê kirin, teswîra odeya ku lê hatiye dinyayê wiha ye: "Ez di odeyeke rût de ji dayik bûm. Bi dîwarê li ber serê min ve, tenê tivingek û Quran'ek daliqandî bûn (Dost, 2015: 14)." Di vê teswîrê de mekan ji aliyê temsîla civakî ve bi awayek xurt hatiye bikaranîn. Ev teswîra kurt dikare di derheqê jiyana leheng de agahiyan bide me. Vebêjer di odeyê de balê dikêşe ser "Quran" û "tivingê". Em dikarin bibêjin li gor wateyên kevneşopî Qur'an aliyê mihafizekar û dînî, tiving jî şer, kuştin û mêrxasiyê herwiha wateyên neyênî jî îfade dike. Bi teswîreke wiha em dikarin di derheqê malbat û civaka ku vebêjer lê hatiye dinê jî şîroveyan bikin. Belasebeb nîne ku behsa tiving û Qur'anê dike hêj di destpêkê de; lewra em di berdewamiya romanê de rastê şer, tevlêhevî û aloziyan tên. Di dewama teswîra jor de hatina dinyayê a vebêjer bi van teswîrên mekanî dewam dike:

> Nîvê Şevê derbas bûbû, stêrkan bi tariyê re şerekî bêdeng dikirin. Roniyeke xemgîn ji stêrkan diniqutî. Pîrika min sond dixwar: "Bi serê Şêx Behadîn, te digot ku wê qiyamet rabe. Dengê tivingan heta sibehê ji guhê me neket, kesî nizanibû ew deng ji kû tê? Diya te Hamêst bi bi çavên lal li dîwarên rût

> dinihêrî. (…) bi dengê yekî di binê bîreke ziwa de (…) Wê katê bavê te li Derbendî Baziyan şer dikir. (14)

Teswîrên mekanî di çêkirina atmosferê de girîng in. Di van hevokên jor de teswîr bi alozî, tevlêhevî û şerê re eleqedar e, ev yek xwîneran bo berdewamiya romanê amade dike. Em ji van teswîran fehm dikin ku di romanê de dê atmosfereke bi vê rengê berdewam bike. Odeya ku vebêjer lê hatiye dinyayê, di dema welidînê de zehmetiya ku dayika vebêjer dikêşe, bi şibandinên mekanî wek; "binê bîreke" hatiye vegotin. "Bîr" wek mekan ku xwedî wateyên dewlemend û metaforîk e bi awayê bêbinîbûn, tarî, tenha û zehmetiyê hatiye bikaranîn û di vir de atmosferê xurttir dike. Wek hêmaneke mekanî "dîwar" jî dîsa bi heman wateyên tenêtî, zorî û zehmetiyê dertê pêş. Wek mekan şeva jidayikbûna Badîn bi teswîrên tîr ku li ser xwîner bandor bihêle tê vegotin: "Doşek û palgeh di xwînê de man. Rûyê diya te bûbû weke quşûfê, te kulmek zaferan tê bida wisa zer nedibû. (…) Ew çi şev bû kurê min? Wisa xemgîn bû weke ku şahî ji dinyayê reviya be (14)."

Ji bo diyarkirina zehmetiyên hatina dinê a vebêjer li jor me dît ku mekan ji bo çêkirina vê atmosferê bi teswîrên dijwariyê re eleqedar hatiye vegotin. Lê hêman û teswîrên mekanî di vegotina erênî de jî xwedî rol in. Wek mînak piştê ku zarok tê dinê vebêjer hêmanên erênî a mekanî ji bo dayîna mizgîniyê wiha bikar tîne: "Bi qêrîna mizgînê re stêrka sibê lerizî û di nav şewqa rojê de winda bû (14)." Li vir jî hêmanên wek "şewq" û "roj" ku bi ronahiya mekanî re eleqedar in dertên pêş. Di heman rûpelê de hem bi awayên neyênî hem jî bi awayên erênî hêmanên mekanî hatine bikaranîn.

Leheng, di asta bîranîn û serpêhatiyên xwe de ji cihê ku dijîn yan hez dikin yan jî nefret dikin û dikevin nav tevgera dûrketinê. Di romana *Mijabad* de gelek caran taybetiyên mekanî ji bo xurtkirina vegotinê bi awayê şibandinê hatiye vegotin. Vebêjerê romanê Badîn gelek caran di şibandinên cuda de hêmanên mekanî vedibêje. Em dikarin bibêjin ku rewşên hestiyariyê derheqê cihê jiyînê de dîtin û şîroveyên lehengan diguherîne. Dema ku Jale ji Bexdayê nameyek dinivîse bo Badîn em vê rewşê dibînin:

> (…) dilê min û hatina Silêmaniyê nîne, ez wê weke goristana hestan bo xwe dibînim, Bexdad bajarekî mezin e, gelek kurd lê dijîn, hin dixebitin, hin dixwînin, hin ji berê de

> malbatên wan li vir in, lê têkiliyên min bi wan re nînin, tev gundîtî bi wan re heye, serêşiyan ji mirov re çêdikin. (69)

Jale di vir de bi terkkirin û venegerîna Silêmaniyê dixwaze ji hestên xwe dûr bikeve. Em di vê mînakê de dibînin ku wek hêmaneke civakî mekan rasterast bi bîranîn û serpêhatiyên mirovan tê tijîkirin. Em dikarin bibêjin dema ku leheng li cihekî ji aliyê hestiyarî ve xwedî tecrubeyên nebaş bin, ev rewş dibe destpêka acizî û dûrketina ji wî mekanî. Vebêjer Badîn li ber neecibandina nameya ku ji Jale hatiye, hestên xwe dîsa bi şibandinên mekanî vedibêje:

"Nameyeke weke qeşayê sar, weke kevirekî ziwa û hişk, bêhest û bêdil! Nameyeke kerr weke goreke wêran, lal mîna şevên serê çiyan (71)." Di romanê de ligel navê cih û deveran bi saya şibandinê hêmanên xwezayî wek mekan gelek caran dertên ber me. Di rûpeleke din de em dibînin ku vebêjer evîndara xwe dişibîne biharê û çiyayan: "Ew biharek e li ser du lingan dimeşe, dilê min germ dike ew. (…) Awirên wê, kenê wê û axaftina wê hemî min vedijînin. Weke bayê Metîn daristanên ku di giyanê min de bêdeng mane dihejînin (15)." Em dikarin bibêjin çiyayê Metîn û daristanan ku mekanên xwezayî ne ji bo xurtkirina vegotinê bikar tîne.

Di navbera bêhn, bîranîn û mekanê de têkiliyekê heye. Bi saya bêhnê mekan şênber dibe di hişê mirov de, herwiha bi saya bêhnê bîranîn jî zindî dibin. Di romanê de em dibînin ku têkiliya bêhn û mekanî di peywendên cuda de tê vegotin. Vebêjer behsa gulekê dike ku gelek cihan tîne bîra wî:

> Ez nizanim vê sibatê wê ew gul ji kû peyda kiriye. Bi bînkirina wê gulê re Amêdiyê tev de hate bîra min: Çiyayê Gare li Berwara Jêr, Metîn, Rûbara Amêdiyê, Kela Aşeb, Medresa Qubehan, darên berrûyan, keça meta min û hevdîtinên me yên di bin kulînan de, li bêriyê, di şikeftên nêzîk de, ramûsanên me yên germ û tirsok, pîrka min û keserên wê, rûniştina wê ya her sibe û êvaran li bin dara tuyê, nifirên wê yên li osmanî û ingilîz û Tiyariyan, bi hev re weke kunemozekê di xeyalê mi de der bûn. (15)

Vebêjer ev mekan û bîranînên xweş a demeke jiyana xwe bi saya bêhna gulê îfade dike. Bêhna ku li cihekî ye di heman demê de parçeyeke ji nasnameya wî cihî ye.

Bikarhêner mekanê di hişê xwe de bi bêhna wî a taybet ve qeyd dikin. Bêhnên hevpar yên cihên cuda di bîr de heman bîranînan zindî dikin. Yek ji mînakên têkiliya bêhn û mekanê mînaka Helebçê ye. Li bajarê Helebbçê bi hezaran Kurd di ji aliyê Sedam Huseyin ve hatin kuştin, îro dema ku hersal bîranîna wan qurbaniyan tê kirin "bêhna sêvê" wek sembol tê bikaranîn. Lewra bêhna madeya kîmyewî ya ku di vê qirkirinê de hatibû bikaranîn wek bêhna sêvê bû.

Di romana Mijabad de mekan ne tenê di dema niha de, mekanên dema borî jî hatine bikaranîn. Bûyerên ku li cihên cuda derbas dibin bi saya bîranînên lehengan tên vegotin. Di romanê de bi saya lehengên Ermen – ku vêbêjer jî Ermen e- bûyerên qirkirina Ermenan jî tên vegotin. Bi vê awayê di romanê de serpêhatiyên Ermenan jî bi mekanên wan re tên vegotin. Di vir de em dibînin cihên ku demeke Ermen lê jiyane di nav demê de çawa ji bo wan bi awayek siyasî bûye cihê şer û pevçûnê. Herwiha yek ji mekanên romanê yê têkçûyî jî bi Ermanan ve têkildar e. Em vê rewşê wiha dixwînin di romanê de:

> Weke her maleke Diyarbekrê, mala bavê Remo jî çend keçikên ermeniyan hewandibûn (…) Çend rojên ku Ûnis li wir veşartî ma, çavên xwe ji keçikê nedibirrîn, di çavên wê de daristanek ji tirseke ne diyar xuyabû. (…) Dema ku Hamêst ew xeber bihîstin rûyê wê geş bû û li şopa wan daristanên ku di çavên wê de hişk bûbûn, bihareke koçerî konên xwe yên rengîn vegirtin (17).

Di vê jêgirtinê de mekan bi têgeha "mal" wek cihê parastinê hatiye bikaranîn. Li gel vê wek bajar Diyarbekir bi teswîra ku Ermenan ji kuştinê parastiye hatiye vegotin. Bi gotina "her maleke Diyarbekrê", Diyarbekir ji bo Ermenan wek mal û sitargeha ewle hatiye nîşandan. Di vegotina hestên Hamest de vebêjer dîsa şibandina mekanên xwezayî bikar tîne. Wek mekan "daristanên hişk" di vir de sembola hestên neyênî ango bêhêvîtiyê ye, lê dema ku Hamêst dizane ku Ûnis û Entranîk (bavê Hamêst) hevalê hev in bextewar dibe, ev rewş wek mekan bi alikariya teswîra biharê hatiye vegotin.

Em dikarin bibêjin di gelemperiya mekanên romana *Mijabad* de şer, pêvçûn û alozî hene. Yek ji mijarên bi têgeha mekanê re têkildar koçkirin e ku di romanên dîrokî de bêhtir tê dîtin. Mijarên koçkirinê di van romanan de wek bîranîn ango bihîstin tê

vegotin ji devê lehengan. Di romana *Mijabad* de jî mijara koçkirinê wiha dertê beriya me.

> Saleke dojehî bû, zindana Akreyê ji zindaniyan têr nedibû. Şaban Axa li Amêdiyê ser kişandibû (…) Ji hemûyan bêhtir Tiyariyan êriş dibirin ser kurdan, mizgeft dişewitandin û kitêb diavêtin bîrên mizgeftan. Bi hezaran reviyan Hekariyê, hinekan berê xwe dane Ormiyê, ez wê hingê sê çar mehî bûm, malbata me jî berê xwe da tekyexaneya Bamernî, mal û milkê me tev talan bû. (23)

Di vir de hewceye em diyar bikin ku di romanên dîrokî de rewşa dîrokî a erdnîgarî û milletê bi hev re tên vegotin. Tiştê ku hatibe serê mekanî herwiha enînivîsa milletê ye. Di vê romanê de jî mijara koçkirinê yek ji van mijaran e.

Di vê romanê de têkiliya mekanî û navê romanê wek ku me di destpêkê de gotibû ji ser peyva“mij” ve hatiyê vegotin. Nivîskar sedemê bijartin û lihevanîna vê navê wiha diyar dike:

> Mij e mij xewna çiyê ye. Henasên zivistanê ye. Razên ku şev di guhên sibehan de dibêje, cêwiyê baranê ye mij. Pêçiyên ewran in li ser têlên sîtara zivistanê. Mehabad jî weke ku keçeke tazî xwe bide ber sûlavekê, di nava mijê de ye. Dibêjin "Mehabad Şarê mijê ye", Mijabad e, ne tenê mija xwezayê lê komara ku saz bûye bi xwe din ava mijeke sor de digevize. Çirayên stûnên di serê her kolanekê de, roniyeke nîvkuştî bi ser vê mijê de dibarînin, li ber xwe dide ronahî, li ber xwe didin çirayên stûnên serê kolanan. (24)

Di romanê de wek bajar Mehabad her tim bi awayên melankolîk tê teswîrkirin, wek mekanê derd û xemê. Ji ber ku Mehabad mekanekî siyasî ye û li ber têkçûyînê ye leheng jî di wê astê de melankolîk in. Mînakên vê yekê di romanê de wiha dixuyên:

> (…) Kolanên te, bi hêsrên serê sibehan têne pêçandin.
>
> Te giriyê sibehan dîtiye Mehabad?
>
> Hooo şarê xilmaş

Xewnên te di xelekên werîsan re derbas dibin.

Mij te radimûse, kolan bi kolan

Lûtke bi lûtke

Û dinale

Kî mija te ramûse?

Di pencereyê re li nalîna mija te guhdar dikim

Îşev…

Bihareke bi bîn û xwîna bayê seherê şûştî

Li dergehên te dide

Hooo komara sêwî

Kê hûnane ji bot e ev jan? (27).”

Rewşa komarê a nediyar ku bi mijê tê teswîrkirin di rûpeleke din de wiha tê vegotin: “(…) komar li ser hilm û pifekê maye (…) Stalîn dê vê komarê jî di pêçekê de bikuje (102).”

Vebêjer Badîn çîroka xwe û a Mehabadê vedibêje. Mehabad cihê evînên wî, serkeftin û di encamê de cihê tekçûyînên wî ye. Ji bo Badîn Mehabad di navenda mekanên romanê de ye. Ev yek wiha tê vegotin: “Jiyana min li Mehabadê xewneke dirêj e, ez dibêm belkî di romaneke rûsî an di fîlmekî amerîkî de de dijîm. Her rojeke min di vî bajarê bi çiyan û bi xapên dîrokê dorpêçkirî de çîrokek e (63).”

Elbet erdnîgarî tenê bi kêrî niştecihbûnê nayê, herwiha bi şert û mercên îklîmê li ser fîzyolojî û derûniya miletan tesîr çêdike. (Karaca, 2012: 77). Di vê romanê de yek ji lehengên balkêş “Emîral Axa” ye. Şert û mercên erdnîgariya komara Mehabadê li ser Emîral Axa bandor hiştiye. Ev leheng her tim behsa “deryayê” dike û hewceyiya komarê ya bi deryayê vedibêje. Li gor wî eger ku Mehabad xwedî deryayek bûya dê rewşa komarê cudatir bûya. Em dikarin bêjin ku Emîral Axa bi saya deryayê firehbûna ber bi welatên din û dinyaya derve ve îfade dike. Bi vê awayê Emîral Axa diyar dike ku Mehabad wek cihekî girtî, ku têkiliyên wî yên bi derve re qels e dertê ber me. Derya herçend wateya cudatiyê îfade bike jî li vir bi wateya yekîtî, girêdan û têkiliya di navbera Kurdan de hatiye vegotin. Di romanê de ev fikir wiha tê vegotin:

> -Derya, ne derya be komar hîç e.
>
> (…)
>
> -Ez Emîral Axa me li ser raya xwe me, eger hûn Mehabadê nebin kenarê deryayekê, yan deryayekê li vê komarê saz nekin, ew diherife! (26).

Di romanê de pirsgirêka qutbûyîna Kurdan a mekanî û fikrî bi wesîleyên cuda gelek caran dertê ber me. Li cihek din wiha tê dîtin: "Herêmên kurdan weke giravên ji hev qut di deryayekê de ne, pêwîst e kelek û gemî û qeyik hebin da ku xelkê ji giravekê bighîne giraveke dî (106)."

Emîral Axa wek lehengekî alîkar xwedî pisrgirêkên mekanî ye, pirsgirêkên wî di wê astê de ye ku heta derûniya wî li ser derya û avê xirab bûye. Em dibînin ku Badîn jî piştî demekî li ser vê fikra Emîral Axa a deryayê difikire: "Ez her û her ji xwe û ji hogir û nas û dostên xwe dipirsim ku eger welatê kurdan li kenarê deryayekê bûya, wê dîroka kurdan çawa bizîviriya? (175)." Di romanê de em dibînin ku mala Emîral Axa bi teswîrên deryayê xemilandiye. Badîn rojek diçe mala Emîral Axa û malê wiha teswîr dike:

> Mala wî di dawiya kolana Pehlewî de bû, dîwarên hewşa wî hemî şil bûn û te digot qey gemiyek di nîvê behrê de ye ew hewş. (…) bîna pêlan û kenarê behreke mezin ji hewşa wî ya tarî dihat. Em derbasî odeya wî ya piçûk bûn û weke ku ez têkevim xewnekê. Dîwarên odeya wî hemî bi heywanên behrê xemilandîbûn, wêneyên gemiyan û kenarên behran û pêlên bilind. (176)

Wek me li jor jî gotibû di romanê de hem di dema niha de hem di demên borî de bûyerên şer û pêvçûnan hene. Vebêjer rewşên kuştinê û şîngirtinê bi teswîrên mekanî xurttir dike. Di romanê de dema em dibînên ku bûyerên bi xwîn ango dramatîk tên vegotin teswîrên mekanî jî bi heman şiklê diguherin. Ev yek di romanê de wiha dixuyê:

> Dema ku Simko Axa kuştin, nalîneke weke barebara karikên şîr ji darên Şino, Ormiye, Selmas û Xoyê hat, her kesî giriyê spîndaran bihîst, hinar û sêvan wê salê ber negirtin, berû

> di darên xwe de teqiyan, te hêsrên daran dîtine Badîn? Dema Simko kuştin çiya bêdeng man, tenê li hev dinihêrîn û digiriyan, tenêtiya xwe ji bîr kiribûn, wê salê ba rawestiya bû. (34)

Di romanên polîtîk ye Kurdî de yek ji mijarên mekanî jî dagirkerî ye. Di romana Mijabad de jî vê mijarê dixwînin. Ligel vê dîsa wek taybetiyeke romanên polîtîk a serdemên netewperwer vebêjer behsa siyaseta navnetewî dike. Dewletên serdest yên wek Fransiz û Îngiliz di nav siyaseta Mehabad û derdorê wê de xwedî rol in. Di romanê de bi behskirina leşkerên van dewletan em vê rewşê fehm dikin:

> Wê şeva payîzî xewê riya çavên min winda kir, generalên artêşên fransiz û alman û îngilîzan jî wê şevê çav nedane ser hev, ez difikirîm çi bikim û berê xwe bidim kîjan bajarî? Kîjan bajar ê min û birînên min hembêz bike! Ew difikirîn kîjan bajarî têxin bin lingên xwe! Ez jî difikirîm kîjan bajar dikare ji min re bibe penah. Ez generalê evîneke sêwî bûm wê şevê!. (37)

Wek me di beşên ewil de jî gotibû mekan ji bîranînan pêk tên. Di vê romanê de hem vebêjer hem jî lehengên din têkilî û girêdana xwe ya bi mekanê re bi saya bîranînan vedibêjin. Mirov bi hêmana mekanî re tê girêdan, bi gotineke din xwe tevlî mekanê dike; jê hez dike yan jî jê direve û jê nefret dike. Wek ku Korkmaz û Şahin di xebata xwe de diyar dikin “Mirovekî ku ji mekanekî bireve dîsa xwe dispêrê mekanêkî din. Mirov bi mekanan re her tim têkiliyeke hestiyarî çêdike (Korkmaz ve Şahin, 2017: 91).” Dema ku vebêjer ji Amêdiyê diçe hestên xwe wiha vedibêje.

> (…) Min Amêdiyê li pey xwe hişt, ew weke xewnekê ji ber çavê min winda dibû, bayê Hênik yê ku gelî û newal dilorandin, tilûrên ku wê sibeha xemgîn hêlan dikirin, rûbarê serxweş, kenê keça meta min li bin darên berrûyan dema min ew didiqdiqand, siya zinarên efsaneyî, sûlavê ku ji vegotina çîrokan têr nedibû, ew wêne û nigarên li ser kevirê newalan, li devê şikeftan, heft bîrên kevnare, kuna berfê ku heta havînan berf tê de nediheliya, havîngeha mîrekên Behdînan, paytexta kepû bilind, darên spîndarê, behîv û gwîzê, çiyayê Metîn, Gare, çêleka pîrka min kitêbên min derên tozgirtî, zimanên cuda cuda

> ku li bin guhên hev diketin (îbranî, erebî, suryanî, tirkî, kurmancî), hemû li pey min man, ez generalê evîneke qedexe bûm wê berbangê! Tenê min birînên xwe, şikestinên xwe û xewnên xwe yên pêknehatî bi dû xwe de dikişkişandin. (38)

Di romana *Mijabad* de yek ji mekanên dîrokî ku gelek caran tê behskirin Dêrsim e. Hisenê Dêrsimî di romanê de wek leheng Dêrsimê temsîl dike. Dêrsim di dîroka nêz a Kurdan de yek ji wan bajaran e ku bi serhildan û pêvçûnan dertê pêş. Em dikarin bibêjin ku gelek bûyerên biêş bi navê Dêrsimê re hatiye girêdan. Mijarên bi Dêrsimê re têkildar wek koç, sirgûn, qirkirin, talan û serhildan di cureyên di edebiyata Kurdî de wek mijar cih digirin. Di romana *Mijabad* de jî Dêrsim wek mekanekî dîrokî dertê ber me. Vebêjer bi saya Dêrsim û Mehabadê derheqê rewşa Kurdan a wê demê de şîroveyan dike. Ev şîrove bi vê awayî ye ku hem bûyerên dîrokî bibîr tîne hem jî di navbera herdu bajaran de ji aliyê bindestî û êşê ve nêzikahiyek çêdike. Li gel vê di romanê de Dêrsim her tim bi "bêhna hineyê" tê vegotin. Di romanê de Dêrsim wek mekanekî dîrokî wiha tê vegotin;

> (…) bi sedan keç avêtin çemê Munzûrê, heta mehekê hineya bişaftî çem reş kiribû desmalên bûkan li newalan weke qulingan bi bayê kurr re mêl dibûn, wan desmalên bi hine xwe li daran digerandin, tîş tîşî bûbûn ew desmal heta niha ku ba ji hêla Dêrsimê tê bîna hennê difûre.(41)

Di heman rûpelê de bûyerek tecawizê ku li Dêrsimê diqewime tê vegotin;

> Min dît xwişka min rût li bin dara hinarê ye, efserê tirk bi ser de xwar bûye, orîniya gayekî pîr jê dihat, nizanim çawa min tivinga serbazekî ji dest girt, ew û yên mayî li erdê sar kirin, xwişka min jî di xwîna xwe de mabû. Porê hinekirî bi xwînê hate şûştin!. (41)

Mekanên romana *Mijabad* ji ber ku dîrokî ne di navbera dema niha û borî de hatine sazkirin û her tim dem û bûyer diguherin. Yek ji mekanên romanê ku dîsa xwedî bîranînên bi şer re têkildar e "Gola Wanê" ye. Dîsa di vir de jî mekan xwedî wateyên neyênî ye. Yek ji lehengên romanê Nûbar Nalbendiyan wiha behsa "Gola Wanê" û bîranînên xwe yên şer dike;

> (…) dibêjin Gola Wanê ji hêsirên evîndaran çêbûye, lê ez dibêjim ji xwîna xelkên bêguneh e, min serên firiyayî bi çavên xwe dîtin (…) qirçeqirça parsûyên bajar û gundan bû di bin cizmeyên rûsan de (…) Qers, Trabzon, Erzîncan, Mûş, Bedlîs û gundikên wa, weke meyweyên helisî diketin. Kînê em kor kiribûn (…) xwîn bi rûbaran re diherikî, hestiyên mirovan li kenarê her riyekê rêz bûn weke êzingan (…) bi hêrs em nêzîkî Wanê dibûn, bîna berateyan difûriya, refên qertelan li ser me hêlan dikirin, çi ezmanekî kirêt bû, Gola Wanê ji laşên mirî genî bûbû, her darek mirovek pê ve daleqiyabû (…) (57-58). (…) wan bêbavan çi kiribûn ji serê wê Wana çeleng, ew serobinî hev kiribûn, dîwar ketibûn, ji tenî û tirafê tarî bûbûn, xwîn û mejiyê pijiqî (…). (59).

Em dikarin bibêjin ku şerên dîroka nêz a li welatê Kurdan di navenda vê romanê de ye. Ev yek bûye sedem ku di romanê de bêhtir mekanên vekirî/berfireh bên bikaranîn. Em dibînin di romanê de yek ji mekanên vekirî "çem" e. Ev mekan rasterast di navenda honakê de nîne. Ligel vê di nav bûyeran de cih digire. Çem, di romanê de bi gelemperî dema ku bûyerên kuştinê tê vegotin de dertê ber me. Wek mînak dema behsa kuştinên Dêrsimê tê kirin "Çemê Munzûrê", dema Agopê Ermen behsa kuştina Kurdan dike "Çemê Rewandizê", dema ku bavê Jale bi têkiliyên keça xwe dihese wê dikuje û xwe jî di "Çemê Sîrwanê" de dikuje, dema ku Emîral Axa xwe di çem de dikuje em dibînin ku çem wek mekanekî întiharê dertê ber me. Di romanê yek ji van bûyerên bi çem re têkildar wiha ye: "Hemze bi dengekî dîn got û tivinga xwe avête ser termê wê, berê xwe da deşta Şarezorê, piştî demekê, xelkê, termê wî jî di çemê Sîrwanê de dîtin (…) (66). Di mînakeke dinde Agop wiha behsa çemê Rewandizê dike: "(…) min bi xwe li Rewandizê perîşanên kurdan diavêtin çem, erê min (96)" Lehengê ku her tim behsa deryayê dikir Emîral Axa jî xwe di çem de dikuje:

> -Badîn hevalê te xwe di çem de wer kir!
>
> -Hevalê min kî
>
> -Emîral Axa. (220)

Di romanê de wusa tê vegotin ku Kurd li deverên Kurdistanê yên cuda di nav şer û serhildanan de ne. Ev yek di romanên Kurdî yên dîrokî û polîtîk de gelek caran dertê ber me. Di romana *Mijabad* ev rewş wiha tê vegotin:

> Şêx Ehmed li Barzan, Şêx Mehmûd li Silêmaniyê, Ihsan Nûrî Paşa li Agirî, Simko li Ormiye, her yek coyek bi tena xwe diherikî, her çiyayekî strana xwe ji newal û geliyên xwe re dikir, dengê kesî nediçû kesî. (…) dojehek bû xewn û hêvî têde hatin birajtin (…). (77)

Ji aliyê mekanî ve ev rewşa Kurdistan û Mahabadê li ser lehengan û pêşveçûna romanê tesîr dike. Di nav vê rewşa ku hatiye behskirin de serpêhatiyên lehengan jî wek welatê wan tevlêhev û di rêya têkçûyînê de ye. Di vir de em dikarin bibêjin ku bi awayek aşkera bandora mekanî dixuyê.

Wek mekan axa Kurdan xwedî şerekî berdewam e. Wek hêmaneke mekanî parastina welat di romanên Kurdî de bi saya lehengên dîrokî yên Kurd an jî lehengên sêwirandî gelek caran dertê ber me. Di romanên Kurdî yên dîrokî û polîtîk de yek ji armancên ewil parastina welat e. Ahmedzade vê yekê wiha diyar dike;

> Lehengên nêzî hemû romanên kurdî tevlî şerê li dijî neyaran dibin ku hebûn û nasnameya wan a netewî înkar kirine. Ev lehengên ku ji aliyê hemwelatiyên xwe ve tên îdealîzekirin wek mêrxasan tevdigerin û kêm caran tevlî şerên nevxweyî dibin. Di dawiya nêzî hemû romanên kurdî de, nîşaneyên zelal ên berdewamiya şerê rizgarkirina welêt hene. (Ahmedzade, 2011: 60)

Yê ku mekanî watedar dike mirov e, lewra mirov li ser mekanî re dijî û pê re têkiliyên hestiyar çêdike. Wek ku Burçe Gürsel diyar dike: “Kolan û kûçeyên ku bi bîranînan bi hev ve neyên girêdan xeyn ji parçeyek xwelî ku derdorê wê bi malan ve pêçandiye bêhtir tiştekî din nînin (Gürsel, 2010: 21).” Di romanê de bajarê Silêmaniyê wek cihê têkçûyîna evîna Badîn dertê pêş. Badîn li Silêmaniyê xwedî bîranînên tehl e, bajar bi vê awayî piştî demekê li ber çavê wî reş dibe. Ev têkiliya bîranînên mekanî û leheng wiha tê dîtin: “Piştî çûna Jaleyê, (…) awirên min li dîwaran dilikumîn û hew

radibûn. Nûrî Emîn bala xwe dida min, bi destê min digirt û di kolanên tarî yên Silêmaniya xopan de ez digerandim (Dost, 2015: 82).”

Di romanê de em dibînin ku li gel Silêmaniyê, Mehabad jî ji bo Badîn bi bîranînên evîniyê tijî ye. Mehabad jî piştî ku Mujde ji wir diçe li ber çavê Badîn reş dibe. Di vir de em dibînin ku mekan ne tenê bi serê xwe lê bi rewş, qewimîn bûyer û hisiyatan her tim di nav guherînê de ye. Badîn vê yekê wiha vedibêje: “Ev şar bê Mujdeyê weke wî şaxê hişk û rût e, xemgîn e, sebra min lê nayê, xwezî min bi ya Menaf nekira û ez ji çiyê daneketama, nizanim wê çawa ew du meh bibûrin, bê evîn û işqbazî? (161).” Di romanê de têkiliya mekan, serpêhatî û bîranînan ji ser dîrokê ve bi awayê civakî; ji ser bûyerên di navbera lehengan de jî bi awayê şexsî hatiye bikaranîn. Di rûpeleke dein de ev têkilî wiha dertê ber me:

> Mujde giyan
>
> Mehabad bêyî te şarekî wêran e (…) Bêyî te kavil e ev bajar, wêran e Mehabad (180).

Di romanê de li gel civakê leheng behsa serpêhatiyên xwe yên mekanî dikin. Yek ji lehengên romanê Mujde -herwiha ku evîndarê Badîn e- xwedî serpêhatiyek e ku bi hêmana mekanî re têkildar e. Mujde bi malbata xwe ve ji cihê ku dijîn mecbûrî koçkirinê dibin. Di romanê de ev bûyer wiha tê vegotin:

> Mehabad şarekî cadûker e, mirov rojekê lê bijî, nikare jê hez neke, ez jî ev bûye deh sal in lê dijîm, ez gelekî jê hez dikim (…) Sala 1930 bû Simko û Xorşîd Axayê Herkî li Şino hatin kuştin rewşa min û diya min ne baş bû, azeriyan jî dev ji me bernedidan ji xwe asûrî daweta wan bû. Rojekê Kerîm hat û got: “Xwe kar bikin, berê me li Mehabadê ye.” Em di şeveke gawir de ji Şino derketin…. (84).

Mujde û malbata wê piştî koçkirinê li Mehabadê jî dibin xwedî bîranînên nebaş. Bi vê awayî di romanê de têkiliya Mujde û Mehabadê jî xwedî rabirdûyek nebaş e. Dayika Mujde di lehiya “Taxa Xirê” a Mehabadê de dimire. Ev yek dibê sedemê dûrketine Mujde a ji Mehabadê. Di romanê de wiha tê vegotin:

> -Ev wêneyê taxa Xirê ye

> Min ew ji dest girt û qenc lê meyzand: “Taxeke xir û wêran, xanî hilweşiyayî, golên avê li her deverê, gelek kes tê de hebûn şerwalên xwe hilmala bûn, hin zarok di destê wan de li ser banan, hin jin buxçeyên wan li ser serê wan û din ava avê de dimeşin, ji siya xelkê û xaniyan xuya ye ku roj li ber ava ye.”
>
> (…) – Salî Sêlawê bû, berî neh salan, diya min jî tê de çû. (86)

Bîranînên nebaş li ser têkiliyên lehengan û mekanan bandoreke neyênî çêdikin. Mujde sedemê heznekirina xwe ya ji Mehabadê di cihek din de wiha vedibêje:

> Edî nema sebra min li Mehabadê dihat, dawiyê termê diya min jî derket li darekê rawestiya bû, Kerîm ez demekê birim Şino, da ku ez xwe ji bîr bikim, lê min bêriya gora diya xwe ya li goristana bakurê Baxê Qazî dikir, lê em venegeriyan. Gelek ji mehabadiyan bûyerên jiyana xwe bi wê salê nas dikin. (89)

Di romanê de mijareke din a koçkirinê jî wiha tê vegotin. Li çiyayê Pêris û Akreyê şerekî giran diqewime û pêşmerge mecbûr dimînin vekişin. Di encama vê yekê de ne tenê ji eniyên şer herwiha bi malbatên xwe ve ji axa xwe koç dikin:

> Bi sedan zarok û jin û pîr û kal li pêş me diçûn, hin peya hin jî li ser qantiran berê wan li erdekî nenas bû, zeviyên xwe, xewnên xwe, xaniyên xwe û hêviyên xwe li dû xwe hiştin û di wê koça xemgîn de, wî karwanê aware de, di newalên kûr û birrekên di rengê mirinê de, weke axînan diherikîn. Dawiya payîzê bû, ji hinan re jî payîza dawîza bû li wê xaka efsaneyî. (154)

Lehengekî din ya romanê Kerîm jî li ser wê axê xwedî bîranînên tehl e. Di dema koçkirinê de malbata Kerîm jî di bombebarana balafirên Rûsî de dimirin. Di romanê de bûyer wiha tê teswîrkirin:

> Jina wî û du zarokên wî û pîredîya wî û ez, me da pey wî, em bi meşê hatin vî bajarî. Li rex çemê Sablaxê, malek peyda kir, em şeş mehan tê de man, heta rojekê balafirên rûsî, ew

> navçe bombaran kirin. Berî çar salan bû, Kerîm ez û diya xwe biribûn çinîna genim, jina wî jî li ber herdu zarokan mabû, em li nav zadan çav li balafirên rûsî ketin, mîna bazên nêçîrê hêlan dikirin. Û bû gurmîn… Dû ji xaniyên bajêr kişiya, weke ku rehek di dilê Kerîm de biqete, ew qîriya û bê ku li pişt xwe bizivire, das ji destê xwe avêt û berî da bajêr, jina wî û herdu zarokên wî qetoqeto bûbûn, mejiyê kurê wî yê piçûk –Ismayîl- bi dîwarekî kavil ve rêz bûbû. (…) Kerîm jî her roj, heta ku reşayî dikete bajêr, li ber gora malbata xwe, li Goristana Budaq Sultan bû (…). (90)

Serpêhatiyên lehengan yên ku bi têgeha mekanî re têkildar e wê atmosfera neyênî ku li ser têkçûyîna Mehabadê hatiya avakirin tîrtir dike. Em ji aliyek ve wek mekan rewşa Mehabadê a nebaş ji aliyek ve jî têkiliyên lehengan a bi mekanan re dixwînin.

Wek me li jor jî behs kiribû yek ji bûyêrên dîrokî bi hêmana mekanî re têkildar qirkirina Ermenan e. Di vê romanê de bi saya Agopê Ermen ev bûyer tên vegotin. Agop wiha behsa qirkirina malbata xwe dike: “Bavê min, birayê min, diya min… her sê weke kundiran serên wan li ser sekoya mala me ya li Xarpêtê gindirîn (97).”

Di romana Mijabad de mekanên tenê aîdê lehengan wek ode, mal ango cihekî zêde dernayên pêş. Ji ber vê yekê em tenê serpêhatiyên lehengan yê li Mehabadê û bajarên din dixwînin. Di romanê de derûniya lehengan ji ser bajar(an) ve tên xwendin. Ev yek di navbera bajar û lehengan de rasterast têkilî û bandorek çêdike. Di romanê de em wek mekanekî taybet odeya vebêjer dibînin. Vebêjer wiha behsa odeya xwe dike:

> Hinek serma ji zivistana çûyî di odeya min de maye, hestiyên min jî serma di xwe de veşartine, lê ez bi bîranînan xwe germ dikim, bi Silêmaniyê, Amêdiyê û wan bajarokên ku rojên min di devên xwe de weke benîştekî dicûtin û pûç dikirin. (101)

Di romanê de ode wek mekan li ser leheng xwedî bandoreke berbiçav nîne. Wek di beşên ewil de hatibû gotin di mekanên dîrokî de em rastê mekanên taybet nayên, bi gelemperî mekanên civakî û vekirî ne.

Yek ji mekanên romana *Mijabad* dikana “kalê werisfiroş” e. “Pêşewa” ku serokê “Komara Mehabadê” ye li meydana “Çarçira” tê darvekirin. Dikana kalê werîsfiroş di

çarçoveya daliqandina Pêşewa ve bi amûra “werîs”ê dertê pêş. Ev mekan bi sembolîzma werîs û kuştinê wek mekanekî neyênî û tirsnak tê teswîrkirin. Ber bi dawiya romanê ve em dikarin bêjin ku “werîs” tê wateya têkçûyîna komara Mehabadê. Ji bo vebêjer Mehabad wek bajêrekî ku xelqeya werîsê lê hatibe badan dixuyê. Di romanê de ev yek wiha derbas dibe: “Kalê werîsfiroş di kûraniya dikana xwe de bû, weke her gav werîsek dihûna û badida (…) (117).”

Di romanê de em dibînin ku Mehabad wek bajarek şikestî dikeve destê hêzên din. Ev yek bi sembola werîsê dertê ber me:

> Roj û şev û sibe û êvar li ba wî bûbûn yek kat, Mehabad jî nema xuya dikir, winda bûbû, bi kû de diçû li sêdaran dilikumî û werîsên daleqiyayî bi wan ve didîtin, her der bûbû Çarçira. Û hemû dar bûbûn sêdar. (…) Tewrêz ketibû destê artêşa Îranê (…). (237)

Di romanê de lehengê Ermen dema dimire wî li goristana Ermenan defin dikin. Ji vê yekê em dikarin derheqê bajarê Mehabadê de bibin xwedî agahî. Em dibînin Mehabad ne ji çand û milletekî lê ji pir-çandiyê pêk tê: Di romanê de ev beş wiha ye:

> Ev bûne sê roj me kalkê xwe li goristana ermeniyan, li nêzîkî navçeya Sê Aşan defin kiriye, her ku ez diçim ziyaret agora wî, ez Agop li wir dibînim, şûşeya vodkayê di destê wî de ye qurteke vedixwe, yekê li ser kêla kalê min dirijîne. (203)

Em dibînin ku piştî mirina kalkê Badîn hestên Agop yê derheqê bajêr de diguhere. Êdî Agop di nav tenêtiyê de dimîne, wusa hîs dike ku bajêr lê teng dibe:

> -Tu çi difikirî apê Agop?
>
> - Ez difikirim ji Mehabadê bar bikim! (…) mimkun bûya min dê hestiyên kalkê te jî bi xwe re bibirana (…). (204)

Di vir de em dibînin ku ji bo Agop tirba kalkê Badîn dibe mekanekî nû, herwiha êdî wateya Mehabadê jî ji bo Agop namîne. Wek li jorê jî hat dîtin di rewşa Badîn, Mujde û Jale de li hember çûyîn ango tunebûna kesekî de hestên derheqê wî cihî de diguhere. Agopê Ermen jî heman tiştan hîs dike li hember mirina kalkê Badîn, dixwaze

ji wê bajarê dûr bikeve. Ligel vê ber bi dawiya romanê ve rewşa Mehabadê her ku diçe xirabtir dibe. Herwiha wek ku me di destpêkê de gotibû evînên Badîn, bûyer û komar paralelê hev têk diçin. Rewşa komarê a nebaş wiha tê vegotin: “(…) lê ez dizanim ba ji kîjan alî hiltê, komar bi temamî ketiye hemêza rûsan û azerî jî hêdî hêdî gund û erd û milkên me dadiqurtînin, çavên rûsan lê ye milkên me li gundiyan belav bikin (215).”

Di romanê de em bi gelemperî rewşên mekanan dixwînin. Bûyer, serpêhatî û dîrok li ser mijara mekanî tên girêdan. Di vê romanê de em mekanên ku bûyerên dîrokî li wan qewimîne, Mehabad û derdora wî dibînin. Serpêhatiya lehengan di navbera van mekanan de pêk tê. Em dibînin ku Badîn rewşa evîna xwe bi şibandina komarê vedibêje:

> Ez nizanim çi diqewime, lê dilê min dibêje: “Ne tenê evîn herifî, komar jî diherife! (221). “Baran bi xurtî dibare, kolan tarî û bêdeng in, tenê sîrkesîrka pênûsa min e li ser van rûpelên bêdeng (222). Evîna wê komara min bû. Wêrana min e niha ew evîn. (223)

Piştê ku hevalê Badîn yê dozê Kerîm bi hezkiriya Badîn re dizewice em di romanê de xurt jî nebe teswîrên malê dibînin. Mal ji bo Badîn dibe cihê şîngirtinê. Di dawiya romanê de Badîn êdî ji bajêr dûr dikeve û zêdetir li malê wext derbas dike. Em dikarin di vir de malê ji aliyê giyanî ve wek hêmaneke xwe sipartinê şîrove bikin. Di romanê de ev yek wiha dixuyê:

> Bûyer edî ji bîra te naçe, çend roj in tu di binê xênî de mîna qetek cawê ku ji terziyekî zêde bimîne, rûniştî, ne diçî nava hevalan û ne jî li pêşmergeyan vedigerî (232). Badîn êdî neditebitî, nîvdînî bûbû, li kolanên bajêr li dilê xwe digeriya, diçû ber deriyê dibistanan, Mizgewtî Şaderwêş, Gerekî Şiwanan, Meydana Çarçira, Kûçey Cûlekan, Gerekey Hermenyan û der û dorên wî bajarê ku ji mijeke tîr hatibû ristin, xwe ji ber pêşmergeyan vedişart, nedixwest dev ji Mehabadê berde, di gel ku zanibû êdî qeder dev ji wî bajarî berdide (235). Mehabad edî ji wî re bûbû xeleka werîsekî ku roj bi roj teng dibû, kesek ji hevalên wî yên kevn nema xuyabû, berê xwe dida kû jê re biyanî

> xuya dikir weke ku nû diçû wan deveran, dem jî diherikî weke dawa bûkeke li ber bayekî êvareke dîn, êdî nedihate bîra wî kengî hatiye bajêr û çima? Nedihate bîra wî çi karê wî li wir heye, hemû navnîşan ji bîr kiribûn (237).

Wek ku Bachelard dibêje: "Mal êdî zêdetir wek "rewşeke giyanî" ye. Mal êdî rewşek hundirîn tîne ziman (Bachelard, 2017: 103)."

Em dibînin ku mekanên romana Mijabadê bi gelemperî li ser lehengan tesîr dikin. Her çend mekanên dîrokî jî bin leheng ji aliyê derûniyê ve di bin tesîra wan de ne. Di vê romanê de mekanên dîrokî û polîtîk dertên pêş. Em dikarin bibêjin di navenda honakê de mekan û serpêhatiyên wan hene. Ligel vê leheng xwedî serpêhatiyên ji rêzê nînin. Serpêhatî û bîranînên wan li ser têgehên wek welat, sirgûn, koçberî û tekoşînên mekanî ne.

### 3.2. LABÎRENTA CINAN

Romana duyem a ku em ji aliyê hêmana mekanî ve binirxînin romana Hesenê Metê (bûyîn: 1957) a bi navê *Labîrenta Cinan e* (Metê, 2000). Ev roman di navê xwe de yek ji têgehên mekanî peyva "labîrent"ê dihundirîne. Ji vê yekê em dikarin texmîneke bikin ku di romanê de vegotinek an jî bûyerek wek labîrentê tevlêhev heye.

Lehengên romanê wiha ne: Kevanot, Nêrgisa Koçer Gebran, Feqî Dimso, Sofî Sêvdîn, Sofî Dîno, Koko, Bengîn, Selîmê Sêvdîn, Şefo, Gelto, Cefto, Fistûj, Pîros, Rîsor, Rîço, Xanê, Siyabend, Guzî.

Ev roman serpêhatiya mamosteyekî ye ku li gundekî bi navê "Gundê Dînan" mamostetiyê dike. Serlehengê bi navê "Kevanot û jina wî "Nêrgisa Koçer" li wî gundê rastê qewimînên ecêb tên. Di destpêkê de herçend texmîn nekin ku ev gund li ser wan wiha bandor dike jî di dawiyê de bereksê vê bi temamî dikevin bin bandora gund. Di vê romanê de em taybetiya mekanî ku li ser mirovan bandoreke zêde dihêle û ew hêza mekanî ya ku piştî demekê mirov hildide bin bandora xwe dibînin. Kevanot di demên ewil de her tim vê gundî wek cihekî baş dibîne. Her ku diçe mirovan nas dike herwiha bi naskirinê re rastê hinek çewtiyan tê û dixwaze van biguherîne. Di encama vê pêvajoyê de wek gund û gundiyan zêdetir nas dike û di cihê ku bikare gund biguherîne de bi xwe dişibe gundiyan û di dawiyê de derûniya wî xirab dibe. Îbrahîm Seydo Aydogan jî di xebata xwe a li ser vê berhemê de romanê wiha dide nasîn:

> Romana Hesenê Metê ya Ku çîroka mamoste Kavanotî ya balkêş rave dike, ji rastîya gundîyên kurd ve dest pê dike û tev li rastîya mamosteyekî îdealîst dibe ku weke bûyer nakokîyên xurt ya di nava civaka me de temsîl dike. (Aydogan, 2014: 297)

Di vê romanê de mekanê mezin ango berfireh gund e, lê belê her maleke gund pişt re bi taybetiyên xwe ve tên vegotin. Di romanê de her mal ji aliyê jiyîn û dîtina dinyayê ve xwedî taybetiyên cuda ye û ji ber vê yekê jî gund wek labîrent e. Di romanê de em pirsgirêkên mekanên gundewar dibînin. Di destpêkê de dema ku Kevanot ji bo mamostetiyê tê gund bêyî ku taybetiyên wê gundê û gundiyan bizane bêhtir li ser derdora xwezaya gund şîroveyan dike. Di romanê de em teswîrên mekanî a destpêke wiha dibînin:

> -Lê em ê li vir jiyaneke xweş li dar bixin. Nêrgis. Em ê bi xelkê gund şêrîn û ew ê jî ji me xweş bin. Ez mamoste me. Ne tenê mamostê zarokên wan, herhewa ez ê mamostetiyê ji wan re jî bikim. Ez sond dixwim ku ez ê bi her awayî ji wan re bibim alîkar. De êdî çi ji destê min biqede ez ê bikim. Dibêjin gelekî wan heta nuha ruyê bajêr jî ne dîtine. Gund bi xwe gundekî avî, xweş û şên e (22).

Yek ji mekanên romanê dibistan e. Dîwarê lojmana dibistanê dibe yek ji wan cihê civînan hem ji bo Gebran û Kevanot hem jî ji bo Gundiyan û Kevanot. Li ber dîwarê lojmanê bi gelemperî li ser rewşa gund diaxfin. Di romanê de ev yek wiha dertê ber me: "(…) mamoste Kevanot û Gebranê Baço hevdu dîtine, li ber dîwarê lojmana dibistanê, li ser du kursiyan xwe dane ber tava paşnîvroyê û dîsa ketine galegalekê (…) (53)." Wek mekan hewşa dibistanê di encamê de dibe cihê ku mamoste Kevanot xwe dispêre wir. Hewşa dibistanê ji bo Kevanot dibe sînor, ji wir dernayê.

> (…) belê, mamoste Kevanot jî mîna van hemû ruhên ha hertim ji gund û şêniyên gund dîwarê hewşa dibistanê jê re dibe weke toqa şeytên û ew ji hundurê wê dernakeve der, di piraniya van demên xwe de hertim serê wî di ber de û di hundurê vê hewşê de digere, tufî erdê, tufî dora xwe dike (…). (190)

Gund ji aliyê çanda resen ve mekanekî cuda ye. Yek ji wan reseniyan jî çanda lîstikan e. Di romanê de ev lîstikên zarokan li ser kuştin û nêçîra heywanan e. Ev yek ji Kevanot re ecêb tê û dixwaze vê çandê biguherîne. Di romanê de em vê çandê wiha dibînin:

> (…) li ser vê yekê Koko pê dide zanîn ku: ew destên xwe ji bo girtina çêlikên çûçikan di qulên dar û dîwaran re dikin, hêkên wan derdixin û pê dilîzin, tew carina ji bo kêfxweşiyê hêlînên çûçikan ji hev dixînin, ne tenê çûçik, herweha ew bi şev jî dadikevine newalan, bi beqan digirin, lingên wan bi hev ve girêdidin û li ser sêrî darde dikin, bir o li nav erdan kûsiyan berhev dikin, bi kevirên mezin lê dixin, dikujin, perçe dikin, bêrika wan jê derdixin û ji diya xwe re dibin (38). (…) pêşiyê naxwaze bawer bike ku Koko van tiştan rast dibêje, lê dema ku ew bi çavên xwe jî wî perçê hestî bi girika piyê Bengîn ve dibîne, serê wî zelal dibe. (39)

Tevgerên gundiyan a li hember Kevanot jî yek ji taybetiyên gundan nîşan dide. Ji ber ku gund ji bajêr dûr e û têkiliya bi derdorê re gelek kêm e bi gelemperî dema kesên xerîb wek karmendê dewletê ku ji bo wezîfeyê tên gund, axaftin û rewşa gundiyan a li hember wan her tim cuda ye. Di romanê de ev beş wiha ye:

> Piştî silav, peyvên xêr û xweşiyê mamoste Kevanot jî li gor berbora gundîtiyê li ser sekûka hêla jorîn li ser kulavê mor î nexşîn li kêleka Selîmê Sêvdîn bi cî dibe (…) bêdengiyeke kurt digire ser oda gund, ji bo kûvîtiya gundiyekî tiştên herî dijwan ev rewşên weha ne, peyivîna bi karmendekî re ji bo wan ji barek êzing girantir û zikêşekê dijwartir e (…) gerçî dizanin û bihîstine ku mamosteyekî dilpak, dilovan, nefspiçûk e û bi zimanê wan jî dipeyive. (43)

Di romanê de em dibînin ku gundî di navbera mamosteyên berê û Kevanot de muqayese dikin. Yên beriya Kevanot gund û gundiyan paşdemayî dîtine û bi awayê piçûkxistinê tevgeriyane. Lê ji ber ku Kevanot hem bi zimanê wan diaxife hem jî xwe ji civat û sohbetên wan dûr nagire gundî wî nêzê xwe dibînin. Kevanot her tim tevlî

mekanên gund dibe. Di vir de nuqteya hemzimanî di navbera gundiyan û Kevanot de nêzikahiyek çêdike. “Heta nuha jî kîjan karmend hatiye vî gundî ferman daye, xwestiye, girtiye û ewqas!... lê ev mamostê ha (…) hatiye çêlî rewşa zarokan, çêlî kuştina beq û kûsiyan dike, qulên dar û dîwaran bi lêv dike (…) (48).” Yek ji taybetiyên gundan şevbuhêrk in. Kevanot jî tevlî şevbuhêrkan dibe. Di romanê de şevbuhêrk wiha tê teswîrkirin:

> Ava şevê cara çaran germ dibe, dibe çay, li civata odê belav dibe û tê vexwarin, şevbuhurka oda gund pîr dibe û wexta belavbûnê tê, lê hîn di vê şevbuhurka îşevîn de memoste Kevanot têdigêhije ku di vî gundî de yekî ku bikani be bi axaftinên zanyarî bide û bistîne, Gebranê Baço ye. (52)

Di romanê de em dibînin ku Gebran û Kevanot gelek caran li ser rewşa gund sohbet dikin. Gebran derheqê labîrentbûna gund de wiha dibêje;

> Di pîvan û dunyayên wan de ev kuçên gund ê li te teng û zirav bibin, serê te ê bêşe, dilê te ê li hev bikeve û tu ê verişî. Tu ê di xwe de verişî, di wan de verişî… tu ê bibînî ku di kuçan de, di hewşan de, di penceran de çawa serê xwe dirêj kirine, weke cin û pîrebokan li vê rewşa te dinêrin. Bi kurtebirî, ev kuçên vî gundê he ê li te bibin labîrenteke cinan û tu ê ji nav dernekevî…(55).

Di vegotinên li ser diyardeya labîrentê de, mekan bi îmgeya ku ji derdorê ber bi navendê ve teng dibe dertê ber me (Korkmaz û Şahin, 2017: 16). Di vê romanê de jî em dibînin ku gund wek labîrent li lehengan teng dibe. Em dikarin bibêjin ku yek ji taybetiyên gundan baweriyên pûç e. Di derheqê baweriyên pûç de wiha dibêje Gebran:

> (…) -Şevê nîvê şevan rûdinin, bêyî ku zarokan ji xwe dûrbixin, dest pê dikin… çêlî cadûkaran, çêlî çavînokiyên çavên xirab, çêlî pîrebokan, çêlî cin û periyan dikin…
>
> -Rast e di jiyanê de bi taybetî jî di jiyana gundîtiyê de meriv rastî gelek tiştên seyr tên. Îcar divê

> meriv hêdî, bi gotin, bi peyv û pratîkê yek bi yek
> wan ji van tevger û berborên naxoş dûrxin. (59)

Ji lehengên romanê Gebran demeke li bajêr xwendekar bûye û ji ber pirsgirêkekê malbatî zanîngehê berdaye. Di demên xwendekariyê de li bajêr bûye pişt re vedigere gund. Cudatiya jiyana bajêr û gund li ser Gebran bandoreke neyênî çêdike. Gebran li gund xwe tenê hîs dike û nikare wateyek bide tevgerên gundiyan. Gebran, di derheqê gundê xwe de pirtûkeke nivîsiye û wê pirtûkê dide Kevanot. Gebran di wê pirtûkê de gundê xwe mal bi mal daye nasîn. Di romanê de her malek wek mekan xwedî taybetiyên cuda ye. Gebran di wê defterê de gundê xwe wiha dide nasîn:

> Ku em mala seyda, lojmana dibistanê, mizgefta mala Xwedê û wan hemû malên qereçiyên ku zivistanan tên û li vî gundî dihewin jî nebêjin, gundê me bi heftê avahiyên xwe, di navbera çiyakî jêrîn û yekî jorîn de mexel ketiye. Gundê me ji dûr ve xwediyê dîmena gundekî nola hemû gundan e. Jora wî rêz û weke hersal jêra wî jî bîstan û pîvaz e. Roavayî gundê me bi kevir, bi şikeft û bi newalên kwîr in. Li hêla rojhilat jî… li wir jî goristan û Mekanê Mala Dînan (71). (…) ji çar sed û bîst şêniyên gundê me bi kêmanî heşt kesên wan har, dehê wan dîn, bîstê wan cinî, sedê wan ehmaq, du sedê wan saxik… û yên mayî ne diyar in. (72)

Gebran gundê xwe wek cihê dînan dibîne. Li gor Gebran gundî xwedî baweriyên pûç in. Gebran ji ber ku bajêr dîtiye û xwendî ye, li hember vê rewşê tehemul nake. Gebran jî wek Kevanot dixwaze gund biguherîne lê pişt re dev ji vê yekê berdide, lewra guhertina gund mimkun nabîne. Di romanê de em vê beşê wiha dibînin:

> (…) ku meriv dora gundê me bi keviran dîwar bike, derî û penceran di vî dîwarê dora gundê me de veke, weke personelên pêwîst asîstan, doktor û psîkologan bîne gundê me, wê çaxê… wê çaxê rasterast tîmarxaneyeke rengîn ê ji vî gundê me derkeve. (72)

Di romanê de wek mekan ‘kanî’ li gundan wek cihê civîn û hevdîtinê tê dîtin. Ji vê aliyê ve mekaneke civakî ye. Di vê romanê de jî bîr bi heman awayê dertê ber me.

> (…) li rojavayê bakurê gundê me bîreke mezin heye. Piraniya malên gundê me ava xwe ya vexwarinê ji vê bîrê hildikêşin, dewarên xwe li ser vê bîrê avdidin û gelek caran, tenên xwe jî dîsa li ser vê bîrê dişon. Ji ber vê yekê, ji berbangê heta derengî şevê jî şêniyên gundê me hertim çend kes li ser vê bîrê peyda dibin. (…) keç û bûkên ku bixwazin fesadiya yekê an jî çêlî xortekî gundê me bikin, hebûna vê bîra me ji bo wan rêyeke herî baş û dayîneke Xwedê ye. (72)

Di romanê de em dikarin bibêjin gelemperiya mekanan vekirî ne, mekanên girtî û şexsî kêm in. Mekan ji aliyê fenomenolojiyê ve wek hêmana bingehîn a jiyanê tê qebûlkirin. Lewra mekan ji bo çalakî û tevgerên mirovan bingehîn e, her hebûn bi hebûna xwe ji xwe mekanê îşxal dike. Martin Heidegger û Gaston Bachelard ji wan kesên girîng in ku hêmana mekanî ji aliyê fenomenolojîk ve dinirxînin. "Bachelard, di berhema xwe ya *Mekanın Poetikası* de malê û têkiliya mirov a bi malê re li gor qaîdeyên fenomenolojiyê dinirxîne. Malê di fehmkirina giyanê mirov de wek amûreke bikar tîne (Solak, 2017: 27)." Di romana *Labîrenta Cinan* de jî her maleke gund bi mirovên wê û derdora wê ve tên şîrovekirin. Di vir de her mal dibe xwedî nasnameyek ku bi etîketên civakî tê nasîn. Wek "mala doxînsistan (Metê, 2000: 76)", "mala ku sî û sê serî şeniyên xwe hene (77)" tên nasandin.

Di romanê de çi mekanên vekirî be çi yê girtî be; bi awayê tesadufî nayên bikar anîn, teqez di rêya armanceke de tên bijartin û bikaranîn. Carna derheqê derûniya lehengê de agahiyan dide me carna jî di derheqê rewşa civakî û çandî a di romanê de. Di romanê de dema ku mal yek bi yek tên teswîrkirin her mal bi aliyê xwe yê efsûnî ve dertê holê. Yek ji wan malan jî mala "Cefto" ye. Mala Cefto ew mal e ku pirtûkxane tê de heye û li gel xwendina pirtûkan xewnan şîrove dike, mala wî paralelê ecêbî û efsûniya gund hatiye teswîrkirin. Di romanê de ev beş wiha ye:

> (…) Dîwarê pêşîn î ku li gund mêze dike, bi qasî çar mîtroyan ji erdê bilind e û paşiya xênî jî bi qasî çend bihustan ji riya paş malê bilindtir e. Di navbera xênî û goristanê de ev riya piçûk tenê heye. Dema ku meriv di deriyê hewşa vê malê re

> derbasî hêla hundur bibin, li piştî pencera odê seriyekî rût ê bi ber çavên meriv bikeve. Ev serê rût serê Cefto î gundiyê me ye. Hertim perçek kaxiz, defter an jî pirtûkek di dest de ye û li ber vê pencerê rûniştî ye. Di rojên şil û tarî de li hêla hundur e, di rojên germ û ronahî de jî li hêla der e. Di hêla hundur de, di dîwarê ber sekûka xwe de refikeke piçûk çêkiriye, pirtûk û ew hemû kaxizên xwe yên ku têne xwendinê li wir dihewîne. (82)

Li gundan yek ji baweriyên pûç jî di derheqê şeytan û hêzên din de ye. Di romanê de "Mal: 6" ji ber sedemê hinek çîrokan wek mala şeytên ango bêyom tê binavkirin;

> Li pêşiya vê mala Cefto maleke din heye. Maleke nexşîn e… Mala şeytên e…(…)
>
> -Maleke bêyom e, dibêjin û xwe ji vê malê didin hev. Êdî baweriyeke wusa li gundiyên me çêbûye ku silav û serlêdaneke li vê malê, pevçûn e, mirin e. (85)

Li gor gundiyan ji ber çîrokên efsûnî ku di vê malê de qewimiye ev mal êdî ji bo wan bûye wek mekanek reş, tarî û xirab. Em dibînin ku her sê endamên vê malê jî li pey hev dimirin. Herwiha ew bi xwe gazî mirina xwe dikin, ji ber vê wek mala şeytanê û cihê ku bi hêzên derasayî re têkilî datînin tê dîtin. Di rûpeleke din de wiha tê behskirin:

> (…) Ev mala ha aliyekî xwe î tarî û veşartî heye, bêyom e, çifta vê malê li merivan dikeve, li gundê me dikeve. (86)
>
> -Ev mala ha maleke şeytanî ye. (93)

Di romanê de gundî jî hayidar in ku gundê wan xwedî ecebiyan e, ji ber vê gelek caran gundê xwe wek cihê dînan teswîr dikin. Di romanê de beşên ku gund wek mekanê dînan tê teswîrkirin wiha ne:

> (…) di nava şêniyên gundê me de baweriyeke wusa heye ku dibêjin: li gundê me merivekî baqil di dawiya dawîn de dîn dibe, merivekî ji Xwedê re piştî demekê dixerife û li hemberî Xwedê asê dibe, merivekî dewlemend xizan dikeve… (99).

Yek ji lehengên romanê Nêrgis jî derheqê ecêbiya gund de wiha dibêje ji gundiyekê re; “-Uff, metê!.. çi dîn û ciniyên dunyayê hene, Xwedê jî hemû li vî gundî berhev kiriye. Tu kê dipirsî, li kê dikolî… (124).”

Li cihekî din a romanê jî em heman gazindê wiha dixwînin: “Li vir mîna ku Xanê rastiyekê bide xuyakirin, hinekî bi hêrs û di ber xwe de: “-A wusa bû… kî tê gundê me, ji me dîntir dibin (…) (129).”

Di encamê de di nav vê gundê labîrent de ji ber baweriyên pûç, ji ber nezaniya gundiyan û paşdemayîna wan derûniya Kevanot xirab dibe. Piştî demeke gund bi qasî ku jiyan û tevgerên bajarê ji bîr bike li ser mamoste Kevanot bandor dike. Di vir de em bandora mekanî a li ser guhertina mirov gelek xurt dibînin. Di romanê de ev beş wiha ye:

> Guherînên ku naturê di van sê salan de li vî gundî li mamoste Kevanot kiriye dewlementir, piralîtir û nexşîntir e, serqisê: xwîyekî seyr lê peyda dibe û li kuderê dibe bila bibe dema ku çûçikek bi ber çavên wî dikeve tavilê hustuyê wî dizivire û li pey dinêre, dema ku di ber an jî binê darekê re derbas dibe bêyî daxwaza wî serê wî ber bi jor bilind dibe û çavên wî li ser pel û giliyan digere, mîna yekî ku êdî ji vî gundî be jiyana gund pê xweş tê (…) ew du sê nasên ku li bajêr hebûn ew wan jî zû ji bîra dike, çûyîna xwe ya bajêr pêşiyê kêm û dû re jî pir û pir kêm dike, pirî caran ji bo pêwîstiyên dibistanê jî di xwe de nabîne ku biçe bajêr (…) dema lingên wî bi bajêr jî dikeve mîna ku rêveçûna di kuçên bajêr de ji bîr kiri be weke gundiyên kûvî hertim li paş û pêşiya xwe dinêre (…) piştî demekê baş pê ewle dibe ku ew lezeta ku li gund digire û pê kêfxweş dibe li bajêr tuneye, loma çûyîna sîname an jî tiyatroyekê tew jî nakeve bîra wî (…) gelek caran piştî çûyîna xwe ya bajêr nola masiyê ku ava wî were guhertin gêjikî dibe. (109).

Gundî vê guherîna mamoste Kevanot ferq dikin. Guherîn û tesîra gund wek mekan di wê astê de ye ku mamoste Kevanot di destpêkê de ji nêçîr û kuştina

heywanan gelek aciz bû, lê di encamê de em dibînin ku bi zarok û gundiyan re diçe nêçîra çûçikan (147-148-149). Xeyn ji van yek ji mekanên gund yên cihê kombûn û sohbetê hewş e. Di romanê de wek hewş "Hewşa mala Xanê" û hewşa dibistanê dixuyê:

> Di devê deriyê hewşê de mamoste Kevanot dinêre ku weke hertim civateke piçûk li ser sekûka hewşa mala Şero li hev geriyaye, ev hewşa ha ne tenê hewşa vê malê, rasterast hewşa gund e, li hênikayiyên êvarên weha, hertim çend kes li vê hewşê peyda dibin, çend kesên ku vê hewşê ji oda gund diçêtirînin. (138)

Mekanekî din ku di romanê de heye ew jî bi navê "Goristana Mekanê Mala Dînan" e. Ev goristan wek cihekî bi raz tê dîtin û wateyên din jî lê tên barkirin. Bi vê awayî ew jî ji goristanê wêdetir wek mekanekî ku wateyên pûç girtiye ser xwe dertê pêş. Li gor gundiyan "Goristana Mekanê Mala Dînan" her salê heft kes dixwaze ji gund. Di romanê de ev gotistan wiha tê teswîrkirin:

> Şêniyên gund bi tirs û xofeke veşartî hevdu haydar dikin û: "Sala ku li gund mirinek dest pê bike heta dawiya wê salê, Mekanê Mala Dînan daxwaza heft mirinan dike û em hemû jî bi viya dizanin. Anuha beriya ku sal dawiyê li xwe bîne hejmara miriyên îsalîn bûye şeş. Ji bo ku ev hejmar derkeve heftan û bibe saleke weke hersal Mekanê Mala Dînan ev yeka ha bi serê xoce de haniye"dibêjin. (189)

Gund êdî wek cihekî ku cin û 'ji me çêtir' têde hene û museletê mirovan dibin tê dîtin; "Di vî gundî de jî gelek kes bi ber bayê wan aferîdên ji me çêtir ketin, lê ne bi vî rengê ha!" dibêjin (182)." Gund ji bo mamoste Kevanot ji aliyê fîzîkî ve cihekî piçûk e, di dawiyê de dema ku êdî xewnereşkan dibîne û derûniya wî xirab dibe ji lojmana xwe dernayê, gund wek mekan hinekî din jê re teng dibe. Wek navê romanê jê re dibê wek "*Labîrenta Cinan.*" Di romanê de ev yek wiha dixuyê:

> Xoce bêdeng e, bersiva van pirsan nade û şîrove nake, heta derengî rojê jî li ber dîwarê lojmanê bi wî de dikevin, hûr hûr gotinan davêjine ber û hêdî hêdî dipeyivin, dû re pê didine zanîn

> ku di van demên dawîn de wî xwe ji gund û şêniyan dûr xistiye (…). (185)

Mamoste Kevanot di encamê de dîn dibe li gund. Wek têgeh mekan bi hemû hêza xwe ya guhertinê li ser Kevanot bandor dike. Di romanê de ev yek wiha tê vegotin:

> -Rabin, bi kuçên gund bikevin û bibêjin, xoce dîn bûye… bibêjin, xoce bi nexweşiyeke dûrî aqilan ketiye… bibêjin êdî tewşomewşo dipeyive… bibêjin, li hemberî îblîs û şagirtên wî asê bûye!... De rabin!... heta ku ji we tê biqîrin û bibêjin, xoce devê xwe dirêjî pêsîrên pîrecinan kiriye û ji pêsîrên wan şîr kişandiye… bibêjin, xoce rastî pêxemberên ji serê xwe nexweş û Xwedayên devbixwîn hatiye… (187).

Kevanot êdî bi gelemperî li lojmanê ji gundiyan dûr wext derbas dike. Bi vê awayî em dibînin ku mekan bi her awayê wî dipêçe. Di vê romanê de li gor me wek mekan gund ji hêmanên din a romanê bêhtir dertê pêş. Herçend leheng di destpêk û dawiya romanê de yek ne be, yanê guherîbe jî hewceye ku em li sedemê vê yekê binêrin. Em dikarin bibêjin hêmana ku serlehengê diguherîne mekan e.

### 3.3. GERÎNEKA GUERNICAYÊ

Romana Yıldız Çakar (bûyîn: 1978) a bi navê *Gerîneka Guernicayê* (Çakar, 2016) ji aliyê Weşanên Lîsê ve çap bûye. Di vê romanê de çîroka malbateke ku ji ber sedemên siyasî mecbûr dibin koç bikin tê vegotin. Hem çîroka malbatê hem jî çîroka şexsî a serleheng Lîsa bi hev re hatiye vegotin. Roman ji du beşan pêk tê û di nava van beşan de jî binbeşên din hene. Binbeşên romanê bi navê bajaran; “Amed, Stenbol, Edene, Mêrsîn” hatine binavkirin. Di romanê de ji ber mijarên polîtîk Lîsa û malbata wê sirgûn dibin. Bajarên xeyn ji Amedê ji bo vebêjer mekanê sirgûnê ne. Lîsa û malbata xwe li van bajaran rastî pisrgirêkan tên û her tim bi tirs dijîn. Di romanê de rewşa sirgûniyê û welat wek pirsgirêkên mekanî dertên ber me.

Di vê romanê de wek mekan “welat” û mijarên girêdayî wî dertên pêş. Li gel vê sirgûn jî yek ji mijareke din a romanê ye. Ligel vê yekê bingeha bûyer û aksîyona romanê di navbera mekanan de pêk tê. Bi vê awayî em dikarin bibêjin ku mekan yek ji hêmanên sereke ye di vê romanê de. Di romanê de mekan xwedî wateyek polîtîk e û bi hêza desthilatiya siyasî ve girêdayî ye. Em dibînin ku bandora mekanî ya li ser lehengan

berbiçav e. Em dê di vê romanê de têgehên wek “welat, bêwelatî, koçkirin û xerîbiyê” bibînin. Xeyn ji van em wek mekan mal û odeyê jî bi awayek xurt dibînin ku ev yek di şîrovekirina derûniya lehengan de gelek kêrhatî ye. Di vê romanê de mekan ji cihên cuda û guherbar pêk tê. Ligel vê di vê romanê de em têkiliya mirov û mekanî herwiha mijarên aîdiyet û nasnameyê ku têkildarê hêmana mekanî ne dertê pêş. Lehengên vê romanê ev in; Lîsa, Şaxê, Abraham, Aro, Arîman, Miryam, Ardan.

Beşa ewil a romanê bi navê “Amed, 1986, payiz…” e. Roman bi teswîra odeyeke dest pê dike, leheng li ber televizyonê ye. Em dikarin bibêjin di romanê de televizyon wek amûreke xirab û neyênî tê dîtin. Vebêjer her çiqas behsa televizyonê dike li gel wê behsa kuştin, xwîn û şerê jî dike. Wek amûr televizyon ji bo Lîsa dibe wek trawmayê Dîmenên ku di televizyonê de dixuyên jî bi têgeha mekanî re têkildar in. Di dîmenan de gelek caran cihên ku şer lê ne, xirabe û hilweşandî tê dîtin. Bi vê awayî televizyon ji aliyekî ve her tim pisrgirêka mekanî li ber lehengê romanê zindî dike, di her kêliyê de derdixe ber wê. Di destpêka romanê de ev yek wiha dixuyê;

> Ji meraqa xwe hinekî din nêzî televizyonê bûm; lingê wê tazî û di cênîka wê de qulek vebûbû.
>
> Avek reş jê diherikikî. Din ava toz û dûmana pişt wê de avahîyek mezin xuya dikir. Alîyekî avahîyê hilweşandî, alîyekî din qul qulî bû. Dişibîya mîhrîcanekê! Ji gule, barûd, xwîn û cesedên parçekirî her der hatibû xemilandin. (…) cesedên li erdê, ax û ev bêhna xwînê.
>
> -Dayê Şaxê, ji cama televizyonê bêhna xwînê tê!. (11-12)

Wek me di beşên ewil de gotibû, teswîrên mekanî derheqê lehengan û civakê de jî dikare agahiyan bide me. Di destpêka romanê de her çend em derheqê leheng, bûyer û civakê de agahdar nebin jî em dikarin ji teswîrên mekanî texmînan bikin.

Di rûpelên ewil a romanê de em rastî têgeha welat tên. Wek mekan welat hestên li ser hestên netewî xwedî bandor e. Em dikarin bibêjin ku welat wek malzaroka nasnameyê di jiyana takekes de cihekî girîng digire. Diyardeya welat li ser mirov hem bi awayê avakar hem jî bi awayê neyênî dikare bandor çêke. Pirsgirêk û aloziyên welat li ser leheng rewşa trawmayê çêdike. Di vê romanê de em dibînin ku welat wek mekan

bi têgehên kevnar û pîroz tê teswîrkirin. Rewşa welatê ku vebêjer behs dike herçend di romanê de wek dagirkirî û qada şer û aloziyê be jî teswîra Şaxê a li ser welat ji bo vebêjer wek sedemê motîvasyonê ye. Di romanê de ev yek wiha tê vegotin:

> Dema dayîka min Şaxê qala erdnîgarîya axê û axa erdnîgarê dikir, digo: "Ev bexçeyê Xweda ye. Ji wan çar şetên pîroz, yek jê Dîcle, yek jê jî Ferad e. Em qewmekî kevnar in. Ji şopên pîroz em hatine heta îroyîn. Ev ax bi bereket e, her başî û qencî bihewîne jî, naleta xerabîyê wek baranekê li me bariya ye. Niha jî Dîcle û Ferad, heta Şet-ul Ereb xwînî (12-13).

Di romanê de welat wek nexşe tê teswîrkirin. Vebêjer bi vê awayî hem rewşa welat a dema niha û dîrokî muqayese dike. Bûyerên romanê herçend di dema îro de derbas bin jî carna bûyerên dema nêz carna jî yên dîrokî tên vegotin.

Mijareke din a mekanî "Guernica" ye ku navê xwe jî daye romanê. Guernica ji aliyê mekanî ve xwedî serboriyeke trajîk e. Li gor me ev taybetî di romanê de mijara mekanî tîrtir dike. Serpêhatiya Guernica wiha ye:

> Di sala 1937an de di şerê navxweyî a Îspnayayê de 28 balafirên bombebaranê bajarê bi navê Guernicayê bomberbaran dikin. Di vê êrişa hewayî de di navbera 250 û 1600 kes dimirin. Tabloya Guernica ji aliyê Pablo Picasso ve li ser vê bûyerê hatiye çêkirin (https://tr.wikipedia.org/wiki/Guernica_(tablo).

Di romanê de muqayeseya Guernicaya Picasso û Amed ji aliyê bûyerên şer û kuştinê ve tên muqayese kirin. Herwiha vebêjer welatê xwe rasterast wek "Guernicaya ku ez li ser dijîm" bi nav dike. Di romanê de em têkilî û muqayeseya wan wiha dibînin:

> (…) Piştî dîmenên di televizyonê de, ku ew jina di nava cesedên parçe parçe de dimeşiya, nizanim bo çi tenê tabloya Picasso dihat ber çavê min? "Ka bibêje, erdnîgarîya te mezin e, yan Guernicaya ku ez li ser dijîm? Ji xwe ez dizanim tu nikare ve pirsê bibersivîne. Erdnîgariya êşên min ji tabloyên te gelekî mezintir û bi êştir e. Ger careke din ruhê te li firçê û xwînê bihesile, hewcedariya te yê ji 7,76 metreyan firehtir û ji 3,49 metreyan bilindtir ji war û bilindahîyê çêbibe, hewcedarîya te yê

> ji Dîcle û Feradê çêbibe, hewcedarîya te yê ji Kurdistanê çêbibe (13).

Di romanê de Amed wek bajar xwedî nasnameyeke polîtik e. Wek ku Gürsel Aytaç dibêje: “Bajar di esasê de qadeke îmgeyî a xwenîşandanê ye. Mekan ne tenê ew cih e ku em tenê lê dijîn û hereket dikin herwiha ew erdnîgariyeke polîtîk e ku awayê jiyîna me û hereketên me jî diyar dike (Aytaç, 2013: 153).”

Îdraqkirina mekanî li gor şertên mewcûd û rewşa takekes diguhere. Di romanê de em dibînin ku vebêjer ji ber bûyerên ku dijî xwe di nav gerînekê de hîs dike. Mekanê ku lê ye jê re wek cihekî teng dixuyê. Di romanê de ev yek wiha dertê ber me:

> (…) Du dîwarên bilind, stûr, hişk û taxek bêserî û bêbinî; geh bazdidim jêr, geh bazdidim jor. (…) Xeleka gerînekê wek devê kêreke tûj li dora min diçû û dihat, hemû endamên min ên ku nedihatin dîtin yeko yeko jêdikir, yeko yeko kêr dikir. Gerînek, wek devê bîreke bêdeng xuya bû, lê magmayek tê de dîn û har bû. Heta ber dev tenê ji xwînê tijî bû. Divê pacê vekim. Nefesek, hilmek ji min re hewce ye. (Çakar, 2016: 14)

Mijareke din a vê romanê ku bi mekanî re têkildar e sirgûn e. Dayika Lîsa, “Dayê Şaxê” xwedî serboriya sirgunê ye. Ligel vê em ji romanê dizanin ku dayika Dayê Şaxê jî di dema serhildana Şêx Seîd de sirgûn bûye, wiha tê vegotin;

> Dema serhildana Şex Seîd dayîka wê ji warê xwe hatibû sirgûnkirin, ev sirgûnî bibû çîrokeke bi êş ji dayîka min a Şaxê re. Weke biharek ji can weşiyabû û canek ji bihare. Talana ku li mala dayîka wê hatibû kirin, wek çîrokên şevên dûvedirêj min ji devê dêya xwe bihîstibû. Ji wê çîroka sirgûniyê û pê ve, bihara wê û xweşikîya temenê wê qet lê nezîvirî bû. (17)

Bi taybet di romanên Kurdî yê polîtîk de ligel bûyerên navendî em rastî sirgûnê jî tên. Rewşa sirgûnê nîşan dide ku welatê leheng(an) ji berê de xwedî pirsgirêkan bûye. Di romanê de hem Dayê Şaxê hem Lîsa heman rewşa sirgûniyê a berdewam dijîn. Bayram Ali Çetinkaya di xebata xwe de dijwariya sirgûnê wiha îfade dike:

> Ji bo kesê sirgûn ya dijwar ew e ku di roja îro de di nav jiyanekê ku her tim malê tîne bîra wî de dijî. Kesê sirgûn wusa hîs dike ku nêzikê mala xwe ye lê qet nagihêje malê. Ji ber vê yekê sirgûn her tim rewşek navberî ye; ne dikare ji jiyana xwe ya berê biqetê ne jî dikare bi girêdana xwe ya bi derdora nû re pêk bîne. (Çetinkaya, 2009: 12)

Di romanê de yek ji mekanên taybet "ode" ye. Di romanê de ode bi gelemperî di wateyên tirsê de dertê ber me. Ligel vê di odeyan de her tim aciziyek heye. Wek temsîla mekanên girtî ode, di romanê de stres, tirs û hestên derûnî a leheng digihêjîne xwîner. Di romanê de ode wiha hatiye teswîrkirin:

> (…) Ev çend sal in ku heman deng, heman dîmenê li vê odê dijîn – ez û televizyon, somîya hesinî, qenevîçên ser balîfê, çend kulîlkên di qutîkê rûnê Vita de û derabeyên pacê giş mîna berê ne. Tu tiştek qet neguherîbûn ji doh de; dem, xanî, ode, girtina çav û herikîna kêlîyan. Tu tiştek neguherîbû. (Çakar, 2016: 21)

Tirsa di navbera ode, dîwar û pacê de di gelemperiya romanê de berdewam dike. Di rûpeleke din de em vê rewşê wiha dibînin:

> Weke ku hezar kes di guhê min de bibêje, rabe û berê xwe bide odeyan. Ez rabûm, çûm oda mêvanan. Min dî paca me vekirî bû. Min pacê girt. Lê dema ji odê derketim jî, hîn sawa odê, dîwaran û ya di ruhê min de dom dikir. (…) Wê îşev em hemû bikuşta. (93)

Di vê romanê de ode û dîwar bi gelemperî di wateyên neyênî de ne. Lao-tzu di derheqê têkiliya dîwar û odeyê de wiha dibêje; "rastiya odeyê dîwar nînin valahiya di hundirê wan de ye (Sennett, 1991: 25)." Di rûpelek din de tirsa di nav odeyê de wiha dertê ber me: "Piştî hewara Dayîka min Şaxê, dengê guleyan di odê de olan da. Dîwarê ber serê min, weke ku tasek boyaxa sor lêkiribe ji jor de xwîn jê diherikî (Çakar, 2016: 164)."

Di romanan de em bi saya van teswîran rewşa aborî, siyasî, çandî û civakî a di romanê de dibînin. Di vê romanê de mekanên ku leheng lê ne bi gelemperî bi pirsgirêk

in. Ev, rewşa sosyolojîk a welatê Lîsa (Amed) jî nîşan dide. Em dikarin bibêjin ku mekan her tim di nav têkiliyeke dualî de ye. Wek ku Lefebvre diyar dike:

> Mekan ji bo hinekan bêqewetî ye, hesta terikandinê ye, daketina derveyê demê ye. Ji bo hinekên din jî wek çincîl e, cihê bûyînê ye, cihê têkiliya xweza û civakê û cihê guherînê ye. Bi vê awayê her tim di nav lihevkirin û nelihevkirinê de ye. (Lefebvre, 2014: 151)

Di vê romanê de mekanên şexsî cihekî girîng digirin. Em dibînin ku vebêjer bi hûrgilî behsa mala xwe dike. Ji vê danasîna malê em dikarin derheqê rewşa malbatî de bibin xwedî agahî. Di romanê de ev beş wiha ye:

> (…) Sê odeyên me hebûn. Oda mezin, ji dayîka min Şaxê re bû; dolabeke mezin li wê bû, ku doşek û lihêfên rengo rengo rengo tê de hatibûn hiljenandin. Li aliyê şibakê jî, sindoqek binexşkirî ku ji dayîka wê jê re mabû, bi destmaleke spî hatibû neqişandin (…) Perdeyên tûl ku jêre digotin, "Dantêlên Frensî," yên şîfon î gul gulî bi rengê xwe yê zer û sor sîmetrîyeke entîke didan odê. Li ser xalîçeya bi dîwêr ve, çend jinên xweşik î li bin darekê rûniştibûn û bi fîncanên ferfûrî qehwe vedixwarin (…) Her odeyek rengê xwe hebû. Ya min şîn bû, ya Dayê Şaxê zer bû. Weke ku her odeyek xwedî ruhek be, her odeyek zimanê xwe hebû. Oda min li hember oda Dayê Şaxê bû. Derîyên me li hev dinihêrtin. (Çakar, 2016: 24)

Ji vê teswîra malê em rewşa aborî, çandî û civakî a serleheng û malbata wê dibînin. Li gel vê em dibînin ku di teswîra malê de hêmanên çandî wek desmal, sindoq û fîncanên ferfûrî tê dîtin. Teswîra malê nîşan dide ku malbata Lîsa mabateke kevneşopî ye. Di vê teswîrê de em malê bihizûr dibînin lê belê mal herçend wek cihê aramî û ewlehiyê be jî di vê romanê her tim cihê tirsê ye. Bi gotina Richard Sennett: "Taybetiya mal a ewil ew e ku cihê hizûrê ye, Herwiha li hember hemû tirs, guman û nelihevkirinê cihê parastinê ye. Eger wiha nebe ew der mal nîne… (Sennett, 1991: 38)." Wek yekeya herî piçûk a civakî mal, cihê ewil e ku takekes di wir de jiyana xwe sererast dike. Em dikarin bibêjin ku cihê

ewil a nasîna çandî jî mal û derdora wî ye. Li gor Hummon mal sînoran diyar dikin, pêvajoyên civakî û fikrî îfade dikin herwiha li gel taybetiyên xwe yên fîzîkî karûbarên çandî jî pêk tînin. Bi vê awayî objeyên watedar yê çandî û civakî ne. Wek mînak mal ji rêkûpêkiya hundir heta asta derdorên bajaran li ser tevgerên mirov û ahenga civakî dikare bandor bike. Mal ji bo bikarhêneran di demên hewce de bi wezîfeya rawestgehê ye, herwiha serkeftinên şexsî û fikrên bikarhêneran aşkera dike (Çetin, 2010: 9). Di vê romanê de mal bêtir ji bo xweparastinê ye. Dema ku Lîsa û malbata xwe diçin bajarên sirgûnê jî mal di wateya xweparastinê de ye. Mal ji bo jiyana şexsî xwedî taybetiyên girîng e. Em dikarin malê wek cihê ku mirov li gel tenêtiya xwe dikare biaxife binirxînin. Gaston Bachelard derheqê vê taybetiya malê de wiha dibêje:

> Eger ku bipirsin qenciya herî biqîmet a malê çi ye em dikarin wiha bibersivînin: mal xeyalkirinê dihundirîne, yê ku xeyal dike diparêze; mal wê derfetê dide ku em di nav aramiyê de xeyal bikin. (Bachelard, 2017: 36)

Em dikarin bibêjin di vê romanê de wek mekan mal, bereksê van gotinên Bahcelard dixuyê. Mekanên girtî an jî teng ji aliyê nîşandayina taybetiyên lehengan ve girîng in. Wek ku Richard Sennett dibêje: “Mekanên hundir mekanên mecbûrî ne (Sennett, 1991: 47).” Di vê romanê de mekanê hundir mecbûrî ne û em dibînin ku ji aliyê derûniyê ve tirsa li ser lehengan nîşan didin.

Di romanê de mînakên navguherandina bajar, tax û gundên Kurdan dertê ber me. Guherandina navê tax û bajaran ji bo komara Tirkiyê bi wateya kontrolkirina li ser mekanî bû. Wek ku Murat Gülbetekin di xebata xwe de dibêje: “Navdayîn gava ewil e ji bo afirandina tiştekî. Xwedîlêderketin gava piştê “afirandin”ê ye (Gülbetekin, 2017: 67).” Di romanê de vebêjer mînaka navguherîna taxeke wiha vedibêje; “Piştî şerê Tirk û Rûman, rayadarên Tirkîyeyê navê bajarê “Gîrne”ya Kibrisê didin gelek cih û waran. Niha ez navên ne aîdê vê axê, vî bajarî û vê taxê mecbûrî dijîm û tehamûl dikim (Çakar, 2016: 35).” Di rûpeleke din de jî ev polîtîka wiha tê vegotin:

> Ez ji Dêrsimê me bira, te ev nav bihîstiye? Deriyê zîv e lê teresan navê wê guherîne, kirine Tuncelî, binêre çawa zîv bi

> kîna xwe dikin tunc û sifr! Lê xwîna wê nehatiya guhertin, hîn xelk bi ava destnimêja Seyid Riza sond dixwin, hîn hineya ku bûkan ji serê xwe re strabû di kodikan de ye ziwa nebûye (…) rêl û daristan, newal, dil û hinav, bi hev re sotin, agir bi çiyayê Dêrsimê ket. (40-41)

Mekan xwedî dîrokê ye, ev yek nikare bê piştguhkirin. Herwiha navên cihan bi wateyan tijî ne. Nav, diyar dikin ku bîranîn û nirxên serdemên berê jî hebûne li wê cihê (Diamandouros û yên din, 2018: 3). Di romanên Kurdî yên polîtîk de kirinên dewletên ku Kurd di bin hikumraniya wan de ne carna bi awayê sembolîk carna rasterast tên rexne kirin. Lehengê romanê aciziya xwe ya ji ber vê rewşê vedibêje. Di romanê de em bi vê awayî polîtîkayên komara Tirkiyê jî dixwînin. Mudaxele û tevgerên dewletê xwedî encamên civakî ye. Civak li hember van mudaxeleyan bi saya hişê kolektîf çanda girêdayî mekanê diparêze: Herçend navguherandin wek polîtîkayek be jî di encamê de wek ku Joost Jongerden diyar dike, di hişê gel de ev guherandin pêk nayê. Jongerden wiha dibêje:

> Di nexşeyên resmî yê dewletê ku mekanê temsîl dikin de navên kevin jê tên birin û tenê navên ‘nû’ tên diyar kirin. Lê belê di jiyane rojane de (nexşeyên mejiyê de yan jî sembolîzekirina mekanan de) bandora navguherandinê zêde tune. (Jongerden, 2015: 44)

Em dibînin ku yek ji mekanên romanê jî “qehwexane” ye. Di romanan da mekanên civakî ji aliyê nîşandayîna rewşa civakî ve kêrhatî ne. Qehwexane wek mekanekî civakî cihê hevdîtin, sohbet û wextderbaskirinê ye. Li gel vê ev mekan bi gelemperî wek cihê mêran tê dîtin. Dilek Akkirman di xebata xwe de li ser qehwexaneyan wiha dibêje:

> Qehwexane, ji ber ku mêrên di nasname û statuyên cuda de gelek diçinê di nav jiyana rojane de wek “mekanê mêran” tê dîtin. Bi vê awayê mêr rîtûelên xwe di qadên gelemper de pêk tînin. Dîsa heman qada gelemper ji bo jinan wek cihên neewle, xwedî sînor û cihên ku zêde lê negerin tê dîtin. (Akkirman 2017: 54)

Di vê romanê de vebêjer li hember mêrên li qehwexaneyê bihêrs e. Vebêjer wan wiha rexne dike:

> Qehwexaneya li balê, dîsa vê sibê heta ber dev tijî ye. Yên li ber derî sekinînin, hemal in û li benda kar in. (…) Ewqas însan bêkar in û di vê qehwexanê de li dora sobeyekê kom bûne. Ji sibê heta êvarê tu kar bi destê wan nakeve. Her yek ji wan, wêneyekî feqîrî û birçîbûnê ye. (…) Xwedê dizane, bê çiqas hêvîşikestî û bi gazin in. (…) Tu dibê qey belasebeb hatine dinyayê û li ber vê qehwexanê li benda temamkirina roja xwe ne. Mirov dibêje qey ji parîkî nan pê ve tu armanceke wan î din nîn e. Evana hemû mirîyên li ser lingan in. Mirov li ser axa xwe bibe hemalê xelkê. Ax, zilm!. (Çakar, 2016: 36)

Vebêjer bi saya qehweyê rewşa aboriya civakî aşkera dike. Ligel vê ev kesên li qehweyê bêhêvî, bêçare û bêarmanc dixuyên. Qehwexane wek neynika civakê ye. Ji vê teswîra qehweyê diyar dibe ku civak xwedî pirsgirêkan e. Li gor romanê em dikarin van pisrgirêkan wek feqîrî, bêkarî û bêhêvîtî îfade bikin, bi gotina Köksal Alver: "Têkiliyên ku mirov li kolanan nikarin danin li qehweyan datînin. Bi hemû îmkan û kêmasiyên xwe qehwe nûnerê jiyana kolanan e (Alver, 2010: 120)." Di romanê de em dibînin ku Hesinkarekî li dikana xwe ya ku li hember qehwê ye bi destê hêzên dewletê tê kuştin. Di romanê de ev bûyer wiha tê vegotin; "Qehwexana li hember hesinkar, her roj heta ber dev mişt bû ji kesên bêkar; yên li hundir rûniştî, yên li ber derî, yên li ser pîyan. Diviyabû li hember du kujeran pêncî kesên bêkar rabûna (…) deng ji qehwexanê nehat (Çakar, 2016: 43)." Vebêjer li hember vê rewşê dibîne ku ji wan kesên qehweyê deng dernayê û bertek nîşan nadin. Vebêjer kesên qehweyê wek kesên mirî bi nav dike: "Evana hemû mirîyên li ser lingan in (36)." Bi vê awayî qehwe wek mekan di vê romanê de wek cihê bêçaretiya welat, qelsî û lawaziyê dertê pêş.

Di romanê de em rastî guherîna mekanî jî tên. Dayê Şaxê dema behsa demên berê dike em guherînên li ser welat dibînin. Guherîna heman mekanî a di navbera nifşan de wiha dertê beriya me:

> Dayîka min Şaxê, dema qala axê bikira, gotinên dêya xwe ji paxila xwe derdixist û digo: "Axa me serî hebû binî tunebû.

> Ewqas bi bereket bû, ax, me xwarinên xwe yên li ser sifrê didan heywanên xwe. Nav me de kesên feqîr qet tune bû (36).

Di vê romanê de em têkiliya nasname û mekanî jî dibînin. Di romanê de vebêjer Amedê wek nasnameya xwe û cihê aîdbûnê nîşan dide. Ev yek bi serpêhatiyên leheng re têkildar e. Di romanê de Amed bi gotina Lîsa wek malzarokê ye. Amed di romanê de wiha dertê beriya me:

> Bayekî hênik xwe li rûyê min dixist. Bêhna Amedê ji bê dihat. Ax, Amed! Bajarê min î zarokatîyê. Bajarê min î hebûnê. Bajarê min î kakila şaristanîyê, tu çiqas bi efsûn e. (Çakar, 2016: 205). (…) Bo ez vegerim zarokatîya xwe, xatirayên xwe, divê rêya malê bibînim. Ez ê li vir vegerim rastîya hebûna xwe. Ev der malzaroka dayîka min Şaxê ye. Hemû hestên hebûna min li vir hatine rêstin – wek qenevîçên wê yên rengo rengo. Hêdî hêdî ber bi malzaroka dayîka xwe ve meşiyam. Hemû ruhên xerab min yeko yeko ji xwe dikir, binax dikir û wiha dimeşiyam. Di bîrê de bûm. Ji xeleka zincîrê qetiyabûm. (…) weke ku ez qet ji vir neçûbim, qet tiştekî nejiyabim, qet li taxên xerîb û tunelên tarî nemeşiyabim, ewqas bi merhamet ez hembêz dikirim. (207)

Di romanên Kurdî de di navbera têgeha welat û dayikê de sembolîzmek xurt heye. Welat di asta pîroziyê de bi dayikê re tê teswîrkirin û hemû hestên li ser dayikê ji bo welat tê vegotin. Di romanan de em dikarin bêjin ku motîvasyona şerê welat li ser rabêja dayikê tê avakirin. Haşîm Ahmedzade jî li ser vê têkiliya dayik û welatê wiha dibêje:

> Di romanên kurdî de teswîrkirina dayikan, dema mesele tê ser tunebûna netew-dewletekê, xalek balkêş derdixîne holê. Di baweriyên çandî yên kurdan de ya welêt sembolîze dike, dayik e (…) Dema em bifikirin ku di baweriyên çandî yên kurdan de dayik welêt sembolîze dike, ev ne tesadûf e ku di cîhana romanên kurdî de dayik ewqas pasîf û bêpar in. Tunebûna welatekî kurd bi rêya dayikên hêjar ve tê nîşandayîn. (Ahmedzade, 2011: 61-62)

Di vê romanê de jî Şaxê wek dayik ji ber şerê welat sirgûn bûye, ev rewş ji ser dayikê ve wek peyama hêjariya welat tê xwendin. Herwiha Lîsa jî di navbera welatê xwe yê dagirkirî de sembolîzma dayikê bikar tîne, ev yek tespîta Ahmedzade a li ser dayik-welatê piştrast dike.

Vebêjer bajarê nasnameya xwe wek kesayetîyeke parçekirî dibîne. Herwiha xwe jî yek ji wê parçeyê dibîne. Têkiliya sirgûn û bajarê nasnameyê di romanê de wek pirsgirêkeke mekanî wiha dertê ber me:

> (…) Kesayetîyên xerabe, têkçûyî, lêgerîna puxteyeke veşartî ya aîdbûnê, tim hewcedarîyekê li min ferz dike; her ku dengê baranê tê min… Ji bilî vê axê tu axeke din, min nakişîne ber bi dilê xwe ve. (…) Ez jî perçeyek im ji wê kesayetê û di wê de temsîlîyeteke nepen dikim; hestên min jî, bi ruhîyeta xwe bi şikil dike ev bajar. Amed, bajarekî qedîm e, di dilê Kurdistanê de; lê wek serdemên borî, vê serdemê jî kesayetîyeke parçekirî ye. (Çakar, 2016: 39)

Di romanê de xeyn ji çîroka malbatê em rastê serpêhatiya “welat”î jî tên. Lîsa ne tenê ji bajêrê xwe herwiha ji welatê xwe jî hayidar e. Ligel vê hikumkirina milletê serdest a ku li ser welatê Lîsa hikum dikin û erdnîgariyê li gor berjewendiyên xwe bikar tînin jî gelek caran di romanê de wek pirsgirêkeke mekanî dertê pêş:

> Axa tu xelkekî nabe axa bav û bapîran, asîmanê tu xelkî nabe asîmanê dê û dapîran. Ev çi nakokîyeke mezin e, ku yên ji vir diçin axeke din, dibin mihacir û li ber derîyê xelkê dibin mihacir (…) yên ji wir tên vê axê, di qesir û koşkan de me dikin xulam û li ser kakilê axa me zikê xwe têr dikin. (51)

Beşekî din a romanê jî li bajarê Edenê derbas dibe. Beşa ku li Edenê derbas dibe, wek “xerîbistan”, “xerîbî”, “sirgûn” hatiye binav kirin. Di romanê de ev beş wiha dertê ber me:

> “(…) Çavên wê yên melûl û bêçare, niha li vî bajarê xerîb, di vî zimanê nenas de, mabûn bi tenê (76).” Di rûpelek din de bêçaretiya Dayê Şaxê a li hember sirgûniyê em dibîn: “Şaxê hîn

> stûxwar e. Bêçaretîyê ji spîkên çavên wê dixwînim; jinek, pênc zarok, yek jê birînên wê giran û li rexê xerîbîyê… (79).”

Koçkirin ligel xwe gelek pirsgirêkan çêdike. Pirsgirêkên ewlehî, aborî, nasnameyî û çandî. Li gel vê di encama koçkirinê de adabtebûna jiyana nû wek zehmetiyek dertê pêş. Di romanê de em rewşên sirgûnî û koçkirina malbateke dibînin ku serperestê malbatê du jin in. Bêguman di koçkirinê de jin zehmetiyên zêdetir dikêşin. Akkirman di xebata xwe de rewşa koçê û bandora wê ya li ser jinan wiha vedibêje:

> Ji bo jinekê ku ji cihê gundewar bi sedemên cuda koç kiribe bajêr, entegrebûna jiyana bajêr jê re gelek dijwar e û di hêla bi kar anîna derfetên bajêr de jî dijwariyan dikêşe. Lewra ji devera ku têkiliyên cînartiyê yên rasterast hebû, merivên xwe û axa xwe dûr ketiye. Di nav vê rewşê de jin li bajêr bi têkiliyên tesadûfî re rûbirû ye. Ev yek dibe sedem ku jin di vê pêvajoyê de hem ji xwe re hem jî ji bajêr re biyanî be. (Akkirman, 2017: 57)

Rewşa sirgûniyê awayê jiyîna takekes ji binî ve diguherîne. Wek ku Sennett dibêje: “Kesê ku hatiye sirgûnkirin li wî cihê mecbûr e bi wan kesên din re meşxûl be ku qet sirgûnê fehm nakin. Ew kesê sirgûnbûyî li rêyeke jiyîna hevpar digere li ser wê cihê sirgûnê (Sennett, 1991: 160).” Sirgûn, pirsgirêkeke mekanî ye ku xwedî bingehên polîtîk, siyasî û civakî ye. Di dîrokê de cezayê sirgûnê cara ewil bi awayê şexsî hatiye dayîn. Koç û sirgûnên girseyî jî di dema dewletên netew de bi tevgerên neteweperwer re di sedsalên nonzdemîn û bîstemîn de derketiye holê (Timur, 2017: 28). Kesê hatiye sirgûnkirin di destpêkê de encamên erênî û neyênî yê sirgûnê nizane. Lewra di destpêkê de ew kes bi rabirdûya xwe re mijûl dibe û dikeve nav mitaleyan. Kesê sirgûnkirî rewşa sirgûnê zûbizû qebûl nake û ji bo xwe li rêyên cuda digere. Di nav demê de ya bi wî mekanî re li hev tê yan jî bereksê vê di nav dijberiyê de dijî. Ji bo ku nasnameya xwe wenda neke bi cihê nû re naxwaze li hev were û hînê wir bibe, di encamê de kesê sirgûn fehm dike ku nikare ji aîdiyetên xwe biqete û xwe wek koçber qebûl dike. Li gel vê ew, her tim bîranînên xwe yê di derheqê welatê xwe de zindî dihêle.

Di romanê de jî rewşa Lîsa jî bi heman awayê ye, her tim bîranînên xwe yên welat di bîra xwe de zindî dihêle û bi rabirdûya xwe re mijûl dibe. Di vê romanê de bi heman

awayê em dibînin ku vebêjer û malbata wê di adabtebûna bajarên sirgûnê de zehmetî dikêşin. Di romanê de Edene mekanê sirgûnê ye. Bêçaretî û dûrketina ji welat li ser Lîsa û malbata wê barekî giran çêdike. Lîsa li xerîbiyê ango sirgûnê li ser têgeha welat aîdiyet û nasnameyê gelek caran difikire. Di romanê de em vê rewşê wiha dibînin: "Xwîna di laşê me de gelek kêm e; ji ber ku berîya em werin sirgûnkirin me nîvê xwîna xwe li wê axê, li wê malê, li wê oda razanê hiştiye (Çakar, 2016: 78)." Di cihekî din de jî hesreta welat û rûyekî nas, ji paca sirgûniyê ve wiha tê vegotin:

> Li xerîbîyê, rûyekî nas, dengekî nas, destekî nas çiqas germ bû, wek welatekî aram ku mirov xwe lê bigire. Avahîyên xerîb, rûyên xerîb, taxên nenas… (81). (…) Çima perdeyên guhên min li çirçirokên şevên Amedê dimînin? (…) vê siba xerîbîyê çima li min ewqas dibe barekî giran?. (81)

Têkiliya mirov û mekanî bi bedenê dest pê dike. Lewra mirov dema ku bedena xwe di mekanekî de bi cih kir dikare bi kes an jî tiştên din re têkilî dane (Berber, 2017: 144-145). Li sirgûniyê Lîsa nikare bedena xwe li wir bi cih bike, di encama vê yekê de bi bajarê sirgûn û xerîbiyê re nikare têkilî dane.

Di qada xebatên mekanî de tevgerên jinan her tim di plana duyem de ye. Sedemê vê yekê ew e ku gelemperiya tevgerên jinan di mekanên girtî de û di nav malê de pêk tên. Mekanên mêran êdî vekirî, berfireh û li ber çavan e lê yên jinan êdî piçûk, girtî û "biparastin" e. Em dibînin ku lehengên romanê Lîsa û dayika xwe di mekanên girtî de heps dibin. Di romanê de ev rewş wiha xwe nîşan dide: " (…) Pace vekirî bû. Perda spî li ba dibû. Weke xeyaletek di hundirê perdê de be perde ber bi jor bilind dibû û pişt re hêdî hêdî xwe bera xwar dida (…) ditirsiyam (…) (Çakar, 2016: 87)." Di beşa Edenê de kujer tên malê û nîvê şevê yê Lîsa bi kuştinê tehdîd dikin. Di romanê de em dibînin ku kujer mêr in. Di romanên Kurdî de têkiliya mekan(an) û jinan di nav şertên neewle de ye. Sedemê vê yekê a herî girîng ew şera berdewam e ku li ser mekanî ji gelek aliyan ve xwedî bandor e. Haşîm Ahmedzade li ser vê yekê wiha dibêje: "Rewşa jinan di hemû romanan de, pêwendiyên mêrane yên di civakên kurdan de nîşan dide. Tunebûna qaîdeyên demokratîk û şerê niha yê ji bo mesela netewî gelek bandor li ser şertên jinan kiriye (Ahmedzade, 2011: 60)."

Jinên ku ji gundan koç kirine bajaran mekanên nû parçe dikin û ji xwe re qada jiyanê ava dikin. Em dikarin bibêjin ku hinek çand û kevneşopiyên xwe yê gund tînin bajaran û li kolanên ku lê ne dixwazin van îcra bikin. Ev yek bi saya baxçeyê ber derî wek cihê kombûna bi cînaran re, şibakên malan û hwd. pêk tên. Bi vê awayî jinên ku koç kirine bajêr di nav qadeke piçûk de ji bo xwe cihekî taybet ava dikin. Adnan Kulaksızoğlu jî li ser vê mijarê wiha dibêje:

> Kesên ku ji gundan diçin bajaran ji bo ku dîsa xwe di nav ewlehiyê de hîs bikin xwe di nav komên piçûk de bi cih dikin ku ev kom jî gelemperî ji hemwelatiyan pêk tên. Dema ku xwe di nav komên wiha de bi cih nekin xwe tenê hîs dikin herwiha ji aliyê derûniyê ve jî rastê pirsgirêkan tên. (Kulaksızoğlu, 1994: 3)

Di romanê de em vê hesta cîrantiyê a li sirgûnê wiha dibînin: “Me her tiştên xwe li Amedê hiştibû; mala xwe, jiyana xwe, asîmanê xwe, xatirayên xwe… (…) Kesekî me tunebû li vir. Çend cîranê weke me mihacir jî, bi zor û zehmetî li vê taxa ku em lê diman bi cih bûbûn (Çakar, 2016: 102).”

Bajarek din ya ku di romanê de bûyer lê derbas dibin Mêrsîn e. Ji bo Lîsa Mêrsîn jî bajarê xerîbiyê ye. Lîsa li Mêrsînê jî hesreta Amedê dikêşe. Di romanê de beşa Mêrsînê wiha tê vegotin:

> Ma çawa dibe ku taxek ev qas bêdeng be û tenê dengê motoran bê? Nexwe di jîyana mirov û xwezayê de tim têkilîyeke bi raz heye; lê belê ew tim hevdu temam jî dikin. Ev dîmenê ku car bi car di ruhê min de çêdibe, min ji xwezayê qut dike û jîyanê ji bo min bêwate dike. Dengê zarokan û pêjna lingên wan mirovên ku her sibeh di kolana me de derbas dibin, jîyanê bi min didin hîskirin. (…) Gelo niha çima sewt û dengê wan nabihîzim? Çima ev kolan evqas sape û bêdeng in?. (113)

Bajarê din a ku bûyer lê derbas dibin Stenbol e. Bajarên ku Lîsa bo revê ango xweparastinê diçe hemû wek mekanên neewle ne û ji bo leheng di wateyên neyênî de ne. Ji bo Lîsa Stenbol jî cihê sirgûn û revê ye. Ligel vê Stenbol cihê evîna Lîsa û şikestina wê ye. Lîsa wiha behsa Stenbol dike:

> (…) Piştî Amedê, li du bajarên Tirkîyeyê geriyabûm û min şopa xwe bi tu awayî ji destê polîsan xelas nekiribû. Dayîka min Şaxê, bo karibim rojeke din jî zêde bijîm, berê min da Stenbolê û ji vir jî dixwest biçim welatekî Ewropayê. Li ser vê daxwaza dayîka xwe, ev demek e li Stenbolê me. (123)

Yek ji lehengên alîkar yê romanê ku li Ewropa ye û dixwaze alîkariya Lîsa bike "Aro" ye. Aro xwedî serpêhatiya penaberiyê ye. Bi vê awayî di romanê de rewşa bêwelatî û penaberiyê dîsa xwe nîşan dide. Li gel serpêhatiya sirgûnî a Lîsa, rewşa penaberiya Aro jî di romanê de wiha dertê beriya me. Aro di nameya xwe de ku ji Lîsa re dinivîse em tecrubeya penaberiyê wiha dixwînin;

> (…) *qaşo rêwîtîya me rêwîtîyeke ber bi jîyaneke xweş ve bû! Pir ecêb… Mirov ji warê xwe, ji malên xwe, ji taxên xwe, ji mirovên xwe, ji bîranînên xwe, bi darê zorê werin dûrxistin û qaşo bo jîyaneke xweş, ji mirinê, ji goristanan, ji qebhetên mirovahîyê wê de, di tankêreke neftê de, bi rojan di nava gû û mîzê de, din ava verşî û nexweşîyê de li jîyaneke xweş bigere!"* (122).

Di romanê de em pirsgirêkên sirgûniyê a Lîsa û malbata wê wek biyanîbûn dikarin şîrovebikin. Lîsa ferî çanda sirgûniyê nabe, her tim guhê wê li ser welat e.Vebêjer dema li Stenbolê ye agahiyên di derbarê Amedê de jî dişopîne û her tim rastê agahiyên kuştinê tê. Di romanê de ev yek wiha tê vegotin;

> Qedera mirovan û qedera axa wan yek bû. Tiştê bihata serê axê dihat serê xwedîyên wê jî. Çîroka me û ya axê weke hev bûn. Ji ber ku axa me her roj bi xwîna zarokan dihat avdan û kulîlkên li ser şîn dihatin, tenê kulîlkên mirinê bûn. Di bin vî asîmanî de, her roj, her saet, her kesî evan kulîlkên mirinê bêhn dikirin. Bêhna mirin û zilmê pir dişibiyan hev. (Çakar, 2016: 160).

Hem rewşa welat hem jî bîyanîbûna sirgûnê li ser Lîsa trawma çêdike. Lîsa sirgûniyê qebûl nake û ji jiyana rojane dûr dikeve. Hesta tenêtiyê li ser derûniya wê bandoreke neyênî çêdike. Wek ku Adnan Kulaksızoğlu dibêje: "Awayê bicihbûna

mirovan a li bajêr wan mecbûr dihêle ku ji aliyê fîzîkî ve ji hev dûr bin. Mirovên bajêr ji mekanên ku têkiliyên rûbirû danin û hesta "em" bêpar in (Kulaksızoğlu, 1994: 3)." Ji bo Lîsa Amed her tim jê re dibe mekanê bîranîn û serpêhatiyan. Lîsa xwe di gerînekê de hîs dike. Ev hîs bi bêguman bi mekanî re têkildar e. Di vir de em ji hêmana gerînekê fehm dikin ku mekanên lê ye xwedî tevlêheviyan in, li wan mekanan ji xwe re rê û çareyek peyda nake. Bi vê awayê pirsgirêka mekanî ji bo wê kûrtir dibe. "Li ser textê razanê me ev çend saet in li perdê temaşe dikim; li ba dibe û min ber bi gerînekek din ve dibe (Çakar, 2016: 137)." Di rûpelek din de Lîsa, bêhêvîtiya li hember gerîneka ku têde asê maye vedibêje: "(…) Lê jiyan ewqas li ber çavên me reş bûbû ku, êdî me bawer nedikir em ji vê gerîneka tarî xilas bibin. (168)."

Mekan xwedî taybetiyek wusa ye ku li gor hestan diguhere. Carna mekanekî bi saya kesekî di hişê mirov de tê qeyd kirin, ew cih bi wê kesê re yek tê dîtin. Dema ku ew mirov li wê cihê be ew mekan bi hestên baş dema ku li wir nebe bi hestên xirab tê teswîrkirin. Di vê romanê de jî em dibînin dema ku Lîsa li cem evîndarê xwe Abraham e teswîrên mekanî yên neyênî ber bi teswîrên baş ve diçe. Di romanê de Lîsa dinyaya xwe ango cihê ku bextewar e wiha vedibêje: "Êdî ez di nava kehaneteke din de bûm. Tenê vê dinyaya ku ji odeyekê, textekî razanê, maseyekê, televizyoneke vekirî, paceyek bi perde, tabloyeke bi dîwer ve û ji çavên Abraham pêk tê pê ve tiştekî din naxwazim (144)."

Mekan ji bikarhêner re peyamên aşkera an jî bi şîfre dişîne. Di hinek mekanan de em xwe bextewar hîs dikin di hinek mekanan de jî bi hîsiyata endîşeyê em dixwazin ji wir dûr bikevin. Lewra mekanê mewcûd tecrubeya rastiyekê ye wek ku Gürsel diyar dike: "Mekan nafire lê dikare wê hestê bi bikarhêner re çêke. Mekan natewe yan jî şekil naguherîne, dema ku we destê xwe lê da nalerize û winda nabe; lê van hemûyan dikare bi bikarhêner bide hîskirin (Gürsel, 2010: 11)." Di romanê de hestên derheqê odeyê de li gor rewşên cuda diguhere. Wek ku li jor hate gotin "ode" di romanê de bi gelemperî xwedî teswîrên neyênî ye, lê odeya ku Lîsa bi Abraham re têde ye ji ber hestên evîniyê wek cihekî berfireh û aram dixuyê. Di romanê de ev yek wiha tê vegotin: "Kirîstalîze bûbû nefesa odê, rengê dîwaran, lampeya di ser serê me re. (…) (Çakar, 2016: 159)."

Xeyalên Lîsa ji aliyê Abraham ve tê şikandin. Wek ku Ahmedzade tespît dike; "Di cîhana romanên kurdî de ku tên sehkirin, dema em hebûna lehengên jin dinêrin, ew

ji tebîetê mêrane ya civaka kurd muzdarîb in (Ahmedzade, 2011: 60).” Di encama xeyalşikestinê de têkiliya Lîsa û mekanî jî diguhere. Wek berê dîsa ode û mal lê teng dibin. Ew aramiya ku bi Abraham re peyda kiribû dîsa têk diçe. Lîsa bi peyva “deşt” tengasiya mekanî îşaret dike. Li hember tengbûyîna mekanî berfirehiya deştê dixwaze: “(…) Tiştê ku min dixwest ez bibînim, seyr bikim ne ev in. Niha pêwîstiya min ji deştekê heye, deşteke bê serî û bê binî (183).” Dema ku Abraham Lisa berdide û nameya zewaca xwe ya bi jinekê din re jê re dişîne, di encama guherîna hestên Lîsa de êdî mekan jî ji bo Lîsa dîsa diguhere;

> (…) Sedemê mayina min a li vê odê, li vî bajarî nemabû êdî. Destpêka qedera mirov li ku bûya gerek mirov vegeriyaya wir (…) Di qoltixa dawî a otobusê de, li tenişta camê rûniştibûm û bi îskeîsk min berê xwe dabû Amedê. (192). (…) rêyên ku min ber bi destpêka jiyana min ve dibin bi min xweş in. Ji ber ku min her tiştên xwe li wir winda kirine. Erê di wê odê de, ku çavên min bi heftê sibê ve mabûn. (…) Erê dengek li wir li benda min e. Bayek li wir, li wan taxan, li dewsa lingên min maye. (194)

Lîsa sedemê mayîna xwe a li Stenbol bi Abraham ve girêdide. Mekanê sirgûnê bi saya hesta evîniyê ji bo leheng hinek biguhere jî wateyên erênî zêde berdewam nake. Heman mekan li gor hestên mirov dikare hestên cuda çêke. Di romanê de em dibînin ku dema Lîsa bi Abraham re ye bikaranîna mekanê erênî ye lê demên din de mekan wek cihê tirs û endîşeyê dertê pêş.

Di romanê de serpêhatiya sirgûnê di encamê de bi vegera Amedê re diqede. Dema ku Lîsa vedigere Amedê di rê de polîs wê digirin û dibin hucreyeke tarî ku bi gotina vebêjer “Li Derîyê Serayê” ye. Vebêjer ji aliyek ve wek îdeal ji bo ku vegeriyaye Amedê bextewar e ji aliyek ve jî di bin işkenceyê de ye. Wek mekanê polîtîk Amed ji bo vebêjer armanc e ku dixwaze bigihêjê. Di romanê de ev beş wiha ye:

> (…) ev sê roj in ku di hucreyeke biçûk de me, bê ku kesek bi min re bipeyive. (…) hucreya min hingî tarî ye, êdî bi zorê hilmê distînim. Dengê merşa îstîklalê, dengê mirovên di îşkencê de, ku di bandekê de qeyd kirine, dubare dubare dizîvire. Ronahîyeke qels di bin derî re derbasî hucreya min dibe û çavên

> min diqemişe. (199). (…) Hew min dixwest ez li kuçên Amedê bimeşim. Di bin barana wê de, di taxên wê yên efsûnî de, bi dengê dengbêjekê bimeşim. (201)

Di romanê de hucre wek mekan nûnerê dewletê ye. Dema ku polîs li hucrê li Lîsa îşkence dikin û birînên wê dibînin Lîsa wê demê di navbera bedena xwe û welat de şibandinek çêdike. Di vir de bi awayek sembolîk “welat” wek “beden” tê vegotin: Di romanê de em vê şibandinê wiha dixwînin: “Ez, Lîsa, ew keçika biçûk. Laşê min wek nexşeya welatekî ye. Di her derê wê de birînek heye, berxwedanek heye, vejînek heye. (202).”

Di vê romanê de em dibînin ku hêmana sereke mekan bi xwe ye. Herçend di romanê de bala me li ser serpêhatiya Lîsa û malbata wê be jî dema ku em li gelemperiya romanê dinêrin aşkera ye ku tevna romanê li ser mekanê ava bûye. Wek ku me di destpêkê de gotibû di gelemperiya romanên hêmana mekanî ji hêmanên din bêhtir dertê pêş. Di vê romanê de leheng hem rewşa welatê xwe hem jî sedem û serpêhatiya sirgûniyê vedibêje. Sedema sirgûnbûyîna wê rewşa welatê wê ye. Ji ber vê yekê li gor me di vê romanê de hêmana mekanî ji yê din bêtir dertê pêş. Em dikarin bibêjin ku di gelemperiya romanên Kurdî de rewşên polîtîk û bûyerên girêdayî wê pirsgirêkên mekanî pêk tînin. Leheng yan mecbûr dibin ku welatê xwe terk bikin yan jî li welatê xwe bi zilmê re têkoşîn dikin. Di romana *Gerîneka Guernica*yê de em her du rewşan jî dikarin bibînin.

**ENCAM**

Di beşa yekem a vê xebatê de em li ser têgeha mekanî sekinîn. Di vê beşê de em ji aliyê dîrokî ve li ser têgeha mekanî rawestiyan. Ligel vê guherîn, fikr û nêrînên li ser hêmana mekanî jî di beşa yekem de cih digire. Herwiha têgehên bi mekanî re têkildar wek nasname, hêz, sînor û çand jî hatin nirxandin. Di beşa duduyan de têkiliya mekan û romanê hat nirxandin ku armanca sereke a vê xebatê ye. Di heman beşê de bi kurtasî rewşa romana Kurdî û têkiliya wî a bi hêmana mekanî re hat nirxandin. Di vê beşê de hat dîtin ku têkiliya roman û mekanî ji cureyên din yê edebiyatê cudatir herwiha taybettir e. Me dît ku di romanê de mekan ji sehneya ku bûyer li ser pêk tê wêdetir xwedî wateyên din e. Hat dîtin ku di romanên Kurdî de teswîrên mekanî nûnertiya civak û lehengan dike. Di beşa sêyem de em li ser sê romanên Kurdî sekinîn. Ev roman ji aliyê hêmana mekanî ve hatin nirxandin. Wek ku di destpêkê de jî hatibû diyarkirin li gor me di gelemperiya romanên Kurdî de honak li ser hêmana mekanî tê sazkirin. Li gor vê yekê em dikarin bibêjin bûyer û serpêhatiyên lehengan ji ber rewşên mekanî ye.

Di romanên Kurdî de herçend bala xwîner li ser bûyer û lehengan be jî dema ku honak hat veçirandin û em gihiştin navenda romanê têgeha mekanî xwe dide der. Bi gotinek din (li gor me) eger em bixwazin tevna romana Kurdî deşîfre bikin divê em pêşî bala xwe bidin bikaranîna mekanî ku motîvasyona nivîskar, vebêjer û lehengan li ser wî ye. Em dikarin bibêjin ku sedemê vê yekê a girîng polîtîk e. Ligel vê yekê em di romanên Kurdî de mijarên gund û gundewarî jî dixwînin. Di van romanan de jî gund wek mekan ligel pirsgirêkên civakî, jiyana gund û mijarên polîtîk dertê pêş. Xeyn ji van mijarên sirgûnî û diyasporayê jî dîsa di romanên Kurdî de hêmana mekanî bêhtir derdixe pêş. Di romanên Kurdî de bi gelemperî hesreta welatekî yekgirtî dixuyê. Ligel vê em dibînin ku lehengên sereke û yên alîkar ji bo vê armancê têdikoşin. Şerê berdewam a li ser erdnîgariya Kurdan bi awayê honakî di romanan de tê vegotin.

Di vê xebatê de romana *Labîrenta Cinan* a Hesenê Metê, *Mijabad* a Jan Dost û *Gerîneka Guernicayê* a Yıldız Çakar hat nirxandin. Ji van romanan *Mijabad* dîrokî û polîtîk, *Gerîneka Guernicayê* jî polîtîk e. *Labîrenta Cinan* jî romaneke gundewar e ku behsa serpêhatiya mamosteyekî dike.

*Mijabad* wek romaneke dîrokî û polîtîk di navendê de behsa Komara Mehabadê dike, li gel vê em dibînin ku behsa bûyerên li deverên cuda jî dike. Mehabad di dîroka

nêz a Kurdan de mekanekî girîng e, pêvajoya têkçûna wê li ser lehengan bandorê çêdike. Em vê yekê ji têkçûna serleheng û yên din dibînin. Wek bajar Mehabad her çiqas ber bi têkçûyînê ve diçe em dibînin ku rewşa serleheng xirabtir dibe û bûyer jî tevlêveh dibin. Leheng ji ber rewşa mekanî bêhêvî, bêçare û bedbîn in. Ligel vê em dibînin mekanên din yên dîrokî ku di romanê de tên behskirin jî hemû polîtik in. Bi vê awayî wek mekan Mehabad ku bi dîroka polîtîk a Kurdan ve têkildar e mijara bingehîn a vê romanê ye. Di vê romanê de ji ser mijar û pirsgirêkên netewî, dîrokî û dewletbûnê ve em hêmana mekanî dixwînin.

Di romana *Gerîneka Guernicayê* de em rastê pirsgirêkên polîtîk tên ku serleheng ji ber van mecbûrê sirgûnê dibe. Di vê romanê de “Guernica” ji aliyê têgeha mekanî ve xwedî giringiyê ye; ji ber vê yekê vebêjer her tim erdnîgariya xwe û Guernica dide ber hev. Her du erdnîgarî jî xwedî nasnanmeyên polîtîk in. Di vê romanê de serleheng ji ber mijarên polîtîk yên li Kurdistanê xwedî nasnameyeke polîtîk e û ev nasname dibe sedemê sirgûnbûna wê. Têgeha sirgûnê yek ji mijarên berbiçav e ku di romanên Kurdî de wek hêmaneke mekanî dertê pêş. Di vê romanê de herçend em serpêhatiya Lîsa û malbata wê bixwînin jî dema ku em li sedemê bûyeran dinhêrin dixuyê ku bi têgeha welat û mekanî ve girêdayî ne. Di vê romanê de mijarên netew û dewletbûnê ji ser bajarê Amedê ve dixwînin. Amed wek mekan ji bo Lîsa bajarê nasnameyê ye. Li gel vê li bajarên sirgûnê jî serleheng rastî pirsgirêkên mekanî tê. Di romanê de em ji ber pirsgirêkên polîtîk dijberî û nelihevkirina di navbera mirov û mekanî de dibînin. Me dît ku mekanên girtî zêdetir in di vê xebatê de; bi awayekî giştî mekan neyênî ne û xwedî trawmayê ne. Ligel vê me dît ku têgehên welat û sirgûnê li ser lehengan bandorên derûnî çêdikin. Hesreta vegera welat, rewşa sirgûnê, koçkirin û bêcihûwarî mijarên mekanê yê sereke ne di vê romanê de.

Di vê xebatê de romaneke din a ku ji aliyê hêmana mekanî ve hat nirxandin *Labîrenta Cinan* bû. Di vê romanê de mekanê gundewar dertê ber me. Derdora gundewar bi gelemperî bi awayê rexneyî di romanên Kurdî de cih digire.

Peyva “labîrent” a di navê romanê de ji bo nîşandayîna honaka vê romanê kêrhatî ye. Di vê romanê de Kevanot ku di destpêkê de xwedî îdeal e û dixwaze gund biguherîne em dibînin ku di dawiya romanêde de ji aliyê gund(iyan) ve bi awayek hişk tê guherandin heta ku aqil davêje. Di vê romanê de mekan bi çand, kevneşopî û

baweriyên neguherbar ve hatiye pêçandin. Di rêya guherandina gund de lehengê bi navê Gebran jî ji aliyê derûniyê ve zirar dibîne. Têkiliyên wek labîrentê a di navbera gundiyan de Kevanot jî hepis dike. Di vê romanê de em hêza guherandinê a mekanê dibînin. Leheng di bin bandora mekanî de dimîne û dişibe wir. Em dikarin bibêjin Angaşta me ya ku di romanên Kurdî de hêmana mekanî ji hêmanên din bêhtir dertê pêş di van her sê romanan de hat dîtin.

## ÇAVKANÎ


Açıcı, F. K. (2013). *Sınır Kavramı ve İç Mekan İlişkisi: Yaşama Mekanları Örneği*. (Yayımlanmamış Doktora Tezi). Karadeniz Teknik Üniversitesi. FBE.

Akkirman, Dilek. K. (2017). *Toplumsal Cinsiyet ve Mekan: Kent Mekanına Erişimde Cinsiyete Dayalı Farklar ve Eşitsizlikler*. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Adnan Menderes Üniversitesi. SBE.

Alan, R. (2019). *Keşkûl*. İstanbul: Peywend Yayınları.

Alkaya, T. (2015). *Sınır ve Eşik Olarak Duvar*. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). İstanbu: İstanbul Teknik Üniversitesi. FBE.

Alver, K. (2010). "Mahalle: Mekân ve Hayatın Esrarlı Birlikteliği." *İdeal Kent Dergisi*, Sayı 2, 116-139.

Aydogan, S. Î. (2014). *Guman 2 Wêjeya Kurdî û Romana Kurdî*. İstanbul: Rupel Yayınları.

Ayman, Z. (2006). "Bellek mekânı olarak sınır ve ötekilik: Kars şehri", *Toplum ve Bilim Dergisi*, Sayı 107, 145-189.

Aytaç, Ö. (2013). "Kimlik Mekânları ve Kimlik/Farklılık Sorunu." *İdeal Kent Dergisi*, Sayı 9, 138-169.

Bachelard, G. (2017). *Mekânın Poetikası*. İstanbul: İthaki Yayınları.

Balık, M. (2010). "Edebiyat ve Mekân Bağlamında Safiye Erol'un Ülker Fırtınası Romanı Üzerine Bir İnceleme." *Uluslararası Kültürel ve Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Sayı 2, 119-128.

Berber, Ö. (2011). "Yok-Yer, Yersizleşme ve Yersizyurtsuzluk Kavramları Üzerine Bir Sorgulama." *İdealkent Dergisi*, Sayı 3, 142-157.

Bilgin, N. (1991). *Eşya ve İnsan.* Ankara: Gündoğan Yayınları.

Celalî, M. (2018). "Dahûrînek li Ser Romana Hewarî ya Hecîyê Cindî di Peywenda Edebîyata Sirgûn û Şahidîyê de." *Wêje û Rexne*, Hejmar 1, 77-94.

Cevizci, A. (1999). *Paradigma Felsefe Sözlüğü*. Mekan. İstanbul: Paradigma Yayınları.

Çakar, Y. (2016). *Gerîneka Guernicayê*. Diyabakır. Lîs Yayınları.

Çakır, H. (2015). *Tarihi Yapılarda Mekansal Bellek ve İç Mekan İlişkisinin İrdelenmesi*. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Beykent Üniversitesi. FBE.

Çetin, İ. (2010). *Mekan İçinde Kadın ve Kadının Mekanı*. *Academia*. https://www.academia.edu/5796831/Mekan_%C4%B0%C3%A7inde_ Kad%C4% B1n_ve_ Kad%C4 %B1n % C4%B1n_ Mekan %C4 %B1. (Erişim Tarihi: 24.09.2020).

Çetinkaya, B. A. (2009). "Batı'daki 'Sürgün' Doğulu/Yabancı Edward Said'in Gözüyle Oryantalizm -"Öteki"nin Tanımlanması." *Şarkiyat İlmi Araştırmalar Dergisi*, Sayı 1, 3-23.

Demirkaya, H. (1991). *Mekan Kavramının Tarihsel Süreç İçinde İncelenmesi ve Günümüzde Mekan Anlayışı*. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). İstanbul: Yıldız Teknik Üniversitesi, FBE.

Diamandouros, P., T. Dragonas, ve Ç. Keyder, (2018). *Mekân ve Millet*. İstanbul: Koç Üniversitesi Yayınları.

Dost, J. (2015). *Mijabad*. İstanbul: Avesta Yayınları.

Dönmez, G. (2010). *21. Yüzyılda Değişen Sınır Algısı*. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). İstanbul Üniversitesi SBE.

Durmaz, Ö. (2017). *Mekansal Deneyim ve Temsilinin Çokluduyumsallık Bağlamında Değerlendirilmesi*. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). İstanbul Teknik Üniversitesi. FBE.

Elden, S. (2009). Space I. In R. Kitchin & N. J. Thrift (Eds.). International encyclopedia of human geography (First edition. ed., Vol. 10, pp. 460). Oxford, UK: Elsevier. Flint, C. (2004). Spaces. (neqil: Kaya; 1-13).

Eliassi, B. (2014). "Neteweperestî, Kozmopolîtanîzm û Bêdewletî: Hevpeyvînek ligel Craig Calhoun." Kovara *Zarema*, Hejmar 2, 9-23.

Erez, H. (2003). *Kültür-mekan Etkileşimine Bağlı Şehirsel Doku Farklılaşmaları: Kumkapı-Süleymaniye Örneği*. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). İstanbul Teknik Üniversitesi. FBE.

Erol, M. A. (2016). *Klasik ve Modern Ütopyalarda Mekân Tasavvurları*. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Gazi Üniversitesi. SBE.

Ertürk, M. (2013). *Mekanın Diyalojisi: Kent Mekanı-Kent Öznesi.* (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). İstanbul: Bilgi Üniversitesi. SBE.

Fırat, N. (2012). "Kültürel Birikim Olarak Çağdaş Kürt Edebiyatı." *İnatçı Bir Bahar Kürtçe ve Kürtçe Edebiyat.* Vecdi Erbay (drl.). İstanbul*:* Ayrıntı Yayınları.

Foucault, M. (1988). "Öteki Mekânlara Dair." *Defter Dergisi*, Sayı 4, 7-15.

Göka, Ş. (1998). *İnsan ve Mekân*. Ankara: Yörtürk Yörük Türkmen Vakfı Yayınları.

Gülbetekin, M. (2017). *Mekânın Hafızası*. Ankara: Hitabevi Yayınları.

Gür, Ş. (1996). *Mekan Örgütlenmesi*, Trabzon: Gür Yayıncılık. (neqil: Erez; 1-150).

Gürsel, B. (2010). *Kafkaesk Mekan: Franz Kafka Edebiyatı Üzerinden Mekan Okumaları*. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Mimar Sinan Güzel Sanatlar Üniversitesi. FBE.

Gürkaş, T. E. û Barkul, Ö. (2012). "Yer Üzerine Kavramsal Bir Okuma Denemesi." *Sigma Dergisi,* Sayı 4, 1-11.

Hacısalihoğlu, Y. (2006). "Kuramsal ve Kavramsal Bir Çözümleme: Mekan-Güç-Çatışma ve Jeopolitik." *Türk Coğrafya Dergisi* Sayı 47, 1-14.

Hançerlioğlu, O. (2016). *Felsefe Sözlüğü*. Mekan. Remzi Kitabevi: İstanbul.

Harvey, D. (2009). *Sosyal Adalet ve Şehir*. İstanbul: Metis Yayınevi.

Ahmedzade, H. (2011). *Romana Kurdî û Nasname*. İstanbul: Avesta Yayınları.

Hess, R. (2014). "Henri Lefebvre ve Mekân Düşüncesi." Henri Lefebvre, *Mekânın Üretimi* di nav de. İstanbul: Sel Yayınları.

Jongerden, J. (2015). *Türkiye'de İskân Sorunu ve Kürtler*. İstanbul. Vate Yayınları.

Karabağ, S. (2006). *Mekânın Siyasallaşması*. Ankara: Gazi Kitabevi Yayınları.

Karaca, İ. (2012). "Tarihi Romanlarda Mekân-Coğrafya." İstanbul Üniversitesi Edebiyat Fakültesi *Türk Dili ve Edebiyatı Dergisi*, Cilt: 34. Sayı 34, 71-90.

Kaya, İ. (2013). “Coğrafi Düşüncede Mekân Tartışmaları.” *Düşünme Dergisi*, Sayı 4, 1-12.

Keleş, R. (1998). *Kentbilim Terimleri Sözlüğü*. Ankara: İmge Kitabevi.

Korkmaz, R. ve Şahin, V. (2017). *Romanda Mekân*. Ankara: Akçağ Yayınları.

Kulaksızoğlu, A. (1994). “Mekan İlişkileri Açısından İnsan.” *Atatürk Eğitim Fakültesi Eğitim Bilimleri Dergisi*, Sayı 6, 169-174.

Lefebvre, H. (2014). *Mekanın Üretimi*. İstanbul: Sel Yayınları.

Lüleci, M. (2017). “Bir Hakikat Kategorisi Olarak Mekân ve Romanda Mekânın Fenomenolojisi Üzerine Notlar.” *Kent, İnsan, Roman: Türk Romanında Kentleşme Olgusu Üzerine İncelemeler.* Ankara: Gece Kitaplığı Yayınevi.

Mai, U. (2016). “Doğu Alman Kenlerinde Kültür Şoku ve Kimlik Bunalımı.” Öncü ve Weyland (drl.). *Mekân, Kültür, İktidar*. İstanbul: İletişim Yayınları.

Merleau-Ponty, M. (2006). *Göz ve Tin.* İstanbul: Metis Yayınları. (neqil: Özbek ve Ertürk; 2017).

Metê, H. (2000). *Labîrenta Cinan.* İstanbul: Avesta Yayınları.

Özbek, D. A. ve Ertürk, D. Z. (2017). “Mekanı Anlama Üzerine Süreç Odaklı Bir Yaklaşım.” *Tasarım Kuram Dergisi*, Sayı 24, 79-89.

Özpınar, C. (2014). “Sunuş.” Henri Lefebvre, *Mekânın Üretimi*. (içinde). İstanbul: Sel Yayınları.

Polat, L. (1996). *Rewşa Edebiyata Kurdî*. Stockholm: Çanda Nûjen Yayınları.

Purçak, M. E. (2019). “Kuyu Metaforu Bağlamında Kader Kuyusu Romanında Mekân ve Bellek İlişkisi Üzerine Bir İnceleme.” *The Journal of Mesopotamian Studies*. Cilt: 4/1, 23-50.

Schick, I. C. (2001). Batının cinsel kıyısı başkalıkçı söylemde cinsellik ve mekânsallık, Gamze Sarı, Savaş Kılıç. (çev.). İstanbul: Tarih Vakfı Yayınları. (Eserin orijinali 1999 yılında yayımlanmıştır). 114. (neqil: Erol; 1-145).

Sennett, R. (1991). *Gözün Vicdanı*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Solak, G.S. (2017). “Mekân-Kimlik Etkileşimi: Kavramsal ve Kuramsal Bir Bakış”. *Manas Sosyal Araştırmalar Dergisi*, Cilt: 6, Sayı 1, 13-37.

Somer, P. M. (2006). Mimarlık ve Bilim Kurgu Edebiyatında Mekân Okumaları. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). İstanbul Üniversitesi FBE.

Şengül. B. M. (2010). “Romandan Mekân Kavramı.” *Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi.* Volume 3/11, 528-538.

Tekin, M. (2010). *Roman Sanatı 1- Roman Unsurları*. İstanbul: Ötüken Yayınları.

Tepebaşılı, F. (2012). *Roman İncelemesine Giriş*. Konya: Çizgi Kitabevi Yayınları.

Timur, K. (2017). “Bilinmez Diyarın Garîb Misafiri: Sürgün ve Bireye Etkisi.” *Hikmet-Akademik Edebiyat Dergisi,* Sayı 8, 26-34.

Topakkaya, A. (2018). “M. Heidegger’de Köklere Bağlılık (Ortsverbundenheit) Kavramının Tahlili”. *Temaşa Erciyes Üniversitesi Felsefe Bölümü Dergisi,* Sayı 64, 64-72.

Tümer, G. (1995). “Mimarlık-Yazın İlişkileri”. *Kuram Dergisi,* Ocak, Kitap 7. (neqil: Demirkaya; 1-104).

Uçar, M. Ö. (2005). *Sınır Kavramına Mekansal Bir Yaklaşım: Ankara Bahçelievler Yerleşiminde Sınırlara Bağlı Bir Analiz*. (Yayımlanmamış Doktora Tezi). İstanbul Teknik Üniversitesi, FBE.

Urry, J. (2015). *Mekânları Tüketmek*. İstanbul: Ayrıntı Yayınları.

Uysal, M. A. (2009). “Sanatta Mekân Algısı Mekanla Oynamak.” Hacettepe Üniversitesi, SBE. Sanatta Yeterlilik Eseri Çalışması Raporu. Ankara.

Uzunkaya, A. (2014). Yer ve Yersizlik Kavramları Üzerine İrdeleme. (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Yıldız Teknik Üniversitesi, FBE.

Yağçı, E. û Dengiz, N. (2014). “Özgürlük ve Baskının Mekansal Temsili.” *Tasarım Kuram Dergisi,* Sayı 17, 77-93.

Yûsiv, H. (2011). *Romana Kurdî*. Diyarbakır: Ronahi Yayınları. https://tr.wikipedia.org/wiki/Guernica_(tablo). (Erişim Tarihi: 08.09.2020).

## ÖZGEÇMİŞ

1994 yılında Muş'un Korkut ilçesine bağlı Kıryaka köyünde doğdu. İlkokulu Muş Merkezde okudu. Ortaokulu Korkut Yatılı İlköğretim Bölge Okulu'nda okudu. Lise öğrenimimi ise Muş Rekabet Kurumu Lisesi'nde tamamladı. 2013 yılında Muş Alparslan Üniversitesi Kürt Dili ve Edebiyatı Lisans Bölümüne başladı. 2017 yılında fakülte üçüncülüğü ve bölüm ikinciliği dereceleri ile mezun oldu. Makale ve çalışmaları *Wêje û Rexne*, *Heterotopya*, *Jehr*, *Bar* ve *Roza* dergilerinde yayımlandı. Ayrıca Sadık Hidayet'in *Hacı Ağa* adlı öykü kitabını Farsça'dan Türkçeye çevirdi ve bu çevirisi 2017 yılında Palto Yayınevi tarafından yayımlandı.

**KURTEJIYAN**

Di sala 1994an de li navçeya Mûşê ya Tîlê li gundê Sinakê hat dinê. Xwendina xwe ya seretayî li navenda Mûşê, ya navîn li Tîlê xwend. Di sala 2011an de ji Muş Rekabet Lisesi mezûn bû. Di sala 2013an de li Zanîngeha Mûş Alparslanê di beşa Ziman û Edebiyata Kurdî de dest bi xwendina lîsansê kir. Di sala 2017an de ji beşa Ziman û Edebiyata Kurdî di fakulteyê de bi dereceya sêyemînî û di beşê de jî bi dereceya duyemîniyê mezûn bû. Niha li zanîngeha Mûş Alparslanê di beşa Ziman û Çanda Kurdî de lîsansa bilind dike. Gotar û xebatên wî di kovarên *Wêje û Rexne*, *Heterotopya*, *Jehr*, *Bar* û *Roza* yê de hatin weşandin. Herwiha kitêba Sadiq Hidayet ya bi navê *Hacı Ağa* jî ji Farisî wergerande Tirkî û ew di sala 2017an de ji nav Weşanxana Paltoyê derket.